

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 72 | 2018



Kurdên Anatoliya Navîn
Hacı Akman

Vîzyon, îmkân û astengî
Osman Aytar






Mekanizma asîmîlasyona kurdan:
Eqlê Protez¹ teknolojiya kolonîalizmê
Sharo I Garip*

Qamyona şor
Mêhtab Îdelî

Hevpeyvînek bi Mehmed Tewfîk Demir re

Kitêbên kurdî yên dersê ji weşanxaneya Apecê

GRANIAS TÂRAR



Weşanxaneya APECê
<http://apecpublishing.com>

Ali Ciftci



Memê Mala Hine



Osman Aytar



bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 72 | 2018

Berpîrs/Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Xizan Şilan, Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür,

Mem Xelîkan, Dr. Mikailî, Dr. Sozdar Midî (E. Xelîl),

Mustefa Reşîd, Mehtap Îdelî, Arvin Berçemî, Mistoyê Heco,

Hizir Akbîna, Memduh Selîm, Karim Najar, Mûlla Evîndar,

Abdullah Şahîn, Yıldız Karagöz, Hacı Akman, Osman Aytar,

Sharo I Garip, Memê Mala Hine

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@aspectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro - Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap: Apec-Tryck AB



Qamyonê sor, MAN

Wêneyê berga pêşin:

Malbateka kurmancên gundê Bazika (*Demirözü*)-Haymana

Jî çepê ve: Xan, Latîfe, Fat, Hesoyê Fatê, Hevê, Remo, Sitê û

Yasin Güzel-1961 i arşîva Yasin Güzel

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ji bîrnebûnê, Ali Çiftçi.....	6
Daweta belediya Wood Green, Harrîngey li Londonê, redaksiyon	7
Hilbijartina Swêdê ya 2018an, Alî Çiftçi.....	8
Konferansa „Asimîlasyon û Kurdên Anatoliya Navîn“, Muzaffer Özgür.....	10
Parastina nasnameya kurd û asimîlasyona wê, Hacı Akman.....	11
Di şertên globalîzma îroyin de kurd: Vîzyon, îmkân û astengî, Osman Aytar.....	16
Mekanizma asîmîlasyona kurdan, Sharo I Garip.....	23
Ger, tirs, bêdengî, lêkevtina Devrêş, Nuh Ateş	30
Were keko to bo şîr î, Karim Nejad.....	34
Karika qehreman, Mistoyê Heco.....	35
Henekên kamyonvanên me, Hızır Akbîna.....	37
Helbest, Seyfî Doğan.....	39
Gundê kurd li dorberê KIRIKKALÊ, Dr. Mikailî.....	40
Fotera Hesênî Alê, Memduh Selim.....	42
Di mijê de rêvîtiyek, Mem Xelikan.....	44
Pêkenok, Mûlla Evîndar.....	48
Bi çavê kovara Kürt Tarihi kurdên Anatolyayê, Memê Mala Hine.....	49
Dîroka malbateka li Çorumê, Abdullah Şahin	53
Qamyona sor, Mehtab Îdelî.....	58
Bûka spî, Mûlla Evîndar.....	63
Ez ê bicim, Xîzan Şîlan.....	65
Hanya Qonya, Yıldız Karagöz.....	66
Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da, Dr. Sozdar Mîdî	69
Holîk, Arvîn Berçemî.....	77
Hevpeyvînekbi Mehmed Tewfîk Demir re, Ali Çiftçi.....	80

Ji bîrnebûnê

Piştî havîneka pir germ û geş em dîsan bi we re ne. Ji bo piranîya kurdên me, ev sê mehên havînê ji aliyê jîyana cîvakî de, hem bi hêviyên dilşad û bextewariyê ve û hem jî bi bûyerên xemgînî derbas dibin. Piranîya insanên me yên Antoliyayê li welatên Ewropayê belavbûne, di mehên havînê de ji bo serlêdanên malbatên xwe, cih û warên dê, bav, kal û pîrên xwe bibînin, diçin welêt. Serlêdana dilkeştîyên xwe dikin. Li dawet û şenawîyên nas û malbatên xwe de tîn dîtî. Li gundên Anatoliyayê di van mehan de jîyan jinûve geş dibe.

Ev kes û malbatên ku havîneka dilşad û germ derbaskirin, herçiqas em bi xwe li nav nehatin dîtî jî dilşahiya wan dilşahiya me jî bû. Di heman wextê de gelek kes jî dilkeştî bûn. Em li vira, bi navê hevkarên *Bîrnebûnê*, ji ew kes û malbatên dilkeştî re dibê; bila serê we sax be! Eş û xemgîniya we ya me ye jî. Ji nav hevkar û alîgirên *Bîrnebûnê*, Yusuf Polat, Îbrahîm Yildirim û Hecî Erdogan, her sê hevalan mixabin dayîkên xwe li vê havînê de wenda kirin. Bila serê wan sax be.

Xwendevanên bi rûmet, ev hejmar jî wek hejmarên berê bi nivîsên ji pênûsên cuda, yên lêkolînî, serpêhatî, edebî, helbest û hevpeyvînên balkêş ve hatiye dagirtin. Di destpêka havîna pêşîn de li Almaniyayê konferansek bi avê "*Asimilasyon û Kurdên Anatoliya*

Navîn" çê bibû. Ji konferansiyerên vê civînê, Prof. Dr. Hacî Akman, Dr. Sharo I Garip û Doç. Dr. Osman Aytar gotarên xwe ji me ra şandin. Mala wan ava! Hûn ê lêkolînên van her sê havalan di vê hejmarê de bi sernivîsên *Parastina nasnameya kurd û asimilasyona wê* ji Haci Akman, *Eqlê protez û xwedagirkerî (Self-colonization)* ji Sharo I Garib û *Di şertên globalîzma îroyîn de kurd: Vizyon, derfet û astengi* ji Osman Aytar bibînin.

Karim Najar, helbesteka ji devoka Zaxo ji me ra nivîsiye. Ji bo ku xwendevanên me kurmancîya ji devera Behdînan jî bibînin me di vê hejmarê de bi sernivîsa *Were keko to bo şîr î...* helbestek weşand.

Memê Mala Hine bi sernivîsa *Bi çavê kovara Kürt Tarihi kurdên Anatoliyayê*, hejmara 33an a vê kovara şirove dike.

Mehmet Tewfik Demir ji gundê Hecîlera, dema cunta 1980î wek girtiyekî siyasetî di hepisxaneyê Diyarbekirê de mabû. Hûn ê di vê hejmarê de serpêhatî û bîranînên wî bixwînin.

Em ji hevkarên me yên nû, Sharo I Garip, Andullah Şahin, Arvin Berçemî, Yildiz Karagöz û Osman Aytar re dibê; hûn her bi xêr hatin û mala we ava ji bo ev hevkarîya we!

Bi hêviya ku ev hejmar jî li gor dilê we be, bimînin di xêr û xweşiyê de heta hejmara bê!

Ali Çiftçi

Daweta belediya Wood Green, Harrîngey li Londonê ji bo vekirina beşa kitêb û kovarên kurdî

Redaksiyon



Kitêbxaneya Wood Green a Harrîngeyê li Londonê Apec û Bîrnebûn dawet kir.

Bîrêz Ali Çiftçi wek xwediye Apec û berpirsiyarê Bîrnebûnê ji boyî vekirina beşa kurdî beşdar bû.

Yekê havîna navîn li kitêbxaneya Wood Green, Harrîngey li Londonê bi beşdarîya seroka şaredariya Harrîngey Gina Adameou, serokê şaredariyê berê Ali Gül Özbek û endamên şaredariyê Joseph Ejiofor, Makbule Güneş, Erdal Doğan, Mahir Demir, xwediye weşanxaneya APECê Ali Çiftçi û Dr. Sabahat Karaduman û berpirsiyar û xebatkarên

kitêbxanê beşa *Kurdish Collection* hat vekirin.

Seroka şaredariya Harrîngey Gina Adameou, serokê şaredariyê berê Ali Gül Özbek û bi beşkirina pirtûkên xwe alîgirê projeyê Ali Çiftçi û însiyatîfgira projeyê Sabahat Karaduman ji boyî girîngiya koleksiyona kurdî deng kirin. Hemû kitêbên ku Apecê beşxandine û hejmarên Bîrnebûnê li kitêbxanê hatin rêxistin.

Navnîşana kitêbxanê:

Wood Green Library


**187-197A High Rd, Wood Green,
London, N22 6XD, Storbritannien**



Ali Gül Özbek , Dr. Sabahat Karaduman Joseph Ejiofor, Gina Adameou û Ali Çiftçi

Encama hîlbijartina Swêdê ya 2018an

Ali Çiftçi



349 kursî
Alliansen 143
Sorûkesk 144
SD 62

- Demokratên Xiristîyan (KD) 22
- Moderat (M) 70
- Sosyaldemoqrata (S) 100 Partîya
- Çep (V) 28
- Partiya Navendê (C) 31
- Liberal (L) 20
- Partiya Jîngeh (MP) 16
- Demokratên Swêdê (SD) 62
- yê din

Grafik: AC

Di destpêka payîza pêşîn, 9ê îlonê de li Swêdê ji bo encumenên bajara, şaredariyan û parlamentoyê xelkê dengê xwe da. Ev hîlbijartina îsal ne wek caran bû! Li gor statistîkên ku berî hîlbijartina jî dihat xuyakirin ku dê hukûmet bi hêsanî neyê ava kirin. Encama hîlbijartinê jî her wiha bû.

Li Swêdê ev 20 salên dawî hukûmet her bi koalîsyona hatine birêvebirin.

Heta wê hîlbijartin jî du bere hebûn; yek bera muhafazekar û liberala ku bi navê *Aliansen* tê nasên û ya din jî bereya Sosyaldemoqratan, partîya çep û ya kesk ku wek *Sorûkesk* tê nasîn. Lê encama hîlbijartina îsal dide xuyakirin ev her du bere dê nikaribin wek berê bimînin.

Li gor encama hîlbijartinê partîyên *Sorûkesk* ku ji *partîya Çep*, *Jîngeh* û

Partî	Rêjeya dengan	Hejmara kursîyan
Moderaterna (M)	19,84%	70
Centerpartiet (C)	8,61%	31
Liberalerna (L)	5,49%	20
Kristdemokraterna (KD)	6,32%	22
Socialdemokraterna (S)	28,26%	100
Vänsterpartiet (V)	8,00%	28
Miljöpartiet de gröna (MP)	4,41%	16
Sverigedemokraterna (SD)	17,53%	62
Feministiskt initiativ (FI)	0,46%	-
Yên din	1,07%	-

Çavkanî: Valmyndigheten

Sosyaldemokratan pêk tên dibin xwediyên 144 kursiyên parlementoyê. Bereyê partiyên mihafizekaran jî (*Aliansen*) ku ji partîya *Moderat* (M), *Demokratên Xirîştîyan* (KD), *Liherala* (L) û *partiya Nêvendê* (C) 143 kursî bi destxistin. Partîya bi navê Demokratên Swêd (SD) di hilbijartîna îsal de 17.5% ji dengên girt û bû xwediyê 62 kursîyan li parlamentoyê.

Her du bereyan jî nikaribûn piraniya kursîyan qezenc bikin û ji ber wê jî nikarin bi serê xwe hikûmetê ava bikin. Eger ev herdu bereyên ku hene nikaribin li hev bikin bo hukumeteka koalîsyonê ji derveyî *Demokratên Swêd*, ji ber tu bereyek naxweze bi wan re kar bike, divê ji nûve herin hilbijartîna.

Li gor encama ku komisyona hilbijartîna ragihandiye beşdarbûna rêjeya

dengdêran di vê hilbijartîna de gihîşt 87,18% û ev jî cara yekê ye ji sala 1985ê û vir ve beşdariyeke ev qes mezin di hilbijartîna de li Swêdê çêdibe.

Li gor hilbijartîna 2014an 1,35 % dengdan zêdetir bûne. Ji 7 495 936 kesên ku mafê dengdanê li swêdê hene 6 535 271 kesan dengên xwe di vê hilbijartîna de bi kar anîne.

Di hilbijartîna îsal de şeş kurd ji partiyên cuda ketin parlamentoyê. **Serkan Köse** (S) ji partiya Sosyaldemokratan **Lawen Redar** (S) dîsan ji partiya Sosyaldemokratan, **Amineh Kakabaveh** ji partiya Çep, **Gulan Avcî** (L) ji partiya Liberalan, **Kadir Kasırğa** jî Sosyaldemokratan û **Medine Sara Borita Seppälä**. (SD) ji partiya Demokratên Swêd hatin hilbijartin.



Amineh Kakabaveh, Serkan Köse, Lawen Redar, Kadir Kasırğa Gulan Avcî Sara Seppälä

Xeber:

Konferansa „Asimîlasyon û Kurdên Anatoliya Navîn“



Fehim Işık, Osman Aytar, Meliha Doğan Sharo İbrahim Garip û Heci Akman (Foto:M. Özgür)

Platforma Kurdên Anatoliya Navîn-Evrupa(PKAN-E) di 03.06.2018 de li bajarê Troisdorfa Almanyayê bi mijara „*Asimîlasyon û Kurdên Anatoliya Navîn*“ konferansê li-dar xist.

Civîn ji aliyê hevserokê PKAN-E Dr. Meliha Doğan re hat birevabirin. Di konferansê de; rojnamevan Fehîm Işık li ser *Asimîlasyon û xwe parastina Kurdên Anatoliyê Navîn* goterek peşkeş kir. Ji zanîngeha Mälardalenê /Swêd Doç. Dr. Osman Aytar, bi mijara „*Di şertên globalîzma îroyîn de kurd: Vîzyon, derfet û astengî*“, ji zanîngeha Bergenê/ Norwec Prof. Dr. Hacı Akman bi mijara „*Parastina nasnameya kurd*

û asimîlasyonê wê“, Ji zanîngeha Kolnê/Almanya Dr. Sharo İbrahim Garip bi mijara „*Eqlê protez û xwedagirkerî (Self-colonization)*“ beşdarî konferansê bûn.

Di bêşa duyêmin de pirs û bersiv hatin dayîn. Di vê bêşê de gengeşî di nav beşdarvana de çêbûn.

Ji aliyê amadekirina civînê de kemasî jî hebûn. Zimanê civînê jî li ser daxwaza beşdaran tirkî bû. Kemasî hebin jî civînên li ser KAN bên çekirin gerek in. Nezikî 100 kes beşdarî civînê bûn. Li dawîyê sohbet hat kirin û mêvana bi hev re xwarin xwarin.

Muzaffer Özgür

Kurdên Anatoliya Navîn

Parastina nasnameya kurd û asimilasyona wê

Haci Akman

Gelek caran li Danîmerk, Swisre û Elmanyayê tevî semînerên derbarê kurdên ku li Anatoliya Navîn bi cih bûn e, bûm. Bi sedan salan ev kurdên me, ji welatê xwe 'ji Kurdistanê' bidûr ketin e. Ji ber vê yekê bi coş û keyfxweşî min xwest bi parvekirina zanyarî û ezmûnên xwe ve piştevaniya van civînan bikim. Beriya ku semîner dest pê bikin ez kemêkê bişik û gûman bûm. Sedema destpêkê; ez ê bi şeweyekê herî baş û bi danûstandinekê baş peyama xwe ya herî girîng bi çi awayî bikarbim pêşkeşî we bikim. Sedema din jî ziman bû. Min xwest gotara xwe bi kurdî û bi zaravê ya ku ez bi rojane bikartînim pêşkeş bikim. Heman demî gelek hizrên min yê wekê ku yê kurdî nizanin bi axivîn an jî bi kurdiyêkê bi bandor û piştgiriya tirkî ve diaxivîn hebûn. Dîsa jî her çend zor û zehmet be jî, dixwazim bi we re gotubej û danûstandineke ji dil bikim.

Mijara min ya serekî yê van semîneran, mîrata çanda kurdî û bi rê ya dîrokê ew bi çi awayî hatine dizîn û talankirinê ye. Min dît ku

beşdarvan gelek bi baldar bûn, lê belê pirsên herî zêde li ser nasnama xwe bi xwe bûn.

Ez kêlê me? Ji ku de re me? Ji ber çi em ew çend ji Kurdistanê dûr dijin?

Pirs ev e;

Çawa mirov dikare li cihêkê ji welêt gelek dûr û bê kû were bişafîn bijî, ji bo ku nasnama xwe ya kurdî biparêzin çi mekanizmayên çandî hatine bikaranîn? Gelek kes li hevîya ku ez wekê lekolînerekî li zankoya Bergenê, bersiva van pirsan bidim. Ya herî girîng ew bû ku ji bo gelek beşdarvanan Kurdistan wekê utopiyayekê ku hemû bitêhnî dabûn dû. Kesên derûdorên wan ji bo ku rewşa xwe reva bikin di navbera pêşeroj û paşerojê de diçûn û dihat in. Bi vî awayî dibe ku hin bersiv werin bidestxistin, lê belê çûnûhatinên bi vê şeweyî dikare bibe sedemê bêewleyî û xumamiyê.

Ya herî zêde ku bala min kişand bi çi awayî kurdên Anatolia Navîn rexmê ku ji welatê xwe yê bav û kалан ew çend dûr bûn dikarin nixê kurdîyê wekî fundamentê bipa-

rêzin. Her çendî ev ji civaka mezin were veşartin jî, serfirazîya ji kokên xwe bêgûman di mezinbûn û gihandinê de hestên ewleyî xurt kir. Her çiqas ez bi tevlîbûna bi van semîneran ferî gelek tiştan bûm jî, ji dil dixwazim zanebuna xwe di derbarê kurdên Anatoliya Navîn hîn zêdetir pêş bixim. Wekê kurd koka me yek e, le dîsa jî zanebûna me di derbarê hevûdu de kême.

Kurdên Anatoliya Navîn ji parçebûnêkê ji parçebûyîna di navbera çar dewletan da ne. Wexta ku mirov li demografi û tipolojîya erdî dinêre dibê qêy şaxekê ji darê xwe hatiyê jêkirin. Ev pekhatiyê aloz ya ji heman kokê hatî, yek ji pekhatinên girîng e. Nebûna referansên dîrokî bûye sedema ku kes nizane an jî nayê bira kesî ku ev babik/êşîret ên Anatoliya Navîn çawa li wir bi cîh bûne. Ev xal prosesekê kûr û dirêj e ku pewistî bi lêkolînîyê heye. Ev kurdên me li Kurdistanê mezin nebûne û gelek ji wan nizanin Kurdistan kuder e. Ango ev weke ku li mala xwe nexweyî nexşeya Kurdistanê bî. Jibîlî vê nasnama xwe bi heremên ku li wir dijîn ve binav dikin. Wekê mînak «kurdên Konyayê» an jî «kurdên Ankara» an jî «kurdên

Kirşehîrê». Kurdistan wekê 'avahiyek mental' an jî 'utopî' divê ji nû ve were revakirin. Nasnameyekê wisa dualî gelek aloz e, û ev ji bo piraniya kurdên ku ji derveyê vê heremê ne jî dîlemayek e.

Nasnamayekê dualî him ji bo gelek kesên ku li vê heremê dijîn û divê ku xwe li gora civaka tirk biguncinên (ku li wir cih ji bo kurdên kême e an jî qet nîne) him jî ji hêviyên kurdên Kurdistanê re pirsgrêkek e. Ev yek, di vî warê de ji her kurdekî gelek ked û kar pêwist dike. Ev nasnameya parçebûyî ji bo gelek kurdên Anatoliya Navîn hîn bêbersiv e.

- *Ez kê/kî me' û 'niha ez bi ku ve diçim?*
- *Çima ez li vir im?*
- *Dîtîna koka xwe*
- *Xwe çawa reva dike?*
- *Xwe cuda dîtî? Li goriya kesên din.*
- *Parastîna nasnameyê*
- *Zanistîya veşartî*
- *WELAT? Xwen û Welatê piroz*

Encamên parçebûyî, talan û dizînê bi şeweyên curbecur li ser gel bandora xwe heye, him li ser Anatoliya Navîn him jî bi giştî li ser Kurdistanê.

Parçebûn:

Sal 1071

Sal 1639

Sal 1923

Kurdên li Anatoliyê beşêk ji parçebuyînê ne.

Encamên parçebuyînê?

- Dabeşbûna erdnîgarî
- Dabeşbûna dîrokî
- Çand
- Folklor
- Ol
- Ziman

Ji lêkolînên min yên li ser mîrata çanda kurdî dixwazim minakek li ser çawa mîrata me ya çanda kurdî û dîroka me hatiye dizîn û şelandin, bidim.

Di sala 2014 de ji bo dîtina *Şerefname* ku di sala 15430-1603 de ji aliyê Şerefexan ve hatiye nivisîn û li ser dîroka kokên curbecur yên kurdan, têkilî bi pirtûkxaneyê Britanyayê re kir.

Bersiva ji gerînendeyê (Mudurê pirtûkxanê) bi vî awayî bû;

”— *It is doubtful whether the original manuscript of Sharaf Khan's Sharaf-namah exists anywhere. The Library has four copies, none of which date from any time close to the author's lifetime, which is undated but probably early 19th century*” (Dr. Muhammed Isa Waley, *kurator persian and Turkish collection*). British Library.

Ev berhema Şerefexan ku di nav beşa faris û tirkî de hatiye bi cîh

kirin nîşan dide ku diroka kurdan bi çî awayî, ne ji aliyê kurda bi xwe ve ji aliyê kesên din ve tê binavkirin. Dagirker, zordest bi şeweyên curbecur her xwestine dîrok û mîrata çanda kurd bi tiştên derevîn ên ne rast ve girê bidin. Ev dibin sebebên bêxwedîbûna referensên hevbeş ji bo pêşerojê. Ev înkâr parastin û peytandina çanda mirata kurdî zehmet dike û ji ber vê sedemê, ev yek ji prosesên politikayê bişaftinê ye. Zordar hewildidin ku nezaniya nasnamê pêşda bibin, wekê resmên parçebûyî, ku mîrasa çandî yên bindestan neyên bîrê. Kerrbûn û korbûna çandî yanê cîhanê ji fikrên ên ku tu kirine bindestên xwe da mêzekî.


Kurdên Anatoliya Navîn li hember bişaftinê û hemû metodên zordestiyên zordestan li dijî gelê kurd, li ber xwe didin û zordest nikarin ew ’nexşeya kurdî’ paqij bikin.

Her wiha ew karin mîrata çanda kurdî ji nifşa nû re bigihînin. Bi peyvek din, kurdên Anatoliya Navîn ji erdnigarya xwe ji ’Welat’ çûn lê ne ji xwe çûn. Ew bi stratejiyên curbecur xweyî li mîrata xwe derketin û ew parastin;

- Jinên kurd di prastin ya ziman û nîrxên kurdî de piştgiriye

mezin dan û her wiha li dijî
bişaftinê rolekê girîng leyîst in.

- Veguhastin ya devkî (çirok, serpehatî û vegotin)
- Stran
- Jûr/odê gund: Cihê kombûnê ji bo mêran ku li wir guftûgo têne kirin, çirok, serpehatî û stran tenê gotin.
- MED-TV di van sal yên dawî de rolekê bi bandor li hember bişaftinê leyîst.
- Kovara BÎRNEBÛN lêkolanan kir û gelek dokument yên binirx û girîng li ser kurdên Anatoli ya Navîn berhev kir.



Di şertên globalîzma îroyin de kurd: Vîzyon, îmkan û astengî

Osman Aytar

Associate Professor in Social Work/ PhD in Sociology
Mälardalen University/ Sweden
School of Health, Care and Social Welfare

Prolog⁽¹⁾

Dewletên ku Kurdistan dakir kiri-
ne her tim bi her awayî xwestine
dagirkerîya xwe dewam bikin û ew
hewldanên wan ne tenê li Kurdis-
tanê, li welatên din jî dewam kiri-
ne. Di vî warê de gelek mînak hene
û yek ji wan ku baş tê nasîn li ser
radyoya kurdî ku di 1956an de li
Misirê dest bi weşanê kiribû, ye.
Bûyer taybetî jî ji bo sîyasetên
Tirkîyeyê yên înkara kurd û Kur-
distanê ji gelek alîyan ve balkêş e²:

Piştê ku Misir dest bi weşana
radyoyê ya bi kurdî dike, rojekê
sekreter Ahmad Hassanain Haikal
diçe ba serokê Misirê Jamal Abdul
Nasser û dibêje: “Sefirê tirk hatiye
beyî ku xeber bide û ji hêrsa dikele
û dixwaze te hema bibîne.” Nasser
ji Haikal dipirse gelo wan li hem-
ber Tirkîyeyê di van rojan de tiştêkî

dijminane kirine. Haikal bersiv di-
de: “Ne tiştêkî, qasî ku ez zanîm.”
Nasser ji Haikal re dibêje ku sefirî
tirk di odeya xwe de nîvseetek an
jî seetek bide sekinandin ku piçek
hêrsê wî derbas bibe û dû re bîne
ku wî bibîne. Wexta sefir tê odeya
Nasserî, ew hîn jî bi hers e, bi deng
e û dibêje: “Em tehammûlê karên
dijminane yên welatê te li hember
Tirkîyeyê nakin û em dê hesabê vê
bipirsin.”

Nasser bersiv dide: “Birêz sefir,
me çi li hember welatê we kiriye?”
Sefir cewab dide: “*Tu dixwazî çi
bibêjî? Ew radyoya kurdî ku we
dest pê kiriye kareke dijminane ya li
hember me ye û dixwaze sazûmana
welatê me xera bike. Ev radyo divê
bê girtin.*”

Nasser bi awayekî sakîn ji sefir
re dibêje: “Ev radyo li hember

¹ Ev gotar li ser bingeha axaftina min a li konferansa *Asîmilasyon û Kurdên Anatoliya Navîn*, ku li Almanyayê li bajarê Troisdorfê di 3ê Hezîrana 2018an de ji aliyê Platforma Kurdên Anatoliya Navîn (PKAN) ve hatibû amadekirin hatiye avakirin.

² Ev anekdota li ser radyoya kurdî ya li Misirê di 1982an de li Londonê birêz Ibrahim Ahmadi ji birêz Omar Sheikhmousî re gotiye û çend sal berê bi Îngilîzî di lista mailê ya *Kurdish Studies Network* (KSN) de hatiye belavkirin. Hîn versiyonên vê anekdotê di hîn çavkanîyên din de jî hene, lê naveroka bingeheî yek e.

welatê we nîn e, ji ber ku qasê ku ez dizanim hukûmeta we dibêje li Tirkîyeyê kurd tunene. Ma ne wusa ye?”

Sefîr bersivê dide: “Rast e, ku li Tirkîyeyê kurd tunene, lê dîsa jî ew çalakîyeke dijminane ye!”

Serok Nasser dîsa bersiva sefirê tirk dide: “Fermo, ji hukûmeta xwe re bibêje, ger wan rojek bi awayekî resmî qebûl kirin ku li Tirkîyeyê kurd hene, wê çaxê em dikarin li ser pîrsa girtina weşana radyoya kurdî bifikirin.”

Welatek û neteweyeke perçekirî di navbera çar dewletan de

Kurd û Kurdistan li Rojhilata navîn xwedîyên dîrokeke qedîm in. Ji têkçûna împaratoriya medan heta îro dewletên dagirker ji bo parastina statukoyan her metod mubah dîtine. Hatina Îslamê, perçebûna yekem a resmî bi Peymana Kasr-i Şîrin (1639), begîtîyên herêmî yên dema osmanîyan û berxedan û serhildanên heta destpêka salên 1900î gelek şopên girîng li du xwe hiştine. Şerê Yekem ê dinyayê, komkujîyên li hember ermenî, suryanî/asûrî û rûma ku bi xwe re kuştin û koçberbûna bi sed-

hezarên kurdan jî anî bû yek ji bingegehên Peymana Sevrê (1920).

Wekî tê zanîn di maddeyên 62-64an de hin mafên kurdan jî hatibûn ziman, herçend sînorên Kurdistanê hatibûn tengkirin

Lê berjewendîyên dewletan di wextekî kurt de bayên Sevrê guherandin û Peymana Lozanê (1923) bû peyman ji nû ve perçekirina Kurdistanê. Sînorên heyî yên perçeyên Kurdistanê li ser bingeha vê peymanê ne. Berxwedan û serhildanên kurdan piştî vê perçekirinê jî dewam kirine, wekî mînak serhildanên Şêx Seîdî, Agirîyê, Koçgirîyê, Dêrsimê hinek ji wan in.

Di encamê Şerê Duyemîn de avakirina Komara Mehabadê (1946) li Kurdistana Rojhilatê bû hêvîyek, lê ev şayî zêde neajot û lihevkirina dewletên aliyên şerî dîsa kurd bi qedera xwe ve cih hiştin û di encamê de dîsa fermana kurdan rabû. Di serî de serokkomar Qadî Mihemed, bi hezarên kurd bi awayên hovana hatin qetilkirin, zilm û zordestiya dewleta Îranî demêke dirêj dewam kir. ”Bêdengî” ya piştî qetlîama Dêrsimê li Kurdistana Bakur û têkçûna Komara Mehabadê li Kurdistana Rojhilatê

bi Şoreşa Îlonê li Kurdistana Başûr û DDKOyan li Kurdistana Bakur şikya. Peymana otonomîyê li Kurdistan Başûr hêvîyeke nuh çêkir. Di salên 1970ê de li bakur û rojhilatê Kurdistanê jî tevger dîsa xurt bûn, lê di 1975an de bi têkçûna peymana otonomîya li Kurdistana Başûr tevgera Kurdistanê darbeyeke mezin girt. Xayintiya tevgera Melayên Îranî ya li hember kurdan û neteweyên din, rê li ber tevgera çekdarî vekir. Li Kurdistan Başûr tevgera Kurdistanê dîsa xurt bû û taybetî bi şerê Irak û Îranê şerê çekdarî yê kurdan kete pêvajoyên nuh.

Li Bakurê Kurdistanê tevgerên demokratîk bi darbeya faşîst a 12ê îlonê ku di sala 1980 de li Tirkîyeyê çêbû darbeyên mezin girtin. Şerê çekdarî ku li Kurdistana Bakur di 1984an de dest pê kir di tarîtiya rejîma faşîst de bû wekî "guleyeke pêşîn". Xurtbûna tevgera demokratîk li Kurdistana Bakur, îlana Federasyona Kurdistanê li Kurdistana Başûr û taybetî jî ji sala 2011an pêve bûyerên li Kurdistana Rojavayê hin bûyerên giring in. Di van perîodan de gelek tiştên din jî hatin holê. Qetlîam û talanên rejîma Îranî li Kurdistana Rojhilatê; Enfala Barzanîyan û

berdewamîya Enfala sedhezaran, qetlîama Helepçeyê û koçberiya mezin a milyonan li Kurdistana Başûr; valakirina bi hezaran gundan, kuştinên "qesasnediyar" û koçberiya sedhezaran li Kurdistana Bakur; zêdebûna êrîşkarîyên rejîma Baasê li Kurdistana Rojavayê hin bûyerên giring ên salên 1980, 1990 û 2000î ne.

Rewşa nuha li Kurdistanê û dervayê wê him bi îmkân û him jî bi astengîyan tijî ye. Di gel hemû zilm û dordestiyan jî kurd li Bakurê Kurdistanê bi hêz in û li Başûr û Rojavajê Kurdistanê jî li ser axa xwe bi statuyên cuda serdest in.

Li Rojhilatê Kurdistanê "bêdengî" hîn jî berdewam e, di gel ku gellek hewldan hene ku ew "bêdengî" bê şikandin. Di gel kil û kêmasiyan jî dîasporaya Kurdan li gellek welatan xurt e û tesîreke baş li hin bûyeran dike.

Taybetmendiyan siyasetên înkâr û asîmilasyonê yê Tirkîyeyê

Di gel ku li Tirkîyeyê di qanûnan de hebûna kurdî nayê qebûlkirin jî, di pratîkê de kurd û hin gelên din ên ne tirk wekî perçeyên "netewa tirk" hatine qebûl kirin. Kurdên ku

ew ”çerçewê” qebûl kirine, riya wan heta hin cihan ”vekîrî” bûye û carna hebûna wan li dijî kurdîyatê wekî ”mînak” hatiye nîşandan. Gotinen wekî ”Ez jî bi koka xwe kurd im, lê...” (”*Ben de Kürt kökenliyim, fakat...*”) jî hember tevgera kurd û Kurdistanê wekî ”mînak” hatine bikaranîn. Ji ber vê jî ”*Kürt kökenli*” (Bi koka xwe kurd) bi awayekî giştî bûye wekî dîskûrseke sîyasetên înkâr û asîmilasyonê yê Tirkîyeyê ye, ji ber ku ew rê vedike ku mirov bi koka xwe tiştekî din be jî, nuha tiştekî cuda ye. Bi gotoneke din, kesek ”bi koka xwe kurd be” jî nuha dikare ”tirk” be. Ev dîskûrseke bingeîn a sîyasetên înkâr û asîmilasyonê ye. Di gel vê li Tirkîyeyê metadîskûrsa *ke-malîzm*, li Îraq û Sûrîyeyê *baasîzim* û li Îranê jî *îslâm* ji bo sîyasetên înkâr û asîmilasyonê hatine bikaranîn.

Wexta em piçek ji nêz ve li hin aliyên sîyasetên înkâr û asîmilasyonê yên Tirkîyeyê binerên xwanê dibe ku di vî warê de, taybetî jî ji sala 1923an vir ve sîyasetên sistematîk hatine domkirin. Gotinên wekî ”*Ne mutlu Türküm diyene*” (Çi bextewarî ye Tirk im gotin), ”*Türk’ün Türk’ten başka dostu yoktur*” (Ji Tirk bêtir dostê/a Tirk tune ye) û ”*Bir Türk dünyaya bedeldir*.” (”Tirkek

bedelê dinyayê ye”) hin nîşanên ew tirkîyetîya ku turd û neteweyên din marûzê wê ne. Mînakeke din a tirkîyetîya rojane, ew sonda ku 80 salan (1933-2013) li Tirkîyeyê di mekteban de mecbûrî bû ye û bi ”*Türküm, doğrudum, çalışkanım!*” (Tirk im, rast im, jêhatî me.) dest pê dike. ”*İstiklal marşı*” ku her tirkîyetîyê bilind dike hîn jî dewam dike û di gel ku sonda li mekteba rabibe jî di pratîkê de zîhnîyet her eynî ye. Wekî mînak Rabîyaya Erdoganî, ”*Tek millet, tek bayrak, tek vatan, tek devlet*” (Yek netewe, yek al, yek welat, yek dewlet), nîşana ew înkâr û asîmilasyonên sistematîk e. Mînakên weha pir in.

Di qanûnan de jî eynî mentalîte her dewam e. Wekî mînak di Qanûna Esasî ya Tirkîyeyê de hin maddeyên înkara kurdan û neteweyên din ev in:

Madde 3: ”*Türkiye Devleti, ülkesi ve milletiyle bölünmez bir bütündür. Dili Türkçedir. Bayrağı, şekli kanununda belirtilen, beyaz ay yıldızlı al bayraktır. Milli marşı “İstiklal Marşı”dır. Başkenti Ankara’dır.*”

Madde 42: ”... *Türkçeden başka hiçbir dil, eğitim ve öğretim kurumlarında Türk vatandaşlarına ana*

dillere olarak okutulamaz ve öğretilemez..."

Madde 66: "*Türk Devletine vatandaşlık bağı ile bağlı olan herkes Türktür. Türk babanın veya Türk ananın çocuğu Türktür...*"

Hin faktorên guherînê di şertên îroyin de

Ji ber perçebûna welat û neteweya me û bi sistematîk berdewamîya sîyasetên înkâr û asîmîlasyonê doza kurd û Kurdistanê firehtir û kûrtir bûye. Bi awayekî, înterseksiyona pirsan pêk hatiye: Pirseke neteweyek ku welatê wan hatiye îşgalkirin? Pirseke dewletbûnê ye? Pirseke kurdên ku xwe kurd qebûl dikin?

Pirseke paşdemayina herêmî? Pirseke edaleta sosyal? Pirseke civateke tradîsyonel? Pirseke cinsiyetê? Pirseke grûbeke hindikayî? Pirseke mafên mirovî? Bêşik ev liste dika-re bê dirêjtirkin. Lê di gel wan jî hin faktorên nûh ên guhertinê derketine ku ew zorê didin sîyasetên înkâr û asîmîlasyonê. Li vir dixwazim behsa çar ji van faktoran bikim ku ji bo çareserîyên doza kurd û Kurdistanê maneyên wan ên taybetî hene:

Faktorê guherînê 1: Di gel hemû metodan û hin xesaretên

mezin jî sîyasetên înkâr û asîmîlasyonê tam biser neketine. Rewşên heyî taybetî li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê, di gel hemû kil û kêmasîyan, xesaret û têkçûnan, gelek îmkanan jî himbêz dikin. Têkiliyên navbera perçeyên Kurdistanê ji berê pir xurttir in û diasporayeke me ya xurt û çalak li gelek welatan heye.

Faktorê guherînê 2: Li hember rejîmên heyî zextên ji grûbên cuda yên van dewletan ji berê zêdetir bûne û dijberiyên nav wan xurttir û kûrtir bûne.

Faktorê guherînê 3: Di şertên globalîzma îroyin de îmkânên nû ji bo netewe û grûbên bédewlet zêde bûne. Têkiliyên navneteweyî û navdewletî di navbera kurdan de, mobîlîzekirinên diasporayî û karûbarên lobîyê xurttir bûne. Îmkânên teknolojiya înfarmasyonê yên nû (televîzyon, radyo, înternet, medya sosyal û her wekî din) bi awayekî îmkânê "*Welatê virtual*" da-ye kurdan û neteweyên wekî wan. Hema kanalên televîzyonên kurdî ku di van bîst salên dawîn de hatin avakirin (binêre resim 1) di vî warê de nîşaneke mezin in.

Faktorê guherînê 4: Guhertinên di sîyasetên Yekîtîya Ewrûpa,



Resim 1. Beşek ji kanalên televîzyonê ku ji aliyê Kurdan ve hatine avakirin


Amerîka (binêre resim 2) û yê din de hin îmkanên nû ji bo Kurdan anîne rojevê. Bêşik ev guhertin li gorî perçeyên Kurdistanê diguherin, lê girîngiya Kurdistanê li Rojhilata navînê her ku diçe zêde dibe.

Ev faktorên guherînê hin pirsên balansên di navbera realîte û vîzyon de jî tînin pêşîya kurdan. Yek ji pirsan ev e ku kurd dê çawa berjewendîyên xwe û dewlet û dezgehên navdewletî ku hesab û berjewendîyên wan li herêmê û li Kurdistanê hene nêzî hevdu bikin.

Faktorên guherînê herweha pirsên naskirina mafên rewa yê

kurdan û Kurdistanîyan û guherînên statukoyên heyî jî tînin holê. Hema bi "Min nas kir" têr nake û ji awa û encamên naskirinê re amadebûyin jî girîng e.

Pirsên wekî, naskirin resmî ye yan ne, aliyên naskirinê ji encamên piralî yê naskirinê re amade ne yan ne, komplîkasyonên nelihev-dugirtina naskirina resmî û pratîka wê, bêşik pir girîng in. Tecrûbeyên "otonomî"ya dema Seddamî, "naskirina realîteya kurdan" a dema Demirelî û "pêvajoya çareserî" ya dema destpêka desthilatdariya Erdoganî li ber çavan in.



Resim 2. Raporeke CIAyê ya li ser kurd û Kurdistanê


Çareserîyên demokratîk û xweragir

Faktorên guherînê yên jorîn û yên wekî wan ji bo guherandinên statukoyên heyî girîng in. Di vî warî de jî gelek pirs hene, wekî mînak: Şertên guherandinan çawa ne? Kî yê bîryarê li ser guherandinan bide û bi çi awayî? Çareserî bi riya referandumê, aktorên siyasî yên hilbijartî/xwetayinkirî, dewletên heyî yan aktorên din? Di vî warî de hostetîya bikaranîna îmkana valahîyan ji bo gavên nu pir giring e. Bêşik rîyên çareserîyên din jî dikarin bê dîtîn, lê çareserîyên neteritoriyal ên

grûbî, çareserîyên teritoriyal û/yan jî îdarî ên grûbî û dewletên serbixwe ji wan çareserîyên demokratîk û xweragir in ku heta nuha li gellek welat û dewletan hatine holê. Wexta mirov wekî mînak Tirkîyeyê bingeh bigre, rê û encamên çareserîyan dikarin cuda bin û bi girêdayê helwestên hukûmetên serdest dikarin rîyên cuda bigrin (*binêre resim 3*).

Epilog

Carnan filmek, nivîsek, çîrokek an rismek dikare tesîr li ser ramanên me pir bikin. Yek ji van filma ku



Resim 3. Di dewletên pirnetewe de rê û encamên çareserîyan

tesîreke mezin li ser min hiştîye, filmê *Avatar* e. Wexta min cara pêşî temaşê kir, di gelek cihan de hêsir ji çavên min herîkin. Lê di dawîya filmê de hêsir bûn hêvî û dilê min ji kêfa lêdixist. Wekî min li jor behs kir riya azadîya welatê rojê û agir bi îmkân û astengîyan tijî ye. Ku em di navbera rewşa xwe û filmê *Avatar* de girêdanek çê bikin, dikarin bibêjim ku di filmê *Avatar* a kurdan de gava "bextewarî" hîn nehatîye, lê em ne ji wê pir dûr in (binêre resim 4).

Kurd di sê beşên Kurdistanê de xwedîyên cihên giring in û li



Resim 4. Dîmenek ji filma Avatar

Kurdistan Rojhilatê jî hin gavên bi hêvî hene. Ez geşbînim ku zarokên welatê rojê û agir dê ji kil û kêmasiyan dersan derxînin û wekî filmê *Avatar*, li perçe yan perçeyan roja me jî dê were. Dil dixwaze ku ev roj zûtirîn were...

Mekanizma asîmîlasyona kurdan:

Eqlê Protez¹ teknolojiya kolonializmê

Sharo I Garip*

sharohurri@yahoo.de

Bingeha vê nivîsê axaftina min a li Konferansa Kurdên Anatoliya Navîn a PKANê li ser asimilasyonê ye. Bi beşdarbûna we û rexistina konferansa PKANê bextewar im. Spas û hurmet ji bo PKANê.

Berî hertiştî divê çend gotin li ser binavkirinê bên ziman. Li gor dîtina min asîmîlasyon ji bo kurdan ji sedî sed ne di cihe xwe de ye. Mirov dikara asîmîlasyonê ji bo koçberan wek koçberên çûna Almanya, yan çûne Kanadayê bi kar bîne. Lê ji bo gelên li ser axa xwe dijîn re binavkirina komkujî, qewmqirkirin (*Calsters*, 1980, S. 49) yan *ethnocide* rasttir e. Meharg jî asîmîlasyonê wek *Cultural Cannibalism* bi nav dike (Meharg, 2001).

Berî ku ez çend têzan binirxînim, dixwazim ku li ser metoda lêkolînê civakî çend tiştan bêjim. Berî hertiştî giring e ku em mekanizmayê asîmîlasyonê, qewmqirkirinê fêhmbikin. Mesela kurdan a asîmîlasyonê meseleya kolonîalîzme ye. Kolonîalîzm li kuderê be li wir qewmqirkirin yanî asîmîlasyon he-

ye, lê asîmîlasyon li kuderê heye herdaîm kolonîalîzm tune. Wek koçberên li Almanya, Fransa û Kanadayê tînin asîmîlekirin. Lê nînin kolonîzekirin. Di vê nivîsê de asîmîlasyon û kolonîalîzm ji bo kurdan wek hev tînin binavkirin.

Asîmîlasyona (kolonîalîzma) kurdan li Anatoliya Navîn û li Kurdistanê, ji aliyekî de wek hev e ji aliyên din de jî bi hev re giredayî ye. Ji ber vê yekê analîza asîmîlasyonê (kolonîalîzmê) bi piranî ya giştî têkînin.

Ya din lêkolînên civakî ez herdaîm ji du alîyan ve dinirxînim. Makro analîz yan civakê bi tewayî û mikro analîz dîtina yek bi yek a mirovan e. Hesabê makro (civakî) û yê mikro (sahsî) herdaîm ne yek in. Car caran li dijî hev in. Divê kar û zirara asîmîlasyonê ji bo kesan û

¹ Ew gotin Horkheimer û Adorno (Adorno & Horkheimer, 2013) ji bo rexnekirina şaristaniya kapitalîzmê bi kar anî. Di vê nivîsê de ew gotin ji bo kolonîalîzmê ji wan hate dîtin kirin
Sharo I. Garip, ciwakkas û politolog e. Di *Orientalisches Institut Universität Köln* de wek Asst. Prof dixebite.

ji bo ciwakê cûda bê hesapkirin. Çend mînak dikarin vê metodê zelal bikin. Mînaka makro analizê: Li bajaran asîmîlasyon pir zu dimeşe. Ya din jî teboxayên ciwakê yên dewlemend û yên xwendî zedetir assimîle dibin. Pirs ev e ku çima ew kes yan ew teboxe zedetir asîmîle dibin?

Divê mirov di lekolîna mikro de jiyana wan analiz bike sedeman bibîne. Minak: sedemên şahsî kariyer, berjewendî, perwerdayî (*dilkirina bi rêya îdeolojîyê*) ne. Yanî hesabê makro bi hesabê mikro ve cûda ne. Asîmîlasyonê sedemên xwe ne bes yek e. Cureyên wê cor be cor in. Lewma giring e, ku modelên *multiple Causality* (modelên pîrsedemî) bên çêkirin.

Mînak: Bi hezaran mamostayên kurd hene him jî welatparêz in. Ew mamoste di fikra makro de li dijî asîmîlasyonê ne, lê gelek ji wan mamosteyan zarokên kurdan her sibê bi zimanê tirkî fêr dikin. Yanî bi destên xwe asîmîlasyonê dimeşînin. Çima? Ji ber ku angorî analîza mikro herkes berjewendîya xwe dişopîne û jiyana xwe bi vî karî berdewam dike. Di teorîye de gelek analiz li ser asîmîlasyonê hatine kirin. Kê zêde sedem tên zanîn.

Carek din bi kurtasî cureyên asîmîlasyonê an gorî Gordon (Williams & Suzanne Ortega, 1990):

- (Çendî) zimankujî
- Structural: komel, sazî, heval, cîranî
- Bi rîya zewacê
- Asîmîlasyona *identity* (nasname)
- Bi rîya hemwelatî: Alkol, esrar, kontrola zayîne bi destê dewletê
- *Behavioral* (hest, rebûn runîşkandin)

Ez ji di vê nivîsê de behsa cureya heştemîn dikim yanî asîmîlasyona (kolonîzekirina) Êqilî!

Zimankujî: Di nav cureyên asîmîlasyonê de ya herî sereke ziman e. Li Walles (Galler) dibêje: **“Qewmekî bê ziman qewmekî bê dil e!”**

Zana Farqînî jî dibêje: **“Ziman hestiyê piştê netew e”**

Ergin Opengin (Opengin, 2012) û çend lekolinêrên din jî dibêjin ku zimanê kurdî ji destên kurdan derdikeve. Li hemû bajar û gundên kurdan zimanê sereke dibe tirkî. Lekolina min jî li Wanê jî herwisa tehmînek nîşan da. Di dema digital de zimanê kurdî zuttir bê pûckirin. Lê ziman di nava kurdên Anatoliya Navîn de zedetirin û zuttirin dimire. Zimanê di navberê wan de dibe

swedî, almanî yan tirkî. Stratejiya kurdan li hember vê asîmîlasyonê duzimanî yanê kurdî-tirkî di nav sistema konolializmê de bi ser nakeve. Mixabin zimanê kurdî têkve dibe. Ji ber ku kurdî ne zimanê bazarê, ne jî zimanê perwerdeyê ye.

Structural: Kurdên Anatoliya Navîn li gelek welatan belav bûne. Cîran, heval, malbat belav dibin û hevdu kêmbûnin. Ji Kurdistanê hatine Anatolîyê, ji wir hatine dewletên Ewropayê û her ku diçin ji hev diqetin, kevnêşopên wan bîr dibin. Bi vê awayê asîmîlasyonê tabî çêdibe.

Behavioral: Rabûn runîşkandin, ferî xelkê dibin, kopya dikin wek dawet, gotin yarenî hemû wek swedîya, almana yan tirkî dibin. Ji ber ku çenda wan prestîja xwe wenda dike.

Nasname: Nasnamêya kurdan ji xwe bi fêrmî li dinyayê nê qebûl-kin. Giran giran ji xwe re dibêjin: Ez ji Tirkîyê me, yan Swedê, yan Iraqê. (*Türkiyelileşme, Iraqlilaşma* ji siyasetek wisa ye)

Kêmbûn ew pîvanan tên zanîn yanê ew dinamikên mekanîzmeya

kolonîyalîzmê yê ji derve ne. Ji bo min dinamîka ku kolonîyalîzmê ji hundir ve dimeşîne; Aqlê protez e! **Aqlê protez teknolojiya kolonîyalîzmê** ya nû ye (Garip, 2018)

Aqlê protez instrumenta self-kolonîyalîzmê

Sedsal e kurd jî li hember kolonîyalîzmê (asîmîlasyonê) şerê **De-kolonîyalîzmê** didin lê mêtînger jî bi teknolojiyên koledariyê yê nû, pêvajoyeke **Re-kolonîzasyonê** pêktînin. Bilî **Re-kolonîyalîzmê** û **De-kolonîyalîzmê** dînamîka sêyem a navxweyîya kûr wek kurme darê **Self-kolonîsation** xetera her mezin e. Makîneya kolonîyalîzmê di pêvajoya **Self-kolonîsation** de bi xwe dimeşe. Pergala kolonîyalîzmê ne tesadufî ye, ne jî ji nişkave çêdibe. Pergala kolonîyalîzmê mekanîzmayên rasyonel (biaqil) û berdewamî berdikêşe. Ji bo peji-randina koletiyê divê fikir û ramanên mirovên li kolonîyê bînguherandin. Fikir û raman di gelek dever û saziyan de bi rebazên taybet tên guherandin. Ji bo serkeftina kolonîyalîzmê gere hişmendî, bîranin, şop û dîroka mirovên kolonîyê tevde bînguherandin.

Lêbelê kolonîalîzm ji bo carekê talanê nake. Pergala kolonîalîzmê ji bo berdewamkirina talanê hewceyî mekanîzmayê ye. Herçiqas dagirker Welatekî zeptbikin, yanê texin destê xwe jî serhildan tirsal dilên dagirkeran ye. Lewma kolonîyalîzm dixwaze bikeve nav giyan û aqlên kesan.

Dagirkerî ji bo konsolidasyonê, konê xwe ne bes li ser welêt lê li ser aqlên mirovan jî vedigire (îşgalkirin). Kolonîyalîzm ji mirovên xulam re yê ku hatine dehumanîze kirin aqlê protez peyda dike. Ew eqilê protez hatiye programkirin û sinorên wî jî bellî ne. Hêdî xwediyê eqilê protez di bîna bîra desthildaran de ye û benê xwe jî vi dest dagirkeran xistiye. Eqilê protez eqilê kedî² ye, serê xwe ranake. Wisa ji mirovatiye derdikeve (*dehumanize buyîn*).

Pergala kolonîalîzmê ji alikî de bi destê kolonîzatoran dimeşe ji alî din de bi çerxa saziyan. Tûrkan Saylan³ kesek ji wan bû bi revebirîya aqlê protez sistematîkeke mezin pêkani. Ew mînak ji bo re-kolonîzasyonê re gelek taybet e. Gotina Saylanê “*Keçno werin dibistanê*” stratejiyek kûr e. Armanca wan stratejiyên post-kolonîyal

malbat, bi taybet jî jinên kurd in (Saylan, 2006). Ji ber ku zimanê zikmakî zimanê dayikê yê jina ye. Gavak ku dayik zimanê xwe dengnekin zarokên wan qet deng nakin (*qirkirina spi*). Herçiqas li hember pratikên rekolonîzasyon kurdan ji çend pratîkên sist wek vejandina wejaya kurdî pek hanîbûn, lê tekoşîna wan têra de-kolonîzasyonê nekir. Ji ber ku di de-kolonîzasyonê li Kurdistanê de *self-kolonîzasyon* veşartîye. Minakeke din taybet ji bo *self-kolonîzasyonê* balêş e. Angorî anketa min kirî ji %80-90 rewşenbirên, akademîsyenên yan jî kesên zanîngeh xwendine, zarokên xwe ne bi kurdî lê bi tirkî dilimînin. *Aqlê protez be şik, bi tiliya xwe çavê xwe derdixe.*

Ew şideta mental di medya, sosyal zaningah, dibistanan bi destê têgînîyan û gotinan ji çend, nîrx û civaka xwe re kategoriyên bilind bûnê û serdestiyê hildiberînin (berdikesin). Ew têgînî û gotin wek nîrxên gerdûnî, zanistî û humanîzmê tînin binavkirin. Yê li derî vê çarcaveyê dîkin kategoriyên xirab wek feodal, paşverû û bi negerdûnî, nezaniştî û nemodern tînin tawanbarkirin.

² *Gur kedî nabin, lê kucik kedî dibin.* Kesê kedibûyî li zinîrê xîr azad nabin.

³ *Türkiye'nin kani canı YİBO'larda-2* (22. cotmeh 2002 de Cumhuriyet de hat weşandin)

Çavderî 4: gelek rewşênbîr bi piranî akademisyenên kurd di civînan de konferansan de nenetewperistiya xwe ji dil û can de tînin ziman. Akademîsyenek li hember rexne û argumanan teng dibin di-kevin bin spartina humanizmê. Ew parzûna aqlê protez, yan ku kurd dehumanize kiriyê eslên wan diparzîne. *Ew akademisyen dibin humanist, nabin kurd.*

Çavderî 5: Gelek siyasetmedarên kurd yê HDP di axaftinan xwe de herdaîm dibejin em siyaseta etnîk nakin û stratejiya me “Türkiyelileşme” ye. Coden aqlê protez Kurdîstanbunê diparûzine. Herwisa li Başûrî kurdistan ji ew aqlê protez bû ku referanduma li başûr erzan kir, ji ya Baxdat, Ankara û Tahranê re beşdar dibin. Bandora wê siyasetê li ser Kurdên Anatoliya navîn ji heye. Kurden li Anatoliya Navîn ji dibejin em ne netewperver in. Ew siyaset ne baş e. Lewma min li jorî gotibû kolonîzekirina Kurdan li Kurdistanê û Anatoliya navîn bi hev re giredayî ye.

Çavderî 6: Xwendavaneka kurd (X) li zanîngaha ji ber girtin û dadkirina Can Dundar gelek xemgîn û mujil bû. *Hewalan wê (Y) got gelek rojnamevanên kurd jî di girti-*

gaha de ne, çima tu ji bo wan wisa ne xemgîn bû yî? Xwendava (X) ji hevala xwe Y re got: Tu ne hewceyî netewperestî bikî!

Ne tene di nava akademi, çapemenî û entelektuelên de herwisa di nava kolonan de jî her endamê qewma desthildar Jandarma û parezerê kolonîalizme ye. Axaftin, gotinên û henekên wan li kolonan, bazaran de, wek ji Afrikiyan re “*yam yam*” ji kurdan re „*kiro*“ dibejin, şidetekî rojanê ye. Ew zincira ji peyva li zendên ruhî tîn xistin. Li aqlê protez sinor û programm hatiye danîn. Hedî ew aqil û pergala wî ya fikr û ramanên haceta (instrumenta) inkarkirin û tune kirina xwe ye. Hedî şideta fîzîkî û aqlê protez dest dayina hev çarxa kolonîalizmê digerin. Çarxa şidetê li ser ruh û canê wan e. Aqlê protez bi pevajo dehumanize bawerkirîye û biçûkbûna xwe (dehumanizma xwe) qebul dike. Bi vê awaye razibûnek veşartî a assinmilasyonê dimeşe.

Ne tene di nava akademi, çapemenî û entelektuelan de herwisa di nava kolonan de jî her endamên qewma desthildar Jandarma û parezerê kolonîalizme ne. Axaftin, gotinên û henekên wan li kolonan, bazaran de, wek ji Afriki-

yan re “*yam yam*” ji kurdan re „*kîro*“ dibejin, şidetekî rojanê ye. Ew zinci- ra ji peyva li zendên ruhî tên xistin. Li aqlê protez sinor û programm hatiye danîn. Hedî ew aqil û pergala wî ya fikr û ramanên haceta (instru- menta) inkarkirin û tunekirina xwe ye. Hedî şideta fizîkî û aqlê protez dest dayina hev çarxa kolonîalizmê digerin. Çarxa şidetê li ser ruh û canê wan e. Aqlê protez bi pe- vajoya dehumanize bawerkirîye û bişûkbûna xwe (dehumanizma xwe) qebuldike. Di sedsala modernizmê de kurdan *contract de social* çene- kirine. Tabiyî contracta xelkê ne. Ew felaketa herî mezin e. Lewma Diyarbekir, Cizre, Kirkuk Efrin yek bi yek ji dest wan derdikeve. Êqlê protez nahile Contract de Social di nav bera Kurdan de çebibe. Herwisa Kurdên anatoliya navîn jî bê Con- tract de Social in. Tabî Contractên xelke ne.

Encam

Aqlê protez instrumentekî kolonîalizmê ye. Derîyê wî êqlî herî zêde li ba kurdên Anatoliya Navîn vekirîye. Ji ber ku surgunîyek demdirêj mirovan be welat, be mal be ruh dike. Êqlê mirov li ser kokê xweyanîdîrok, çend û kevnêşopiyên

xwe şîn dibe. Êqlê protez instrumentekî (hecetek) mejû ye wek lingên protez dixin lingen şikestî. Ew êqlî ji bo hînek funksi- yonan hatiya programkirin. Çarçe- ve û sinorî wî belli ne. Berî hertîştî *Aqlê protez* be mûhakeme ye; nika- ra pîrsgirekên nû çareserbike, nika- ra hayalan bike, tiştên nû awanake hertim tiştên kevn dirêse. Lê aqlê organîk mîna laşeyê biyolojîk e, ew dizane çi ji laşeyê wî re ci hewceye çi baş û ne baş e. Rezîstansa (berx- wedan) wî di jiyana de pir bi hez e. Aqlê organîk serbixwe ye. Li hem- ber pîrsgirekan çareserîyan dibîne. Azad difikre hayal dike. Ji ber vê yeke kapasîteya wî a awakirinê û icatkirinê mezin e.

Heke aqlê organîk ku di nava civaka niha kem be jî, disa jî dikara xwe regenere bike. **Lê Aqlê protez wek dahndikê gen manupulekiri ye. Mirina wî di nava wî de ye.** Ji ber vê yeke gotina kolonîalistan “Yek kes jî bimîne şerê me bi wan re berdewambike” giring e. Gere kurd ji êklê organîk biparezen û li erdê xwe hertim wek dehndikê organic birijînin. Kesên ku hatine kolonîzekirin nikarin bes bi şerêk fizîkî, yên çeka bi serkevin. Bi ser de eger ku kurd bes pratika şidetê

bimeşînin de-facto ew şîdet dibe ku xizmetî kolonîalîzmê jî bike. Şînkirina aqlê organik hişmendiya netewî ye. Şer ne bes bi çekan, di nav çapemeniyê, civakê, çend, huner, zanistiyê bi heş û aqlî dimeşe. Aqlê protez li wan deran tê awakirin, ger aqlê oranîk jî li wan deran bê şînkirin.

Kolonîzekirina (asîmîlasyona) kurdan li Kurdistanê û li Anatoliya Navîn îro bi rêya dibîstan, mizgeft, sosyal medya, rêzefilm, entelektuelan (zaningah), rojnaman/kovaran hrw. dimeşe. Mirov dikara çend peşniyazan bîne ziman. A yekem,

divê malbat ne bixwe ne jî zarokên wan rêzefilmên tirkî temaşabikin. Ya duyem, divê her sal li Ewropa bi taybet jî li Swêd konferansek mezin bê awakirin. Ya din di demeke dirêj de wek projeyek gere înstîtuya Kurdên Anatoliya Navin bê damazrandin. Li havîna yan jî li dawiya hefteyî kursên zimanê kurdî ji zarok û dayikan re bên amadekirin. Bi piranî rewşenbîr, sazî, siyasetmedarên kurd ji bo çand û zimanê kurdî rola xwe baş nalîzin. Gotina dawî; ziman hestiyê piştê ye bê ziman belawbûna wendebûna miletekî hêsan e.

Çavkanî:

- Adorno, T., & Horkheimer, M. (2013). *Dialektik der Aufklärung*. Frankfurt am Main: Fischer-Taschenbuch.
- Besikci, I. (1991). *Devletlerarasi Kurdistan*. Ankara: Yurt Yayinlari.
- Calsters, P. (1980). *Vahsi savascinin Mutsuzlugu*. Istanbul: Ayrinti.
- Cesaire, A. (2000). *Discourse on Kolonialism*. New York: Monthly Review Press.
- Fanon, F. (2008). *Black Skin, White Masks*. New York: Grove Press.
- Freud, S. (1974). *Massenpsychologie und Ich Analyse: Die Zukunft einer Illusion*. Frankfurt am Main: Fischer Taschenbuch.
- Garip, S. I. (Mai-August 2018). Êqlê Protez ê Koloniyê. *Zarema Rexne û Teorî no: 13*, S. 30- 35.
- Meharg, S. J. (November 2001). Identicide and Cultural Cannibalism: Warfare's Appetite for Symbolic Place. *Peace research Vol 33, No:2*, S. 89– 99.
- Memmi, A. (1991). *The Kolonizer and Kolonized*. Boston: Beacon Press.
- Opengin, E. (25. july 2012). *Academia.edu*. Von https://www.academia.edu/4205725/Sociolinguistic_situation_of_Kurdish_in_Turkey_Sociopolitical_factors_and_language_use_patterns abgerufen
- Saylan, T. (06. september 2006). *Radikal*. Von <http://www.radikal.com.tr/yorum/turkiyenin-kani-cani-yibolarda-2-791001/> abgerufen
- Williams, A., & Suzanne Ortega. (December 1990). Dimension of Ethnic Assimilation: An Empirical Appraisal of Gordon's Typology. *Social Science Quarterly. Vol 71, No. 4*, S. 697- 710.

GER, TIRS, BÊDENGÎ, LÊKEVTÎNA DEVREŞ

Nuh Ateş
nuhates@web.de

Li payîza sala 2017an li gundê Xelika (Xelikê Jor) yê ku ez li hatibûm dunyayê, rojekê danê siwê ez û heval û hemsalê min yê bi nasnavê zaroktî, Hopo hatin ba hev. Nasnavê min yê hingê jî Çîro bû.

Em li halûxatirê hev pirsîn û paşê, li gor qewlê me yê gerê, me berê xwe da Çîyayê Hec Reşîd. Ev çîya yek ji rêze çîyayên volkanîk yên li alîjorî gund e. Li gund va çîya pirtir bi kurtenavê, „Çîyayê Herşîd“ dihê naskirin.

Hîn niha jî qala hekata vê navlekirinê tê kirin. Hec Reşîd ji Xelikê Jor e. Kes nizane ji sedîsed kingê qewimîye. Lê qet nebe zêdetirî sed salî di ber vê bûye. Hec Reşîd dilketîya xwe, Fata Domelêx ya ji Xelikê Jêr a ku li kesekî din bi dergîst bûye, direvîne yan herdu bi hevra direvin û tèn li vî çîyayî bi mehan dî îna da dimên. Di dil û paşilê da eşq, tirs û wêrekî, ew xwe li wir vedişêrin û diparêzin. Hêzên aseyîşê, mermalîyên Fatê û dergîstê wê li pey wan bûne...

Dirêj nekim, li dawîyê Fatê û Herşîd bê şerûbela digihên mirazê xwe. Ji avûrûyê vê serpêhatîyê da, xelkê gund navê Hec Reşîd li vî çîyayî kiriye. Navê vî çîyayî bi tirkî „Haci Reşit Dagi“ ye.

Peçekê şûnda, ez û Hopo gihêştin derdawên Çîyayê Herşîd. Li wir gavekê em dawestîyan û vehesîyan. Xwaşbîhna giyayê hewşanê li derûdora me belav dibû. Bi hênîkî û xewleyîyê, bi dûrditînîya berfireh ya li derdawên çîyayê û bi mêskirina ji jor da li manzereya zeviyên bi rengên zer û gewr, me xwe sivik, bi şewq û şad hîs dikir.

Çend gavan şûnda, em raste kûsiyekî hatin. Li Xelika jê ra kûsiyê bi qalik tê gotin. Wexta ku kûsî em ditin, ew dawestî. Wî pir bîdîqet li me mês dikir û ling û serîyê xwe berve hundirê qalikê xwe dikişand û berdida. Palikên çavên wî bi lez hel û dihê dihatin. Wer xwîya dibû ku ew ji me ditirsîya û wî dixwast kêfş bike ka zîyaneka ji me bigihê wî yan na.

Tê gotin ku kûsî heywanekî bîrgeş e û qewimîyên rabirtî zûbizû ji bîr nake. Min berê xwe berve Hopo kir û got:

– Dihê bîra min, careke, di zaroktî-xortanîya xwe da, min kûsiyek dernexûn kir. Xizanê min bi çi ezîyatî bi çar lîngan li ber xwe dida ku xwe sererast bike...! Ez niha ji ber vê pir poşman im!

Hopo kesereke kûr kişand û got:

– Erê lo, Çîro, qet qalê meke, ew çi heşê me bûn. Min carakê çêleka kûsî girt ani û dernexûn kir û da ser diwarê harimê me. Paşê tiştê hundirê wî hîşk bû, min ew pak kir û qalikê wî da dîya xwe. Hîngê nîstîyeke weng hebû: Sewa çavê neçê, qalikê çêleyên kûsî bi morîyên çava, bi kinêrk û kepiskekê va tevhev bi bêşik û hêlanê zarokan va dikirin. Miçoyê Hemê, Çîro ew ê ware bîra te jî, hemsalê me bû. Ew î pir şer bû. Wî mişkê çolê di-kujtin û yê kuji dihejmartin û xwe pê dipesand.

Min serî hêjand û got: Erê erê, dihe bîra min! Tu ê bibêjî çil? Heşnegihêştîya zaroktî û xortanîyê û kêmanîya şîretkarîya mezinan bû. Xwedêkê, ta ji berêberê da li vê dunyayê bi zîyankarîyê di ser însanan ra jîndar heye? Zîyana ku însan dide

însên û her çêşîd jîndaran, dide erd û ezmên bê hed û hesab e. Nimûne, li Rojhelata Navîn mês bike, li her derê hing, şer û şewat e. Devlet û hêzên heremî û navnetewî û her çêşîd zordest û yanegirên wan sewa hukimdarî û menfatên curbicur di nav hing û şeran giran da ne! Li ba henan ji wan, lêdan, eşkence, kujtin û dardakirin pir hêsan û erzan e. Çi pêtûar e, hen ji wan, tu ê bibêjî ew ê ketine yarîyê, xwe bi kujtina dijmin û hemberîyên xwe dipesinine, kujtî û mirîyên hevûdu dihejmjirine û eşkere dikine. Bi her çêşîd sîlehan, ew ê bere gund û bajaran didine, wan û derûdeştan bombebaran dikine, xwezayê tarûmar dikine! Ew ê jîyanê li her çêşîd jîndaran diheriminîne... Bi gotina mezinan, ew ê ji rê viderketine, ji rê!!!

Ez û Hopo peçekê rûniştin û bédeng man. Paşê min destek giyayê tezê rûçikand û bir li ber kûsî kir û di ber xwe da got, „Bibaxşîne!“ Hopo jî mîna min kir...!

Li wê navberê desttêlê min lêket. Berpirsekî qenalê televîzyonekî Kurdistanî li ser telefon bû. Wî telefonê min ji nasekî min videstxistibû û dixwast bi min ra hevpeyvînekê derheqa gîştîpîrsîya (referenduma) li Kurdistanê Başûr bike. Tîma TV bi

minesebeta gîştîpîrsîyê li cîhûwarên Kurdên Anatolîyayê digeriya û dîtînen wan dipîrsîyan. Min daxwaza wî qebûl kir.

Min dixwast ku Hopo jî teve vê hevpeyivîne bibe û fikra xwe bibêje. Min li ber da, lê Hopo nexwast, xwe bada û got:

– Nabe, ez nawêrim û naxwazim li ser vê mijarê deng bikim. Keçika min mamhoste ye, ew a zîyane bibîne û ew ê wê ji kar bi dûrbixin! Ma tu diwêrî ku devî xwe vekî? Tu nabînî heyamê sîyasî ji tîrsê bi bar e, yê destbiço li ser dar e, devnegirtin di rewşeke ha da pêtûar e...! Birako, van gotinan tenê li ba te dibêim û li heyamekî weng yê ku ji xerawîyan dagirtî, tu ê devî xwe negirî lê çir bikî?

Min keser kişand û li Hopa vegeland, got:

– Malneketo, eger devgirtin û bêdengmayîn çare we û her kes devî xwe bigrê, ma kî ê di tengîyê da ware hawarê yên ku dengê xwe li hember neheqî û zulimê bilind dîkin? Bizane ku devgirtin, tîrs û tîrsandîn sileha zorbaza ye. Bêdengmayîna li hember nehekî û zulimê gunehkarî ye. Tîrsandina civatê û bêdengmayîna wê xevn û xwasteka diktatoran û

rejîmên otorîter e. Ew ji pîrdengî û pîrrengîyê qet hez nakin!...

Hopo got: Tu xwaş deng dikî, gotinê te ji hêlekê da rast in jî, lê dîsa jî ew tîrsa min sivik nakin. Ma ji te ra çî heye, tu hemwelatîyê Almanya yî. Almanya were hawara te, lê ez ê çir bibim?!

Ez û Hopo gavekî bêdeng man... Paşê em ji gerê vegeriyan. Hopo xatir xwast û vegeriya mala xwe.

Berî nîvro, wekî ku me lihevkiyibû, ez û tîma TV li ser nekewa li alîjorî gund hatin ba hev. Min daxwaz û pîrsên wan yên derheqa gîştîpîrsîya li Kurdistanê Başûr da, vîqasî ku di bîra min da maye, bi kurtî veng bersivandin:

– Gîştîpîrsî bo her miletekî heqekî rewa û yasayî ye. Gîştîpîrsîya li ser mijara serxwebûna Kurdistanê Başûr gaveke dirokî ye û rewayî pesandin û piştgirîyê ye. Ew hewldan û hemleyeke aşîyane û manidar e. Bêguman serkevtîbûna wê a tesîreke erênî li ser millete kurd li her çar parçeyên Kurdistanê û li ser kurdên Anatolîyayê jî bike... Ez dorpêç, gef û fetwayên neyaran yên li dijî referendûmê red û lanet dikim!.. Sîstî û lawaziya hevgirtin û yekrêzîya hêzên kurd yên sîyasî meriva diêşîne û metîrsî ye. Ev e

sileha herî bi tîn ya di dest neyarên kurd û Kurdistanê da!...

Paşê, li ser daxwaza tîma TV, em çûn qehwexaneya li nava gund. Wan dixwazt ku mijara gîştpirsîyê bi rûniştvanên gund yên li qehwexaneyê va gotûbêj bikin. Em li pêş qehwexaneyê ji tomoûla tîma TV peya bûn. Cihê gotinê ye, qehwexane ya mêran e. Hîn nebûye edet ku li gund jin herin qehwexanayê. Li qehwexaneyê nehûdeh mêr rûniştibûn. Me silav da wan û min tîma TV bi van da naskirin û derheqa miraz û mijara hatina wan da ew hayadar kirin. Tu kesî ji wan nexwast ku li ser vê mijarê deng bike. Min çavên xwe yek bi yek li ser wan gerandin û bi hîşmaran xwast ku ew fikra xwe li ser gîştpirsîyê bibêjin. Tu kesî nexwast ku deng bike, tu kesî bi deng negot ere û negot na. Ku min çave xwe berve kê kir, wî yan serîyê xwe li rast û çep badikir yan brû û bijangên xwe berve jor heldinan yanê wan bi livandina birû û bijangan deng dikirin. Gîşt bêdeng bûn, mîna ku bibêjî ew ê kerûlal bûn. Xuya bû ku tu kes ji wan ne hazir bû ku devê xwe jihev bike. Tê bigota gîşt bûwûn êsîrên tirs û bêdengîyê!

Ez bi tîma TV va gaveke li qeh-

wexaneyê rûniştin, me çay vexwar û sohbet kir. Paşê Tîma TV rabû û li meydana pêş qehwexaneyê xatirê xwe xwast ku birekevin. Di wî devî da, Tîmeke Jendirme ji qeza Kuluyê hat li ber qehwexaneyê dawestî. Xwîyabû ku sixur û berdevkên desthelatdariyê hema xewer gihandibûn Jendirme. Tîma Jendirma dorûpaş me (ez û Tîma TV) hevş kir û nasnameyên me kontrol û qeyit kirin.

Berpirsîyarê Tîma TV ji serjendirme ra got:

– Ma hun ji bo çi me kontrol dikin? TV ya me li gor yasaya bi ruhsat e û mafê me heye ku li her derê Tirkîyê bernameya çêbikin!

Sercenderme bersiv da û got:

– Dizanim, mafê we heye. Lê ji ber ku têvadan (şikayet) heye, em mecbur in bihên cihê bûyerê û kontrol bikin.

Wexta ku Tîma Jendirme hat û dorûpaş me hevş kir, bêdengîyeke ji tirseke kûr û kwîr bi bar dagirtibû ser meydana li pêş qehwexaneyê û rûniştvanên wê yên neliv. Ji niçkava lêkevtina Devreş, kûçikê Genco, evte– evt û zûrezûra wî li nav bêdengîye belav dibû. Te ê bigota, Devreş ji ber bêdengîyê nerehet e û lowma lêdikevt. Ma-

la Genco li paş qehwexaneyê bû
 û Devreş di harimê da bû. Paşê,
 çiqas rast e nizamim, hin kesan di-
 gotin, “Genco di kûncekî harimê
 da kûçik kiş dikiriyê!”

Di katkîrin û gotinên zemanê
 rabirtî da, carcaran qala bûyerên
 bi tirs û bi bédengiyê va girêdayî
 di hate kirin. Digotin, Husînê Gêjo
 yê rehmetî û şorxwaş digotiye: “Ez
 ji bédengî û kerrûlalîya şevan pir
 ditirsîyam! Li çolê, li çîya û banîyan
 meriv di bédengiyê şevan da bi
 dengê xîşinî û qirçinîyekê piçûk,
 bi firînîya teyr û tuyekî, bi qeretû
 û manzereyê nenas cûnî dibû.
 Heyvan jî ji bédengî û manzereyên
 veng ditirsîyan, kûçik lêdikevtin û
 dikirin zûrezûr!..”

Ji kontrola nasnameyan şûnda,
 Tîma Jendirme vegeyîyan çûn
 qezê. Tîma TV ya ku li hember
 bédengmayîna mişterîyên qehwexa-
 neyê matmayîbû xatirê xwe xwast û
 çû ser karê xwe.

Pir neçû, danê nîvro derewxebe-
 reke li nav gund bilez hat belavkirin:
 “Jendirme hatine gund û Çîro gir-
 tine û birine Qezê!” Kesî ne dizanî
 kê gotiye. Bêşik ew şîpê neyar û
 xêrnexwazan bû, yên ku dixwastin
 tirsê belav bikin!

05.09.2018

Were keko ... to bo şîr î Were tança ... evî serî

Dujmin marekî ejdeha ye
 Çar ser hene wekî êk
 Bo me nîase û eşkera ye
 Pêgve girêdayne li gel êk
 Jehra wan di zikmag da ye
 Yêt mêtîn ji êk o êk
 Eve hezar sale xo vedaye
 Ber me hinda biye rêk
 Mixabin xebat cida ye
 Dê kengî xebat bit êk

Were keko ... to bo şîr î

Were tança ... evî serî

Were hêza bikîne êk
 Dîyarîyek bo vî xakî
 Çerxa şoreşê bidîne rêk
 Da azadkî vî civakî
 Dê welatê me gehte êk
 Demê to jî barî rakî
 Maf pêvîye bibîne êk
 Dê bo mafê me cidakî
 Dê aloz bit ber te ew rêk
 çend to rexta li milakî
 Bo dê minî êk o ez êk
 O sînemê li me hindakî

Were keko ...to bo şîr î

Were tança... evî serî

Sinem dayika min o te ye
 Daxaza wê em bibîn êk
 Çavê wê li benda me ye
 Werê pêk ve bidîne rêk
 Qesa dadê êk qesêyê
 Ya her car di dit ser êk
 Kurdistan li hîvya we ye
 Dîlê xu evro bikin êk
 Cidabun qedexe ye
 Nanê xu evro bidin êk

Were keko ... to bo şîr î

Were tança ... evî serî

Karim Najar

KARIKA QEHEMAN

Mistoyê Heco
mistoyeheco@hotmail.com

*Carek ji caran
Rehmet li dê û bavên guhdaran
Li rêwîyan
Li sêwiyên ber hêt û diwaran
Guh bidin vê çîroka ji dengê hêwanan.*

“Kesek naxwaze bi min re bilîze.” got karika me ya lingxwar û bi çavên girî lê zêde kir, “Xwaska ez qet newûma. Ev çi qeder e, bi kêrî tu tiştî nawime û kesek ji min hez nake.”

Meşekê ji taldeya hewza yêm guhê xwe bel kir û guh da dengê giriyê.

“Berxikên kozê tûnî, heta yên virinî jî çûn çêrê, lê ez tena serê xwe li vir mam.” got û kire gazine karikê: “Xwaska ez qet newûma.”

Kêzîkekê xwe da kêleka mêşê û jê pirsî, “Çi dibe?” Mêşê qet guhê xwe pê ve nekir û çavên xwe ji ser karikê ranekirin.

“Gîştîk sûncê wî şivanî ye. Ax-ta ez ji dakê bizem lingê min ji cih derxist. Dizamî bi qestîka wer kir. Nedixwast ez jî nola berxên din bidim lotan. Jixwe ew ji dakê min jî qe hez nake. Tim lê tengive, çov li piştê tişkîne.”

Mozek hat ba mêş û kêzîkê û got, “Ev karika cinû xwe bi xwe tawê

çi?” Mêş û kêzîk qe bi wir ve nebûn. Çavên xwe kutan ser karikê û ji ser ranekirin.

Karikê ji ser hewiz re bazda û xwe ji navbera derî re berda nava hewşê. Çû ba kirika (sîpeya) kerê. Kirikê (sîpeyê) da çiftan,, pînek avêt û ew ji xwe dûr xist. Çû ba cewrikên dêlê. Cewrikan jê re kir gixegix. Neçar ma dîsa vegeerî kozîka xwe.

Erê, karika me seqet bû. Kesî nedixwast wê tevlî xwe bike û pê re bilîze. Lê dîsa jî wê omidiya xwe nedibirî. Seqet bû, lê cansivik bû. Bo deqeyekê be jî li ser boça xwe rûnedinişt. Bimira jî boç li xwe dane-dixist. Îna dikir, dizanî bû dê rojekê kêrî tişteki were. Û wengana jî bû.

Wê rojê, piştî nîvro baranekê lê kir, lê çing lê kir. Te digot qey ewr daketibûn erdê û çi diket ber didanên xwe ew didan ber gezan û dadiqurtandin.

“Ax dayê! Tu li ku yî?” got û kire girî kirika (sîpeya) kerê û kûzîniya

cewrikan li dengê giriyê wê zêde bû: “Em ji reqereqa ewran ditirsîn. Li ku mayî dayê?” Heman telaşeyê bi mêşê, kêzikê û mozê jî girt. “Ger kerî careke din neyê em ê ji birçînan qir bibin.” gotin di navbera hev de.

Kêfa karikê ji halê wan ê belengaz re dihat. Digot, “Oxx çi rind bû. Axta we guhê xwe ji gazine min re ker dikir, ez didam ber pîn û çiftan û we ji min re fikir gixegix rind bû ne? Hûn jî nola min bi tena serê xwe bimînin û mêzkin ka tenêbûn çi qas rind e.”

Heta wê rojê çi kirika (sîpeya) kerê, çi jî cewrikên dêlikê derveyî hewşê nedîtibûn. Axta ew ji bona li ber karikê bigerin, ku ma karik bi wan re here dakên wan biwîne, hatin ba karikê ewran hema hema barê xwe li xwe sivik kiribû û baran êdî nedibarî.

Kirik (Sîpe) û cewrik hatin ba karikê û li ber wê gerîn. Songiyê karika me li wan hat rehmê û bi hev re berê xwe dan derveyî gund. Axta gihîştin neqeba merzelên gund karika me xwe hêl kir û bi carekê re bazda ser dîwarê hewşa merzelan. Guhê xwe bel kir û da nav dengê bê. Bayê ji dûr ve dengê berxikan bi xwe re dianî. “Me xilas kin! Me xilas kin! Me xilas kin!” Bi bihîstina dengê re karikê zanî ku durimê tarê ye. Xwe çengî jêr kir û bi sê lîngan da bezê. Kirik(Sîpe) û cewrik bi dûwê de bezîn, bezîn, heta ber devê fêzê

bezîn. Devdevî êvarê gihîştin ber çemê ji nav fêzê re diherike.

Çem di nav fêzê de dibû du milan û berx jî di navbera herdu milan de diçêrîn. Piştî baranê lêhî daketibû û çem ava xwe ji ser xwe de avêtibû. Kuprî di bin avê de mabû û rêya vegeerê li ber keriyê hatibû girtin. Hindik mabû ku berx biketena ber ava lêhiyê, com bûbûna û biçûna.

Kirik (Sîpe) û cewrikên me çav bi diruma dakên xwe ketin û dest bi girî kirin. Di wê navberê de karika me lê çû ferqiyê ku ber devê milekî avê bi tûrikan hatiye girtin. Karika me xwe avêt ser tûran û bi devê xwe yeko yek ew ji ber avê kişandin. Guşîniya ava lêhiyê daket ser wî milê avê û piştî kupriyê xuya kir.

Karika me xwe da ser piştî kupriyê û berx gîştik bi silemetî xilas kirin. Dêlê hat ba cewrikên xwe. Kirikê (Sîpeyê) bi boça dakê xwe ve girt û hemû bi hev re gihîştin gund.

Berxan ji karikê re kilam dan ser kilaman û li hev vegeerandin. Mêşê, kêzikê û mozê bi wan kilaman govend girtin.

Piştî wê rojê kê çi bikira karika me ji xwe nedicihîşt.

Roj çû ber avan

Gihîşt warê xeyalan

Çîroka min çû rast. Min xwar sîniyek mast.

HENEK:

Henekên Kamyonvanên me

Hızır Akbîna

Karê kamyonvana li Anatoliya Navîn karêkî helbijarte bû. Yê ku di vî karî da dişûxlin gîştik mer in. Ji bo wê jî henekên xwe jî bêsansûr in. Kamyonvan hemû kesên fedakar in. Ew na bêxew, tî û birçî, şev û roj jî vê civakê re dişûxlin. Li henekên wan jî mezemekin. Di dilê wan de tu xirabî, neçetî tûnen. Ew her dem alikarîya hev dikan. Mal û can li ba wan yek e. Ez ji wan jî jî henekên wan jî pir hez dikim. Ezê ji we ra, hanekeka wan ya min bihîstî binivîsinim.

Zîyareta îdê

Kamyonvan ji bo îdê (çejnê) hatibûn gundê xwe, îdê xwe bikin. Roja erefê li ber dîwarî hevalê xwe, Newzat civîbûn, bi hev ra henek dikirin. Di wê demê da etik derket hat. Newzat li jinûyê xwe xist û got;

– Eyvax! Wanê bi rû etikê kevin, ez xwe bigihînim wê. Etê, vir da were! Etê vir da were!

Etikê xwe lêna çû, kete nava kamyonvanan. Gîştik çûne destên etikê. Fezo got;

– Etê, tu li ku yî? Xwazgincîyê te hat, tu li nav gund digerî. Etikê got;

– Xwazgincîyê çî ne? Min ji kê ra

dixwazine? Xalit got;

– Hec Kasim hat tu xwastî, Xelilê brangê te jî tu dayî. Etê li jinûyên xwe xist û got;

– Vax, vax vax... Çima ji min ra negotin. Xalit got;

– Tow... tow... qelingê te jî sandin. Ji Newzat ra dan peşineta kamyonê. Abisêf got;

– Etê, xelata te kê sand tu dizani? Etê got;

– Kê sand qurban? Xalit got;

– Remkê pismamê te, hezar qayme û paltoyêk danê. Etê bi hersekî got;

– Ez lê helal nakim, ma lê zêhêr û zikkim be. Herin şiva jê bistînin. Fêzo guhê Xelil da got;

– Ber xwe neketîyê, ber xelatê ketîye. Abisef got;

– Here qayda xwe bike, yê werine te bibine. Etik girîya û got;

– Acela xwe çî ne? Ma rokê sabr kin em ser û kincê xwe bişonî.

Etik girîya û edin kamyonvana pir damîş nedan. Gotin; etê qûsirê me meze meke. Me bi te ra henek kiran! Û derxistin yek sed qayme xerçlix danê, kenîn û gotin heqî xwe helal ke...

Henek bû rast...

Roja din kurikê Hec Kasim bi jina xwe va derketin hatin mala Newzat.

– Nîvana qebûl dikine? Newzat got;

– Ser sera, ser çava, kerem kin werin.

Dil û xatirê hev pirsîn, çay û qehwe vexwarin. Heskê got;

– Newzat hûn dizaninê em hati-ne çî? Newzat got;

– Na, em ji ku bizaninî! Heskê got;

– Hevalan duh ji etikê ra gotine, em ê te bi Hec Kasim dinî, wê jî gotiyê ya bibe. Em jî îro hatinî etikê ji kekê ra bixwazinî. Hûn diwêne çî? Newzat got;

– Lo Hesol! Te serî xwarîye? Çaxa etikê mera ya loo? Ma ew şora ne te kiri be, ne jî min bistî be. Heskê çavên jina xwe mezekir û got;

– Xatûn tu dewê çî? Xatûnê got;

– Xwedê kiriyê qeder ya bibe.

Newzat bi hirskê çû odêya din, Hesik jî li du rabû çû, got;

– Mezeke Newzat, hûnê etikê dibine Qonyê, ew li wir naskine. Em jî kekê dibini Ewrûpê, ew jî li wir naskine. Tu were bê erê, ma ji xwe ra starîya li hev bikin.

Newzat got;

– Ez bême çî, zati jina yî nav û hev da dane. Heskê got;

– Edin ew dayîka me ye. Teme

tu meraq meke. Newzat bira ge gotiyê ma kamyonê jî bidin min. Kamyona me jî li hûndire, were teksît û arebonîyê bide ma li te helal be. Newzat got;

– Ew derewana ke ji we ra gotin! ew henekê keran ne, ewna ne ya însana yê. Newzat girîya, Hesikê xwe avite stû û got;

Rabûn belavbûn, dev deva evarê, jinên malbatê hatin etik birin mala Hec Kasim.

Dora dinê rê...

Kamyonvan hatin mala Newzat û gotin;

– Newzat kûsirê mêze meke, me ji xwe ra henek kirin, ma hajê çî bû, jinê herine rast bikine. Newzat veng li wan meze kir û got;

– Pîncê weledî zîna no! we etik da, we çima kamyon serê min fiqarî kir bela. Ez niha teksît û arebonîyê wê çing bidime?

Kamyonvanan veng di bin çavara li Newzat meze kirin, carek jî Fêzo meze kirin, gotin acêba Fêzoyê ji wan ra çî bersive bide. Fêzo veng li wan meze kir û got;

– Yawrim ji te ra çî heye? Te etik da peşinatê, here xasîyê xwe jî bide teksîda.


Kamyonvan giştik bi hev re kenîyan û her yêk bi alîyêkî de belavbûn.....

dema ku tirîjên rojê yên teze axa min dixamilandin
bayekî germ li ser lêwên min dihilîst
û dengî pêlên behrên dûr hundirê min zîz dikirin
va stêrka dûnê ya me ye
ez î axê, avê û hewayê bi mêşhingiv kûrm û kêz
çuçikên hewa û li ser erdê va parva dikime
asîmanê hêşinê canê min zindî dike û difirîne
pîrsên bê bersivên ku tama xwe wek axûyê marîkor in
mejo û dilî min mijûl dikine û diêşînine
ez î ji bîrên kûr avên teze û zelal vedixwime
û xwe ji avên qilêrî û şilopî bi penç hîsên xwe diparzûnîme
tu rîyê minê bêguman tunen
her rîyek mektebek e
çavên min ê tu serdaran û rêzanan nebînin
çîmkî ew, bîndên li ber lêkolîna heqîqetê ne
ez giranîya û sivikîya rojan dizanim
min serêşîyê jîyanê û bêdilsozîyê însana dîtîye

Seyfî Doğan

Gundê kurd li dorberê KIRIKKALÊ

Dr. Mikailî



Me di hêjmara 49an ya kovara bîr-
nebûnê da qala vê behsê kirî bû. Le
hîn xwendewanên kovarê, bala me
kişandin ser ku, me hîn gundên ne
kurd in, wek gundên kurda nivîsan-
dine, yan jî hîn gund kurd in lê
mezheb û bawerîya wan ne sünni/
Henefî ne, yan berovajî ne elewî
ne, şaş nivîsandine.

Ew kesî ku di vê karî da ked
û emega xwe herî zêde bû, Onur
Çakmak bû. Ew jî gundekî tırka ya
Qulekê ye û bi xwe jî ji Hêciwa, ji
gundî Bîrê bi keçeka kurd va zewecî

ye. Wî bi tevayî bi avakî pîspor
neqşeya, xerîteya gundê kurdên li
Anatolya Navîn jî cardin çêkirî bû.

Em dixwazin bi vê sedemê ew
agahîyên nû û nûvakirî cardin
pêşkeşî we bikin. Ji bo ew çewtîyên
ku me berê kirîbûn jî, ji we lêborînê
dixwazin. Le hûn jî dizanin, wexta
ku kovar nû derdiket, medya sos-
yal ew qas pêşta neçû bû, têkilî û
agahdarîbûn ewqas ne baş bû. Ji
ber vê me hîn tişt ku diketin destî
me, bêyî baştirin warin lêpirsîn,
lekolîn, çapdikirin û diweşandin.

Lista gundên kurdan li Kirikkalê ew in;

Li bajarokê Balişeyh tenê gundekî kurda heyî, di ew 30 salên dawî da di navça Balişeyhê da hêjmara kurda zêde bûye. Ji ber ku ji Kurdistanê pirr kesan malê xwe barî vira kirine. Ji çara yek kurd in. Dîsa gundî **Abili** bi xwe türkman in. Lê nika li wî gundî jî ji pêncê yek kurd in, ên ku nû hatine, koçber bû ne. Gundê **Kilevlî**, me wek gundê kurdan nivîsandî bû, lê ew jî türkmanê ji êla Pehlîvanli û girêdayîya boy a Bayat'an e. Her sal li vî gundî şênayîya Yürüka çê dibe.

Li bajarî Sulakyurt; gundê Dağevî me wek gundê kurdan nivîsandî bû, ew jî türkmenê abdal in.

BAJAR	BAJAROK	GUND	AGAHDARÎ
Kırıkkale	Merkez	Kızıldere	Kurmanc û sünnî ne.
	Balışeyh	Yukarıkarakisik	Ew kurmancê elewî ne, li dorbera wan elewîyên turkmen bi cih in. Ji ber vê jî bi rîya zewac û kêmasiya hêjmara wana, ew hêdî hêdî asimîle bûne, bûne türkman.
	Sulakyurt	Pöhreng	
		Ambardere	
		Imamoğlu Çeşmesi	
		Mezra Körkuyu	Girêdayî gundî Sofular Çiftliği jî gundê kurdan ne û giştik sünnî- Henefî ne.
	Çelebi	Kaldirim	Kurd, eşîra Têrikî
	Bahşili	Küreboğazi	etmanî ne, berê gundê Balayê bû
		Küçüksarikayalar	
		Sarikayalar	
	Yahşıhan	Bedesten	

Gelo ew gund û bajarên kurdan ku 100 sal in bi rîya siyaseteka nemirovî, asimîle bûne, navê wan hatine gorrandin, ji kok û eslê xwe hatine dûrxistin, bona tirkkirinê.

Kî yê vê serrast bike?

FOTERÂ HESENÊ ALÊ

Memduh Selim



Havîn nêzikî dawîyê bûbû. Ji payîzê re jî, hendik roj mayîbûn. Li dawîya meha teboxê rojê germa havînê giran giran diqediya, roj nêzîke dawîyê dibû. Li wan rojan êdin şev giran giran serin, paşê jî sar dibûn. Yanê payîze digot; “ez nêzikî we me”.

Sala 2016, roj 29 yê Teboxê. Em bi hevalan va li Komkurd- An’ê civîya wûn. Me, mêvanekî hêja dipa. Di demeke kurt de me têkilî çêkiribû û me soz dayîbû hevdu ku li Komkurd- An’ê hemû hevalên me tev werin ba hevdu. Mêvanê me yî hêja nîvîskar, lêkolîner Mehmet Bayrak bû. Demeke kin derbas bû, mêvanê me hat komelê. Hevalên li komelê gêştinî hev, jê ra xêr hatin kirin û li hal û xatirê vî pirsîyan.

Pîşt re li ser pirtûka vî, lêkolînên vî sohbeteka xwaş û dirêj destpêkir. Di nav vê sohbetê da, telefonê minî destta dirêj dirêj lêket. Min mêzekir, di ekrana vî da Hesênê Alê dinivîsand. Hesênê Alê li min digerrî. Hesên got; “ Ezî li Ankarê me, ezî demeke kin da tême komelê.”

Hesênê Alê, nîvîskarekî Kurdên Anatolya Navîne, li Swêdê dijî, jî gundê Omera ye.

Nêzikî niv saet derbas bû, dûwa zîlê deriyê komelê lêket. Deri jihevûbû Hesênê Alê, bi foterâ xwe ya li serî û çentê xwe yî di destda va kete hundir.

Deme berê, li gundên Kurdên Anatolya Navîn axa û began foter didane serê xwe. Foter nişana heyî ye, nişana



Mem Xelikan, Hesênê Alê (î bi foter) û Mehmet Bayrak

axa û begîtîyê bû, nişana dewlemendîyê bû. Axa û beg, ji dûrva dihatin siftê foteran wanan xuya dikir, meriv wê demê difikirî, dizanî ku axa an begek têye. Lê, foteran Hesênê Alê ne foteran axa û began bû. Ne wek wan foteran gir bû, ne jî wek wan foteran bi fet û reng bû. Foteran Hesên, bi giranî foteran meriv pê serê xwe, qotê xwe jî germê biparêze, bi hendikê jî foteran fîyaqê bû. Yanê ne nişana dewlemendîyê bû.

Bi hatina Hesên, heval gelek kêf-waşbûn. Bi xwe re şênayîyek anî bû. Gotinên wî zêde bûn, şorê xwe jî tenekê tûj bûn, henekên cuda jî li ba vî hebûn.

Nîviskar Mehmet Bayrak, Hesênê Alê, Mem Xelîkan û hevalên li komelê sohbeta xwaş kirin. Pirtûkên xwe îmze kirin, dane hewdu û li ser pirs-girêka Kurdan, çand, ziman û stranên Kurdên Anatolya Navîn heval agahdar kirin. Ew sohbeta taybet demeke dirêj berdewam kir. Dûwa hevalan xatirê xwe hastin û belav bûn. Dûw belavbûyîna hevalan, me mêze kir Hesênê Alê foteran xwe li komelê jî bîrkirîyê. Ji bo wê, ez bi telefon li Hesên gerîyam, wî jî min ra got; “dema min niha tune, ez vedigerim Swêdê. Ji kerema xwe re, foteran min veşêrin. Carek din ez hatim, ezê foteran xwe jî komelê bigrim.”. Li ser wê gotinê, me foteran Hesênê Alê li komelê veşart. Ji wê bi şuwa, hevalên dihatin komelê dipirsîn û digotin “va foteran

kê ye? ya kîjan axa yî ye?”, foterê bala hevalan dikişand. Herkesî êdî dizanî foteran Hesênê Alê, mêvana komelê ye. Me bi alî jorî xwe de kiribû, her hevalê lê xwedî derdiket û mîna çavên xwe diparastin.

Bi ser mêvantî ya foteran Hesên de, çar meh derbas bûn. Li piştî çar meh şunda, rojekê merinên devletê yên fermî hatin komelê û gotin “Hûn jî dizanin, ji bo rewşa awerte li Tirkî ye sazîyên demoqratik û sîvîl hatin qedexekirin. Komele ya we jî, di nav wanan da ye. Bi bîryara fermî, dixwaze va komele ya jî were girtin. Ji bo wê, emê niha komelê, bigirin û derî yê wê mohr bikin û di bîryara fermî de tiştê di komelê de hemû/gîştik bûn malê devletê. Bi hevalan ve me li ber xwe da, hinek tişt an jî qe nebe, pirtûkên xwe xilaskin. Lê, mixabin destûr nêda em tiştê heynin. Gotina me ya “Foteran ji me ra mêvan e, qe nebe wê bidin me” jî pere nekirin. Bi me re gotin “tiştê girtina we sêce, van tiştên di hundirê komelê de, jî vê dema şunda gîştik tiştê dewletê nê”.

Bi kurtasî devleta tirk, komela Kurdên Anatolya Navîn, ya bi navê KOMKURD-ANê girt, tiştê li hundirê wê de hemû heyran birin (bi Tirkî dibêjin “müsaderê”) û paşerojê jî firotin. Di nav vî tiştî da foteran Hesênê Alê jî hebû. Dibe ku wanan, ew foteran axa û begên berê, foterek gellerî, yeke ku pîrr peran bike hesibandin.

Di mijê de rêvîtyek

Mem Xelîkan

Sibê zûda, saet hê 7.30 bûn. Têlefona Heco liket. Heco, ji nav cîya biderket destê xwe dirêje têlefônê kir û bixwe û xwe "Xêr e, îşalla! got û têlefona girt. Bekir wû.

– Heco, roj baş! Netirse, tişteki neçê tune. Li gund, lavikê Meçoyî Fatê dina xwe guherî ye. Çûye rehmêtê. Min got huro tu li malî eger tu betalî, em tev herin gund û sersaxîyê bidin malbatê dê baş be.

– Welle ya rind be. Ez huro betal im. Narime kar. Li mal im. Erê, ez jî werim. Carek din, ez bişanakim herim. Got Heco.

– Bekir: De tu xwe amade bike, hetanî nîvsaetê ez ê te ji ber malê heynim.

– Heco: Baş dibe, bendewarê te me.

Heco û Bekir ji gundeki wûn. Meriyên hevdu wûn. Li bajêr kar dikirin. Ji bo ku, zarokên xwe bidin xwandinê malên xwe jî anîbûn bajêr. Herdu jî, li eynê taxa bajêr rûdiniştin. Malên wanan, nêzikî hevdu wûn.

Li navenda bajêr, qehweke gund hebû. Demên xwe yên betal, diçûn wê qehwê derbas dikirin. Gundîyên

wanan, li dawîya her heftekî li wir berhev dibûn. Sohbet dikirin, ji hevdû xeberên gund digirtin. Ji bo herkesekî ew qehwe, wek maleke gund wû. Gundîyên li bajêr rûdiniştin, wek berê têkiliyên wanan û gund ne zêde wûn. Li dol û dawetên merî û cîranan, li şînan diçûn gund û dihatin.

Nîvsaet derbas bû nebû, Bekir hat. Ji ber malê, Heco girt û bi rêketin. Demsal zivistan bû. Eyamî, sar wû. Nav bajêr mij ketibû erdê. Dema ji nav bajêr biderketin, dîtin bi rê de mij û dûman her çû zêde dibê. Meri tenê, 30-50 metra pêş xwe didît. Heco:

– Niha, vê zivistanê serê çî li me geriya ye, got.

– Na na, wer mewê. Cîran û hevaltî heye. Em nerin, ên zikê xwe biêşînin. Tişteki veng em neçin, paşê ji malbatê yekî dibînin em fedî dîkin.

Yek jî, lavê Meçoyê Fatê Reşo, xwedê rehma xwe li bike, hîn can e. Emrê wî 50-55 sal hene tune ne.

– Rast e, lê gund mezin bûye. Di vê mehê de, 3-4 cari n ez diherime gund.

Vê mehê miri zêde wûn. Çûyîn û hatin jî êdi li me bi qar tê.

– Erê, erê lê nerinî jî yê nabê.

– Dixwaze bi têlefona jî va-ya bibe. Meri dikare bi têlefona jî, sarsaxîyê bixwaze. Herkesî karê xwe heye, herdem çûyînê bi qar e.

– Erê, ê em têlefona dikin jî hene.

– Bekir xwedêkê, ez pirr nari-me qehwê. Qehwê nêzikî te ye, na tu diherî. Li wir, çi heye çi tune ye?. Hewal, çi dikine?

– Çi bikine? Tûr tûr digirine.

– Çima? Kar nakine?

– Na lo, kare çi ye ? Tê n li qehwê hetanî êvarê bi îsqembîl û okey dilîzine.

– Çima? Ji wanan qet kesekî karê xwe tune ye? Naşixuline, karê wanan tune e, debara xwe çing dikine?

– Bi qurbane vê hikumatê bin. Perê ew didin, pê debara xwe dikin.

– Çima, pera ji berî ya xwe didine. Her yekî ji wanan, 25-30 salî kar kirine, malnîşî (*tegeut*) bûne û ew maaşa heq kirine.

– Vê hikumatê, ew malnîşî kirin. Yê heq kirî jî, yê nekîrî jî.

– Keko, em dev ji vê mineqêşê berdin. Ez, fikirên te dizanim. Ez çi bêjim, dizanim tu qebûl nakî. Ez, naxwazime bi te re mineqêşa polîtîkî bikim. Mêzeke, tu ji mijê

ber xwe nabînî. Tu yê niha qezakê bikî. Bibî sebebe me.

Herem bi herem, mij hebû. Derderan, meri ber xwe nedidît. Heco yî, mafdar wû. Bi lez çûyîn tehlûke wû. Derderan jî, qet mij û dûman tune wû. Herder ronî wû. Li derên bi mij Bekir, hêdî hêdi diçû. Derên mij tune yî, erebe bi lez diajot ku zû xwe bigihînin gund. Bekir dîsa destpêkir.

– Qîmeta van rêvebiran biza-nin. Xwedê wanan, ji serê me kê-m neke. Vesayeta leşkeran hey-nan, demoqrasî anîn, nasnameya kurdan qebûl kirin.

– Bekir tu dixwazî min hêrs bikî? Ka demoqrasî?. Li memleket, demoqrasîyeke kor û kulek hebû, ew jî xerav kirin. Kî dengê xwe bi-derdixê heps dikine. Akademîsyen, rojnameger, parêzer bi kurtasî kî aşîyê dixwaze girtî ne. Rojname, TV, kovar, weşanên muxelîf, sazîyên civakî yê sîvîl hemû girtin û qedexê kirin. Her çû ji nîrxên demoqrasîyê bi dûrdikevine. Waya demoqrasî ye?

– Ew, naxwazine em rind bibin. Bi devê, devletê dervayî deng dikine.

– Rewşa aborîyê dîyar e. Me-ri yê xwe, dewlemend kirin. Gel herçû xizan dibe. Rewşa memur, karker û malnîşan her çû xirab dibe.

– Çima xizan dibe, Ji her kesekî re alîkarîyê dikine. Pera didinê, şagirtan, didine kal û pîran, didine xizanan, hê çi bikin?

– Te got, nasname ya kurdan qebûl kirine. Tu nizanî, bajar û bajarokên kurdan dane ber tanq û topan. Malên wanan bi ser de xelandin, ew giştik koçber kirin. Hevserokên şaredarîyan girtin û heps kirin. Niha, şaredarîyên kurdan ne bi hîlbijartîyan, bi *kayyuman* têne îdare kirin. Ya tu bizanî, ji kurdan re ne azadî, zilm û zordestî anîn.

– Çima zilm û zordestî ? Ma ew jî rehet rûnin.

– Rehet rûnenîştine çi kirine? Gotine, li vî welatî herkes wekhev, di aşî û azadîyê de bijîn. Bi çand û zimanê xwe jîyan, bi mafên xwe yên kesetî, demoqratik û netevî wek herkesi jîyan xwastin, pirr tişt e?

– Çi me yî kê m e? Herkesek di mala xwe de rehet rûne, kesek ji wanan re tişteki nabê.

– Bi vira nebû, çav berdan Rojava jî.

– Erê, ê niha ji kurdên wira re jî azadîyê bibin.

– Bekir, tu dixwazî min dîn bikî? Tu dizanî, dinê alem jî dizane kujerên ku bi navê dîn û îman li Rojhilata Navîn xwîn rijandin

(piranî yên wan jî kurd û kurdên êzidî wûn), psîkopatên ji çar alîyên dinê yên berhevkiî, yên ku gelên wê heremê koçberkiî, jinên wanan, zarokên wanan serjêkiî, tacîz kiî û firotî, qetîlên DAÎŞê birin li wir bi cî û war kirin. Xelkê kurd jî, bê mal û bê war kirin, azadî birin ji wanan re?

– Çima wer dibêyî! Tu nizanî partîya dewlet damizerandî, li Dersîmê çikas kurd qetil kiribû? Tu wanan dipesinî?

– Tu çikas ser hişkî lo, kê serê wan di zêr de kirîye? Kî pesna wana dike? Bes e dev berde, ji vê minqêşê. Min ji pêşîyê de ji te re got, ez naxwazim e bi te re mineqêşe bikim. Bes e, fikirên te ji te re bimên. Ez dibêm, tu guhdar nakî. Gotinên min, di guhekî te re dikevinê, di yên din re têne derê. An jî, qet nakevinê.

Herdu heval, bi wê xing û qaxê nêzikî gund dibûn. Ji dûrve gund xuya dikir. Dûv wê minqêşê de, bê deng bûyî bûn. Erebe, hêdî hêdî ke-te nav gund. Çûn ber mala şîne peya bûn. Bekir û Heco silav dan civatê û rûniştin. Ji miri re, melleyê gund fatihe xwand. Meriyên li civatê yek bi yek, li mîvanan pirsîyan. Hal û xatirê wan pirs kirin. Dûva çay hate belavkirinê. Bekir xwest dîsa dest bi sîyasetê bike. Mezinekî "Bekir, em

li mala şîne ne. Ne dema sîyasetê ye" got û pêşî li Bekir girt. Vikasî nîvsaetê rûniştin. Ji wir û vêde deng dikirin. Pirranî mijara axaftinê li ser miri û mirinê wû. Tenakê jî, behsa gund û gundîyan hate kirinê. Bekir, ji melle re got: "Fatîhekê bixwîne, em xatirê xwe bixwazin". Dûv xatirxwastinê, herdu heval ji bo vegeerê bi rêketin.

Bekir: Hatina me baş bû. Dilxatirê hene. Me, xwe ji wê jî xilas kir.

Heco: Erê, rind bû. Me cîran heval jî dîtîn.

Dema hatin nav bajarokê ku guind tê girêdayî, Heco:

– Bekir, ez ji niha de bêjim. Bi rê de, mîna ku li hatinê tu serê min bi wan fikirên xwe yê sist û xelat biêşînê xerê, min li vira deyne, ez ê bi otobos vegerime mal.

– Na lo, eyb e ew çî gotina te ye!

– De radyoyê jihevke, em guhdarkin.

Bêdeng, herdu heval ji nav bajarokê biderketin. Ro dibiriqî, e-yam germ bûyîwû. Mîna sibê mij jî tune wû. 15-20 km. çûn şuva, Bekir mîna qesetekê gotinên xwe dubare dikirin. Heco, çerxê bû;

– Lo tu qet fedî nakî. Ez, naxwa-

zime guh bidim ser te. Ew çî gû wû min xwar, bi te re bi rêketim! Tu, bi gotinên xwe min aciz dikî. Tu dixwazî îşkenca bi min bikî?

Gotinên te, bi min mîna heqere-ta têne. Tu, ji min re pesna yê li ser gelê me zor û zordariyê dimeşînin dikî, ji min re xeraviya dikî. Bes e, ji bo wê, te qet kesek li doralîyên xwe nehiştîye. Heval giştik, ji bo wê ji te direvine. Mêzeke, serê te şuştî ne. Mêjoyê te, şil kirine. Tu, qet guh nadî ser kesî. Tenê rastî yê te hene. Rastîyên te, yê şaş û xelat! Kesekî tiştêkî nizanê. Tu tene yî dizanî. Tu hevceciyê kesî, bi van fikirên te tune. Ya min, qet tune. Bes e, min bêrehetî neke.

Dûv wê gotina Heco ve, hetanî ber mala Heco qet deng ji herduyan ve jî biderneket. Rêvitî, ji wê bi şuva bêdeng derbas bû. Dema hatin ber mala Heco;

Bekir: De li xwe baş binêre, qusûrê jî nenêre, herhal min tenakê serê te êşand. lê ez mafdar im, got.

Heco: Mafdariya te di erdê be. Hê dibêji, ez mafdar im. Bekir, carek din li min megere! Here, kê bi devê te de e.. kiriyê li wan bigere! Got û çû mal.

PÊKENOK

Mûlla Evîndar
mullaevindar@gmail.com

BIZINA BELEK

Şakîr, bizin firotin û lawê xwe Silo pê şande Almanya. Silo çû, telefon kir, go "ez rehet hatim, rind im". Careke din jî ne telefon, ne xeber.

Şakîr li benda Silo ye ku yek cara jê re pere bişîne mîna herkesî. Rokê hevalekî Silo, ji ba Silo tê gund. Şakîr dihere ba dibê "Silo çir dike? Rehet e, rind e?" Hevalê Silo dibê "Silo rehet e, rind e xalo, silava xwe ji we re heyê".

Şakîr dibê "Wî hinek pere, hinek xercî neda te bo min?".

Hevalê Silo dibê "Na xalo, tişt neşand".

Şakîr bi hevalê Silo re dibê:

"Bizina belek heft sala xizmete min kir, Silo mîna bizine jî derneket!"

ÇÛNA BER TEQÊ

Em bi pencerê re dibên "teqe".

Li zemanê berê xort bi şev diçûn ber teqê. Li ber pencereyê li keçika mêze dikirin, bi hev re deng dikirin.

Ûsiv xwe çêkir, ew jî bi şev çû ber teqê. Wexta ku li ber teqê

ye, kûçik xwe berdide Ûsiv, lingê Ûsiv ditişê û li erdê dikeve. Bavê keçikê deng dibihîze û tê.

Bavê keçikê dibê:

"Lo Ûsiv! Tu li vir li çi digerî?"

Ûsiv dibê:

"Xalo, diya min go here şeş nana deyn bike!"

Xalo dibê "Kuro! Dîya te hîn hîro nan lêxist, ji me re jî kilor kirin, tu çi dibê!"

Ûsiv şaş dibe ku çi bibêjê! Kûçik li hêla bû. Vê carê go "Min go ezê bidim kûçik xalo".



Bi çavê kovara Kürt Tarihi kurdên Anatolyayê

Memê Mala Hine

Kovara *Kürt Tarihi* (Dîroka Kurdan) ku nivîsên li ser dîroka kurdan belav dike, hejmara xwe ya 33an ku hejmara dawî ya wê kovarê ye, ji bo kurdên Anatolyayê veqetand. Kovar di vê hejmara xwe de bi sernavê “*Orta Anadolu Kürtleri*” ango “Kurdên Anatolyaya Navîn” derket.

Di hejmara navborîya kovara ku niha ji hêla Weqfa Îsmail Beşikci ve li Stenbolê tê derxistin de pênc nivîsên li ser kurdên Anatolyayê hatine weşandin. Du nivîskarên ji van her pênc nivîsan, Vahîd Duran û Adem Özgür nivîskarên kovara Bîrnebûnê ne. Nivîsên li ser kurdên Anatolyayê û nivîskarên wan wiha ne:

500 Yıllık Göçün Öyküsü: Orta Anadolu Kürtlerinin Dününe ve Bugününe Bakmak (Çîroka Koçberiya 500 salî: Nêrînêk li doh û îroya kurdên Anatolyaya Navîn)-Sena Kaplan

Yabancı Araştırmacıların Gözünden Anadolu Kürtleri (Bi çavên lêkolînerên biyanî kurdên Anatolyayê) – Adem Özgür

Konya Kürtlerinden İlginç Bir Sima: Canlı Hesap Makinası Hasan (Kesêkî Balkêş ji kurdên Qonyê:

Makîneya zindî ya hesabê Hasan) Sedat Ulugana

Navên Me – Vahîd Duran

Orta Anadolu Kürtlerinin Seçim Tarihi (Dîroka Hilbijartinê ya kurdên Anatolyaya Navîn) - Hacı Çevik

Kovar her çiqas wek dosye cih dabe kurdên Anatolyayê jî, mixabin cih daye kêr nivîs û mijaran. Pira-niya nivîsên heyî yên di vê dosyeyê de gelek referans li nivîsên kovara Bîrnebûnê hatine kirin û gelek dîmenên li ser kurdên Anatolyayê ji kovara Bîrnebûnê hatine girtin.

Ev yek jî nîşan dide ku Bîrnebûn di mijara kurdên Anatolyayê de bûye referansa serekî. Gelek nivîskarên Bîrnebûnê yên ku li ser kurdên Anatolyayê bi salan berhem afirandine û lêkolîn pêk anîne hebin jî, di vê dosyeya *Kürt Tarihi* de em li rastî gotarên van nivîskaran nehatin. Ji ber vê yekê ew kesên ku bixwazin bi rêya vê hejmarê zanyarî li ser kurdên Anatolyayê hîn bibin, dibe ku qîma xwe pê neynin.

Min ev rexneya xwe ji xwedî û rêvebirê berpirsiyarê karûbarên nivîsê yên kovara *Kürt Tarihi* birêz

Fuat Kumruaslan re got. Kumruaslan giringî da vê rexneya min û got ku eger nivîskar û lêkolînerên ku li ser kurdên Anatolyayê dixebitin bixwazin, em dikarin hejmareke din a kovara xwe ji kurdên Anatolyayê veqetînin. Hêvî dikim ku ew qelemên ku li ser van kurdan dinivîsin, carekê jî ji bo kovara Kürt Tarihi binivîsin û vê kêmasiya heyî ji holê rakin. Lê dîsa jî divê mirov spasiya xwe xebatkarên kovara *Kürt Tarihi* û berpirsên *Wegfa İsmail Beşikçi* bike ku bal kişandine ser kurdên Anatolyayê.

Sena Kaplan, di nivîsa xwe ya navborî de, ewil têgeha “*Kurdên Anatolyaya Navîn*” pênase kiriye û kurteya dîroka koçberiya kurdan li Anatolyayê nivîsandiye. Sena Kaplan bal kişandiye ser firezaraveyî û rewşa civakî û aborîya kurdên Anatolyayê û refleksên wan ên politîk. Kaplan, ji bo ravekirina mijara xwe sûd ji çavkaniyên wekî *Şerefname* û *Seyahatnameyê* girtiye.

Kaplan di heman demê de sûd ji defterên malîye û muhîmmeyê yên Osmanî jî girtiye. Li gor nivîsê, di deftera malîyeyê ya bi hejmara 8458an de tê gotin ku di eşîrên mîna Reşwan de rûspiyên eşîr begê eşîr hildibijêre. Her wiha di deftera muhîmmeyê ya bi hejmara 534an



de jî tê gotin ku eşîra Canbegan eşîreke qerebalix e, ji çar ketxudayan pêk tê û kontrolkirina wê eşîrê gelek zehmet e.

Kaplan ragîhandiye ku dîroka hatina kurdan li Anatolyayê gelek kevn e û bal kişandiye ser lêkolîneke Muzaffer Arıkan. Muzaffer Arıkan di lêkolîna xwe ya li ser *Deftera Tehrîr a sala 1463'an* de li navçeya Yabanabada (Kizilcahamam) Enqerê bi navê “*Kürtler*” gundek hebûye. Nivîskarê gotara navborî her wisa dibêje ku eşîra Şêxbizeynî ewil hatine û dûre jî eşîrên Reşwan û Canbegan di sedsalên 16 û 17'yan de hatine Anatolyayê. Kaplan di heman demê de bal kişandiye ser berhema gerokê frensî Georges Perrot a bi navê “*Les Kurdes de L'Haimaneh*” (Kurdên Heymanayê) ku di sala 1865'an

de hatiye çapkirin û nivîsên gerokê îngilîz Sykes. Nivîskar di dawiya gotara xwe de wiha gotiye: “Van faktoran hemû nasnameyeke xwe-ser a kurdên Anatolyaya Navîn pêk anîye ku hêjayê lêkolînê ye.”

Nivîsa duyem a li ser kurdên Anatolyayê ya Adem Özgür e ku yek ji nivîskarên nifşa duyem a kovara Bîrnebûnê ye. Nivîsa ku sernavê wê “*Yabancı Araştırmacıların Gözünden Anadolu Kürtleri*” (Bi çavê lêkolînerên biyanî kurdên Anatolyayê) ye li ser lêkolînên gerokên rojavayî ye. Özgür, di destpêka nivîsa xwe de bi kurtî behsa kurdên Anatolyayê kiriye û dûre ji bal kişandiye ser lêkolînên gerokên wekî Hermann Wenzel, Georges Perrot, Mark Sykes (1879-1919), mereşalê Almanî Helmut von Moltke, Lungberg û Svanberg ên Swêdî.

Adem Özgür qala berhema bi navê “*Forschungen in inneranatolien 2. Die Steppe als Lebensraum*” (Lêkolînên Anatolyaya Navîn 2: Step Wekî Qadeke Jiyane) ya Herman Wenzel kiriye ku tê de hatiye îdiakirin ku yên ku bizinên Enqerê xweyî dikin kurd in. Wenzel bêtir li ser kurdên Heymana, Yunak û Cihanbeylî kiriye. Bi dîtina Wenzel, tirk xweyîkirina bizinan ji kurdan hîn bûne.

Özgür, lêkolînerê frensî Georges Perrot ji wekî bavê kurdolojiya Anatolyayê bi nav kiriye. Özgür bal kişandiye ser berhema Perrot a bi navê “*Les Kurdes de L’Haimaneh*” (Kurdên Heymanayê) ku tê de Perrot behsa cihêtiya kurdan ji tirkên deverê kiriye.

Di nivîsa navborî de nivîskar behsa zanyariyên ku gerokê frensî Sykes nivîsandine kiriye. Sykes ragîhandiye ku Yavuz Sultan Selîm li Amasya, Tokat û Çorumê li dewsa elewiyên qirkirî kurdên sunî bi cih kirine û dîroka kurdan li Anatolyayê digihîje sê sed heta pênc sed sal berê.

Nivîsa sêyem a li ser kurdên Anatolyayê, nivîsa Sedat Ulugana ye ku sernavê wê *Konya Kürtlerinden İlginç Bir Sıma*: Canlı Hesap Makinası Hasan (Kesêkî Balkêş ji Kurdên Qonyê: Makîneya Zindî ya Hesabê Hasan) e. Nivîskar di vê gotara xwe de behsa Hesê Zîr ango Hasan Korkmaz (1893 – 1949) dike ku ji gundê Qemeraya (Yapalı) Cihanbeylî ye. Hesê Zîr bêtir ku kaxez û qelem bi kar bîne kariye pirsên zehmet ên matematîkî çareser bike. Rojnameya Cumhuriyetê di hejmarê xwe ya 28’ê Adara 1938’an de li ser hişmendiya matematîkî ya Hesê Zîr nûçeyêke bi navê “Makîneya

Zindî ya Hesabê” belav kiriye. Roj-nameya Akşamê jî di wê serdemê de li ser Hesê Zîr nûçeyêke bi navê “Canlı hesap makinesi bir adam” (Mirovekî ku makîneya zindî ya hesabê) belav kiriye. Ulugana bal kişandiye ser wê yekê ku Hesê Zîr mîna Zaro Axayê Bidlîsî ji ber vê jêhatîbûna xwe bajar bi bajar hatiye gerandin, li gazînoyan hatiye teşhîrkirin û biçûkkirin.

Nivîsa çarem jî ji hêla yek ji nivîskarên Bîrnebûnê Vahît Duran ve bi navê “Navên Me” hatiye nivîsandin. Vahît Duran di nivîsa xwe de ser taybetmendiyên navên kurdên li Kirşehirê zanyariyên balkêş dane. Vahît Duran di navbera taybetmendiyên sosyolojîk û sîstema navlêkirina van kurdan de têkiliyekê datîne û hin zanyariyên girîng li ser kurmancî dide

Vahît Duran dibêje ku formên navlêkirinê yên kurdî dişibin formên navlêkirinê yên civakên din ên pederşahî û gelek mînakên cihê yên navlêkirinê di nav kurdan de derdixe pêş.

Nivîsa pêncan a di vê dosyeyê de ya Hacı Çevîk e ku sernavê wê “Orta Anadolu Kürtlerinin Seçim Tarihi” (Dîroka hîlbijartinê ya kurdên Anatolyaya Navîn) ye. Hacı Çevîk herçiqas di sernavê nivîsê de behsa kurdên Anatolyaya Navîn kiribe jî

di nivîsa xwe de tenê behsa refleksên kurdên Qulekê û Cihanbeyliyê yên derheqê hîlbijartinên siyasî de kiriye. Çevîk piştî ku bu kurtî behsa hin taybetmendiyên kurdên Anatolyayê kiriye behsa salên 1980’yî dike û dibêje ku di van salan de kurdên Qulek û Cihanbeyliyê dengê xwe dane du partiyan. Di hîlbijartina sala 1987’an de kurdên vê deverê bêtir dengê xwe dane Partiya Sosyal Demokrat a Gelparêz (SHP). Piştî avabûna Partiya Keda Gel (HEP) ku wekî partiyeke kurdî dihat dîtin, kurdên vê deverê bêtir dengê xwe dane vê partiye.

Çevîk, radigihîne ku di salên 1990’î de partiyên ku ji kevneşopa HEPê tîn di hîlbijartinan de carna bûne partiya yekem, carna jî bûne partiya duyem. Di nivîsê de hatiye gotin ku piştî ku AKP hatiye damezrandin kurdên vê deverê bêtir dengê xwe daye partiyên ku ji kevneşopa HEPê tîn û AKPê. Çevîk di dawîya nivîsa xwe de behsa wê yekê dike ku di dema şer de kurdên vê deverê ji ber taybetmendiyên civakî xwe ji partiyên ku bi nasnameya kurdî siyasetê dikin dûr dixin, lêbelê dema ku şerê çekdarî li Kurdistanê kêmbû, kurdên vê deverê xwe nêzî partiyên ku bi nasnameya kurdî tevdigerin dike.

DÎROKA MALBATEKA LÎ ÇORUMÊ

Abdullah Şahin

Ez nezîkî sê sal in li ser dîroka malbata xwe, ya gundê xwe û jiber vê jî ya êla xwe, bi vê re jî dîroka kurdên sûrgûnî Çorumê bûne lekolînan dikim. Ji bo ku ez van agahdarîyên min bidestxistin bi we re parva dikim serbilind im.

Malbata min girêdayî merkeza Çorumê, li gundê Aksungur û li mehela Memişlara ye. Li dawîya lekolînê agahdarîyên min bidestxistî; newîyên Canbeg Hasan in. (Di çavkanîyan de wek *Cihanbeylioğlu Hasan* tê binav kirin) û ew di salên 1760an de jî dayîk bûyê. Di kîjan demê de

sûrgûnî Çorumê bûnî, ne eşkere ye. Lê qayîdên nûfûsê yên sala 1832an hatinî nivîsandin jî îspat dikin ku dema Mahmutê duyemin de bûye.

Malbata min bi pezê reş re mijûl bûye û ji eşîra kurd-Canbegan belavbûne. Ji mîrtîya Diyarbekirê şandine Haymanayê, ji wir jî sûrgûnî (niştecihkirin) Çorumê bûne. Lawê Canbeg Hesên, lawikê wî Mustafa, berrika ji lawikê wî Mustafa zedê bûnî û paşnava Şahin girtîne. Kalikê min dibê; em ji Dîyarbekirê hatinî. Malbat ji ocaxê Seyyîd e.

Konusu: Cihanbeyli Aşireti'ne bağlı Tatar köyünden Mustafa'nın elindeki yarasına müdahale eden Cerrah Eyce Çorbacı'nın tüm sorumluluğu kabul ettiği.

Cihânbeğli aşiretinden Tatar karyesinde sâkin Cihânbeğlioğlu Mustafa bin Mustafa nâm kimesne muvâcehesinde meclis-i şer' de cerrâhinden Eyce Çorbacı ikrâr-ı tâmm ve takrîr-i kelâm eder ki merkûm Mustafa'nın sol elinin baş parmağına karîb eli ayasında olan yarasına nazar ve hizmet etmemle eğerçi merkûmun yedinde hidmetim mukâbilinde noksan bulunur ise cezâsına râzıyım dediği işbu mahalle şerh olundu.

Ev qeyd di sala 1867 de hatiyê nivîsandin ji qeydên Şerrîyê hatiyê girtin.

Sıra No	İsim	Fizikî Özellikler	Yaş	Açıklamalar
21	Mahdûmu Seyyid Ömer		1	
22	Karındaşı Hasan	Kara bıyıklı	25	Fevt şud, fi 20 N. Sene [1]247, [22.2.1832]
23	Cinbekiroğlu Seyyid Bekir	Kara sakallı	45	
24	Mahdûmu Seyyid Hüseyin	Ter bıyık	20	
25	Mahdûmu Seyyid Ömer		4	
26	Mahdûmu Seyyid Ali			Tevellüd, [1]248, [1832] der-sene
27	Karındaşı Seyyid Mehmed	Kara sakallı	40	
28	Mahdûmu Seyyid Süleyman		7	Tuvânâ, sene [12]51, [1835]
29	Mahdûmu Seyyid Osman		2	
30	Bezek'in oğlu Seyyid Hüseyin	Aksakallı	60	
31	Karındaşı Mehmed	Kır sakallı	50	
32	Mahdûmu Seyyid Memiş		11	Tuvânâ, sene [12]48, [1832]
33	Mahdûmu Seyyid Ahmed		1	
34	Mahdûmu Seyyid Mehmed			Tevellüd, [1]248, [1832] der-sene
35	Diğer Mahdûmu Seyyid Ömer	Kara bıyıklı	35	
36	[Seyyid Ömer'in] mahdûmu Ali			Tevellüd, [1]247, [1831] der-sene
37	Karındaşı Seyyid İsmail		15	
38	Karındaşı Seyyid Hüseyin		13	
39	Seyyid Mehmed	Aksakallı	75	
40	Mahdûmu Seyyid Hasan	Kara sakallı	40	
41	[Seyyid Hasan'ın] mahdûmu İbrahim		10	Tuvânâ, sene [12]48, [1832]
42	[Seyyid Hasan'ın] mahdûmu Mustafa		5	
43	Mürtezaoğlu Hasan	Kara sakallı	50	
44	Mahdûmu Seyyid Mehmed		8	Tuvânâ, sene [12]50, [1834]
45	Mahdûmu Seyyid Ömer		7	Tuvânâ, sene [12]51, [1835]
46	Mahdûmu Seyyid Osman		5	
47	Karındaşı İnce Mehmed	Kır sakallı	60	
48	Mahdûmu Bekir		12	
49	Mahdûmu Hüseyin		10	Tuvânâ, sene [12]48, [1832]
50	Emirhüseynoğlu Mehmed Seyyid	Kara sakallı	40	Reft be-Haleb, fi 10 N. Sene [1]247, [12.2.1832], Amed, der-sene [12]48, [1832]
51	Mahdûmu Seyyid Ömer		10	Tuvânâ, sene [12]48, [1832]

Nüfus: 51

Qeyd e nifûsa gundê Aksungur 1832

36	Hızır Köyü		
37	Çırfınlı Köyü	"	34-35
38	Dutpınar Köyü	"	35
39	Sorsavuş Köyü	"	35-37
40	Aşılharmut Köyü		
41	Karaoğlu Köyü	Çorum ekrâdından Karamanlı Cemaati'nden	37
42	Karakeçili Köyü	Türkmen Dedesli Aşireti'nden	37
43	Kızılkır Köyü	"	38
44	Çeltiközü Köyü	"	38-39
45	Hasandegin Köyü	"	39-40
46	Aksoku Köyü	"	41-43
47	Tepe Köyü	"	43-44
48	Kuruçay Köyü	Ekrâd-ı Cihanbeyli Aşireti'nden	44-50
49	Şanba Köyü	"	51-52
50	Karahisar Köyü	"	52
51	Güllücek Köyü	"	52-53
52	Sarıseyh Köyü	"	53-54
53	Kınık Köyü	"	54
54	Kösürelilik Köyü	"	54-55
55	Oluközü Köyü	"	55-56
56	Aksungur Köyü	"	56-57
57	Saraylı Köyü	"	57-58
58	Gölyeri Köyü	"	58
59	Darılık Köyü	"	58
60	Oluközü Köyü	"	58
61	Aktaş Köyü	"	58
62	Kavacık Köyü	"	58
63	Demirci Köyü	"	59
64	İshaklı Köyü	Türkmen Akcecelü Aşireti'nden	59-62
65	Bey Köyü	"	62-65
66	Barak Köyü	"	65-68
67	Toyhâne Köyü	"	68-69
68	Tozluburun Köyü	Türkmen Benî Huneyn/Bedirhuneyn Arap Aşireti'nden	69

68	Mahdizade Seyyid Osman		20	
69	Hannuqqa Seyyid Mahmud	Kara sakallı	45	Tevlidi, dir. sene [1247]
70	Mahdizade Seyyid Musa	Kara boyalı	22	
71	Mahdizade Hüseyn			Tevlidi, dir. sene [1247], [1870]
72	Karadag Seyyid Həsən	Kara boyalı	30	
73	Düğü karadag Seyyid İsmail	Kara boyalı	23	Kayıt. İsm. evlidi, dir. sene [1271], [1835]

Səhifə 73


Çarın israrı ilə mülkətlərin itirilməsinə Cəldizdəki Ağsaqların

AKSİ/NAĞİR KASRİ/NAĞİR
[NAĞİR, 1914 illəri 18-19]


Sıra No	İsim	Fərdi Qeydiyyat	Yaş	Açıqlamalar
1	Sadıqqa Bekir	Kara sakallı	30	
2	Mahdizade Seyyid Mahmud		10	Tevlidi, sene [1248], [1872]
3	Düğü mahdizade Seyyid Həsən		4	Tevlidi, sene [1250], [1874]
4	[Mahdizade] Karadag Seyyid Osman		3	
5	Karadag Həsən	Kara sakallı	35	Müddət, sene [1252], [1876]
6	Sadıqqa Fərid	Kara sakallı	45	
7	Mahdizade Seyyid Mustafa		32	
8	Mahdizade Seyyid Mahmud		10	Tevlidi, sene [1248], [1872]
9	Mahdizade Seyyid Hüseyn		3	
10	Mahdizade Seyyid Bekir		1	
11	Osman'ın oğlu Seyyid Bekir	Kara boyalı	25	
12	Karadag Seyyid Mahmud		12	Kayıt. İsm. evlidi, dir. sene [1271], [1835]
13	Karadag Seyyid Həsən		6	Tevlidi, sene [1250], [1874]
14	Fəridə Mustafa	Kara sakallı	35	Kayıt. İsm. evlidi, 6 illik 76 sene [1247], [1871], [1872]
15	Karadag Mahmud	Kara sakallı	30	
16	[Mahdizade] mahdizade Osman		4	
17	Düğü Mahmud'un oğlu Cəfər	Kara sakallı	45	Fevr. 8 sene [1258], [1834]
18	Mahdizade Osman		3 illik	Fevr. 8 sene [1258], [1834]
19	Mahdizade Osman		40	
20	Yarıqqa Seyyid Osman	Kara sakallı	7	Tevlidi, sene [1270], [1834]
21	Mahdizade Seyyid İsmail			

[33]

Qeyd e nifusa gundə Aksungur 1832



Du mezinên Malbatê





Piranîya gundên kurdên Anatoliya Navîn ên Qonya û Anqerê li dor alî, an jî nêzî gola xwê ne. Ji bo wê bazîrganîya (ticareta) wan xwê û yek jî ticareta pêz bi sed salan ber vê dest pê kirîyê. Wan ji bo debara xwe bikin, her kesî hêştirên xwe bar dikirine û piştî hevdu ji bo barê hêştirekî bi rojan û bi mehan bi rê diçûne. Ew çûyîn bê ziman, bê raketin, caran pir bê xwarin û vexwarin, bi telaş û bi tirs dibû. Xecê Hec Ehmet heştê û pênc salî ji gundê Bêşkardeşê dibêje;

“Li gundê me, hema, hema her malekê hêştiren xwe hebûn. Wan xwê, gil, mûj û hwd. bar dikirin û heta Enqerê, Stenbolê û Kîprosê (Kıbrısê) diçûn. Çûyîna Kîprosê çar-pênc mehan diajot. An jî li îdên qurbanê ji bo firotina pêz,

kerî dikirin rê sî-çel roj bi 4-5 şivana peya, xwedanê keriye jî li ser hespê dida dû wan û diçûn. Hin kesan dibirin Enqerê, hin kesan jî Stenbolê. Ew çûyîn pir bi zehmet û xeter dibûn. Bavê min digot; *”Ji bo em zimên nizanin em perîşan dibin, her derê em terin ji me pir pera dixwazin. Em nikarin parastina xwe bikin û mecbûr didin.”*

Ew çûyîn ji bo me jî pir bi zehmet dibûn. Her carekê em û dayika min em pir ditirsiyan ku bavê me çibû? Miriye yan jî dijiye. Ew wexta vegeiriyên li mala me û li gundê me şenahî dibû. Wî ji me re tiştên xwarinê û kinc û kol dianîn. Em pir şa dibûn û ew tirs giştik jibîr dibûn. Wextê çunê dîsa dihat, telaşa di rojan hilnehatinî bi şevan em nedikirin xewê. Me bav

û gundiye xwe bi tirs û dîsa jî bi hêviya vegeirîna bi rê dikirin. Ew çûn û hatin çend salan dewam kir. Heta Em mezin bûn.”

Piştî çend salan dema teknoloji pêş ve çû, wek her mirovekî jiyana Kurdên Anatoliya Navîn jî hat guhertin. Sala 1950ê şûn ve êdî giran giran sitendina qamyonan dest pê kir. Dû ve sala 1960an şûn ve dema Elmanyayê deriyê xwe jî karkeran re vekir, Kurdên Anatoliya Navîn jî yek bi yek dest bi çûyîna Elmanyayê kirin. Ew hêdî hêdî dibûn Almancî. Sala 1970yî şûn ve qamyonên „Man“ ketin jiyana wan. Ew jiyana bû zengînî, zengîniyeke wisa, ku ji feqîran re jî xwedê bêtir tiştêk nehêle. Ew jiyana bû xwebawerî, te karî qamyonê sor ajot, êdî tu dikarî li dinyayê her tiştêkî bikî. Ew jiyana bû azadî, azadiyeke bê sînor bi diyar bi diyar, ew diyar bûn ji demê wir de, êdî ne şevên te dibûn şev, ne jî rojên te dibûn roj. Ew jiyana ew kirin heval, hevaleyê wisa, ku xwarin, vexwarin, xew, ecemîtî, xerîbbûn, parastin her tiştêkî di nav de. Hevaltiyeke wisa, ku parçê qamyonê sor ê jî bo te pir bi qîmet jî bi te parvekirin dide. Hevaltiyeke wisa, ku te dike qalibekî, qelafetê te wek hevdu dike.

Ez li îzînekê(betlane) li Enqerê çû bûm ser doktorekî, sekreterê

got; “Hûn rûnin, doktor li derve ye, ewê demekê şûn de were.” Navberê çend deqîqe ketin merik hat û derbasî odê bû. Sekreterê got; “Doktor hat.” Min got; “Doktor ev e?” Got; “Erê.” Min got; “Doktor wek şofêrê qamyonê ji aliyê me ye” Sekreterê got; “Hûn ji ku derê ne?” Min got; “Ş. Qoser” kenîya û got; “Ew jî ji Ş.Qoserê û derî vekir” got; “Doktor beg, hemşehriya te hat” û çû. “Doktor got; “Kerem ke.” Ez rûniştim û sihbete me dest pê kir. Got;”Tu ji ku gundî yî?” Min navê gund got. Got; ”Ez ji gundê we pir kesan nas dikim.”Min got; “Ji lîseyê Qoserê de nas dikî?” Got; “Hin kesan ji lîse de, hin kesan ji wexte ez xwendakar bûm li betleyan ez bi qamyonê kekê xwe re wek arîkar diçûm, ji vir da nas dikim.” Ez kenîyam min got; Min hûn dîtî, min zanî û bi sekreterê we re got; doktor wek şofêrê Qoser e.” Bi heyretî got; “Te çawa zanî ?” Min got; “Ji qelafetê we, şeş sal xwendin jî, dîplome jî li vala bûn”Kenîya û got; ”Welle vala bûn”

Ew jiyana dibe hewes, hewesên qamyonê sor.Te dike nav xewn û xeyalên mezin. Tu jî dixwazî qamyonê sor biajoyî, tu jî dixwazî bila qamyonê te ya sor hebe. Ew xeyal te dîkin berger, li ber

xwedanên qamyonan gerîn didin, kuje. Ew xeyal dibe stran. Carinan
ku te bikin arîkarên xwe. Dema stranake xweş, carinan jî strana-
qebûl kirin dinya dibe dinya te. ke bi xemgînî. Û bi Kurd Remzî
Eger qebûl nebû te giran, giran di- strandin dide. Dibêje;

Bê min got yandim, yandim, yandim qamyoni sor ê,
Yandim, yandim lê man i sor ê,
yandim, yandim, qamyoni sor ê,
Yandim, yandim lê man i sor ê,
Were kederê min bavê der ê,
Kendirê bîne min bavê dar ê,
De wer wer qamyonê sor ê,
Yandim, yandim, lê man ê sor ê

Bê min got wê qamyonê wîye, wîye,
Qamyonê Îzetê min wîye, wîye,
Qurban ser kal a, pîr a bar kiriye,
Li kal a, pîr a bar kiriye,
Bê min got kê ecebên giran dîyê,
Şofêr patronê xwe kuştîyê,
Yandim, yandim qamyoni sor ê,
De wer wer lê man i sor ê,
Yandim, yandim qamyoni sor ê,
De wer wer mekîna sor ê,

Bê lê lê lê min got bûkê bûkê seri bi şar ê
Bûkê, bûkê guh bi gar ê,
Bûkê bûkê ser bi şar ê
Bûkê, bûkê guh bi gar ê,
Te yê li min sebir ke, heyanî bihar ê,
Te sebir ke hetanî bihar ê,
Ezê biharê te re bînim mal qamyonê,
Te re bînim lê mal qaymonê,
Wexte min anî mal qamyonê,

Were kederê min bavê derê,
 De wer wer qamyoni sor ê,
 De wer wer lê man i sor ê,
 Bê min got qamyona Îzetê min î ford e,
 Qamyone delalê min î ford e
 Qamyona Îzetê min î ford e,
 Qamyone delalê min î ford e,
 Qurban kal a, pîr a xwe da jor te,
 Kal a, pîr a xwe da jor te,
 Dey dike dey kî çar salê nebû
 Bavê erdê tu xort e,

De wer wer qamyona sor ê,
 Yandim, yandim lê man i sor ê,
 Yandim, yandim qamyona sor ê
 Yandim, yandim lê man i sor ê
 Bê min got qamyon a yavrî min rê de te re,
 Qamyon a Îzet ê min rê de te re,
 Qurban pêş vîtês e çing difire,
 Li ber fîtês ê çing difire,
 Bê Îzet ê ser ê xwe dîne,

Hûrkê te li kapî xelkê didire,
 Yandim, yandim qamyon a sor ê,
 De wer wer lê man i sor ê
 Yandim, yandim qamyon a sor ê,
 De wer wer lê man i sor ê

Dû ve xeyalen te mezin dibin, tu te, naskirina kurdûna te. Ew jîyan
 dixwazî êdî bila qamyone ke te jî êdî te dike kesekî din. Apê Hec Os-
 hebe. Dema qamyoneke te jî bû, tu man dibêje; “Wexta em nû diçûn
 dibî xwedanî hemû dinyayê. Kesek bajarên jêrî me tiştê nedizanî.
 nikare êdî te bigire. Welat çawa ye, Kurdên me çawa

Ew jîyan dibe naskirina welatê ne, dinên din çine neçine. Carekê

em li deriyê sînorê Xabûrê çend qamyonên gundê me di rêzê de bûn, çend kes hatin ketin şûna me. Me got ;”Çima, ew dora me ye”, Gotin; “Na dora me ye”. Wan got, me got, munaqeshê dest pê kir çend kes hatin ketin navbera me û qewxe vekatandin. Ji hevalê me yekî got; lanet li te şeytan î”. Her careke wî wer digot, grûba din dihatin li me xin(bi din). Kesên ketine navberê nedihîştin. Paşê ew çûn, me got, “Çima ewqasî li me hêrs ketin me fêhm nekir.” Gotin, “We got “şeytan” ji bo wê li we hêrs ketin. Ew Êzîdî ne.” Me got; “Ew çiyê?” û ji me re neql kirin . Em mat man. Me bi çûn û hatina bajarên din dibihîst, ku di nav Kurdistan de êzîdî hene, şaftî hene, alewî hene. Car caran heta salên nodî bi Kurdên me din ve problemên me dibûn. Wan plaka Enqerê û em bi tenê didîn pîrsgirêk derdixistin. Bawerî nedikirin, ku em jî Kurd in. Ji bo wê em çand erebe bi hevdu re diçûn û dihatin. Salên nodî şûva hat guhartin. Me hevdu qebûl kir û em êdî xwedî li hevdu derdiketin. Hevaltiya me mezin bû.

Ew jîyan dibe hesret, hesreta hatinên lipaşhistî. Dibe hesretên seranserîya imrekî û pişt re dibe jîyanên her dem aliyekî wan kêr. Sal ketin navberê ew çûn û hatin ji

bo wan êdî dibûn eziyet. Qamyon pîr bibûn û kar hindik dibûn. Ew mecbûr ji bo qezenca xwe rêya xwe dirêj dikirin. Car caran heta Îran, Iraq û hwd. diçûn, ku debara xwe bikin. Rêya wan dirêj dibû, pîrsgirêk pîr dibûn û hesret jî dirêj dibû. Êdî qezakirin jî pîr dibûn. Wan car caran hevalên xwe wînda dikirin, ew hesret dibûn hesretên seranserîya imrekî. Û her carekê ji wî karî sar dibûn. Zarok mezin dibûn, bazara mêrik gotî(Wekî wî got);”Meresê kurikê te kengê di ningê te de bûn, sikinti (e-ziyet) hingê dest pê dikin.” Pîrsgirêk jî mezin dibûn. Wan dixwestin, ku bila zarokên xwe bixwînin, wek wan nebin şofêr, ji bo vê zarokên xwe dibirin bajaran xwendin didan. Ji bo ew bixwînin her fersend pêşkêşî wan dikirin. Kesên kal dibûn dîsa jî şofêrî dikirin. Mata Şîrîn Kilinçalpê di kilamê de gotîyê; “Min got heqsiz me derê, kek ê te heftê salî hinî şofêr e, keçikên birayê min xwendine li ber e.”

Zarokên hin kesan xwendin, ên hin kesan jî bûn şofêr wekê bavên xwe...

Ez dixwazim nivîsa xwe bi gotineke li paş qamyonan xelas bikim.

*“Te got em herin mirinê,
ma me got mazot tine.”*

03/07/2018

BÛKA SPÎ

Mûlla Evîndar

Malan bar kirin ji zozanê.

Yek bi yek gişk çûn gund. Tenê Ehmed ma. Ew 16 salî ye. Bavê Ehmed pê re gotibû îro dereng e, îşev li zozanê li ser pez be, li berbangê zû pez heyne were gund.

Şev bi ser deşta zozanê da hat, her der tarî bû, ne şewqek, ne deng, ne jî kesek.

Pez li dor gomê mexel bûbû, Ehmed kulavê xwe amade kir û li xêni li ber pencere rexist. Ji ber ku heyam germ bû wî xwe li ser kulêv dirêj kir, xew, dom di çavên wî da bû, çavên xwe girtin.

Dema ku wî çavên xwe girtin dengê kete guhê wî, ew denga li derva, li ber pencere bû.

Tirs, xof li wî peyda bû.

Mezinên wî digotin li vê zozanê wek pêşi bûkek heye, bi navê „Bûka Spî“.

Wexta ku van gotinan hatin bîra Ehmed, ew denga gav bi gav nêzîke Ehmed dibû.

Tirs û xofa wî her ku diçe pir dibû.

Dengê lingan dihat, ji pence-



re berve derî. Giran giran û berve derî. Deng pir nêzîk bû.

Porê Ehmed kire qirçe-qirç, deriyê xêni giran giran vedibû. Derî vebû, dema ku derî vebû di şeva reş û tarî da jinek kete hundir, bi tevahî spî bû, meres, kinc, pêçek, her tiştê wê spî bû, porê wê jî ewqas reş bû. Porê wê xuya dikir, ruyê wê xuya nedikir, dev, pozê wê bi kinca xwe ya spî girtî bûn, çavên wê xuya dikirin, çavreş bû. Wê her ku li derekê mes dikir, ji her du çavan du stêrkên spî di nav şevê da difirîn, dibiriqîn, berba dibûn, di nav şevê de dihelîn û wenda dibûn. Ji ber ku şev reş, tarî bû Bûka Spî di nav şevê da dibiriqî.

Bûka Spî, qet deng nedikir. Ehmed dixwest dengke, bi qîrîn bang bike lê deng ji Ehmed dervediket, zimanê wî çû.

Bûka Spî, li bacaya xêni agirek dada, ar vexist, ji tûrikê Ehmed çay, av derxist kire çaydank. Av ke-liya, çay berda ser, çayê dem girt. Ehmed rabû, ji tûrikê xwe qedehê derxist, çay berda qedêh. Ew çî çayê weng bû! Çay bi tevahî spî bû!

Bayê berbangê derî vekir, şewqa

rojê dikete hundir, şeva tarî îdî tunebû, Bûka Spî tunebû, çaya spî tunebû. Ehmed ji ser kulavê xwe rabû. Lêvên wî reviyabûn, pertilî bûn. Destê xwe avête pozê xwe, dît ku poz xwîn bûye û xwîn têda hişk bûye.

Ehmed derket hêla gomê. Pezê wî, kûçikê wî, kerê wî gişk li benda wî amede bûn.

Li kerê xwe nîşt berê xwe da gund û riya gund girt.

Ferhengok:

„Pêz heyne were“: Pêz hilbigire, were

Heyam: Rewşa Hewayê

Dom: Xewa kûr ku bi ser çavan da tê

Pêşi: Tişteki nenas û bi xof (Xeyalet).

Qirçe qirç: Dema ku yek ditirse tê gotin, mîna ku por deng derxe.

Berve: Ber bi

Meres: Sol

Pêçek: Lepik, Destane

Mês kirin: Mêze kirin

Deng kirin: Axaftin, Peyivîn

Weng: Weha, wusa

Lêv revandin: Ji ber tirsê lêv mîna ku ji avê diperçifin

„Pertilî“: Peritî

„Li kerê xwe nîşt“: Li kerê xwe siwar bû.

EZ Ê BIÇIM

kezeba bîranînên werimî
hesretên bêxwedî
daxwazên berbabûyî
xeyalên porspîkirî
û xatirxwestinên xwînvereşîn
ez ê ji we re bihêlim û biçim
şewqa çirayek xemgîn
demsalên bi kul û keder
stêrkên xeyîdî
tîrêjên çavşil
û asîmaneke sîngqelişî
ez ê ji we re bihêlim û biçim
qêrîna êşên bêdeng
sebira salên perîşan
stûna hêviyên rût
kilamên axînkêş
û helbestên ji tîna qewirî
ez ê ji we re bihêlim û biçim
eşqa evîndarên dîlnazik
feryad û fixana bilbilê fîrar kirî
ken û giriyên ji bîr bûyî
henasa hestên perpitî
û şîrheramên bi xemgîniya min
şadbûyîn
ez ê ji we re bihêlim û biçim
îskeîska bêxewiya şevên xerîb
bêrîkirinên fetiş
qedera reşgîrêdayî
tîrs û kelecana dilê jar
û teşqeleyên xêrnexwazan
ez ê ji we re bihêlim û biçim
sergêjiya şan û şuhretê
zewq û sefaya qesr û qonaxan

pesna zîv û zêrên nixumandî
û text û tacan
ez ê ji we re bihêlim û biçim
barê gunehên roja mehşerê
deynê şert û şûrtên îmanê
agirê dojah û hûriyên bihuştê
afirînerê gerdûna efsûnî
sonda bi navê Yezdanan
û hemû ol û perestgehan
ez ê ji we re bihêlim û biçim
bextewariya li ber jana bayê reş ketî
hovitiya zexelên dirantûj
serxweşiya meyxaaneyan
endişeyên giyana xêşim
jiyana li nav tozê tarûmar bûyî
gemara rûyê nemerdan
xweliya cendekê şewitî
û hêrsa mal û milkê dinyayê
ez ê ji we re bihêlim û biçim
ciwaniya zû kalbûyî
êşkenceya zaliman
berbangên piştûx
bedenên li ber diwaran qefilî
tenêtiya di paşila mirinê de raketî
cehaleta mêjiyên kor
şadiya noqî deryaya xeman bûyî
rûpelên çaxên genî
sira xaçepirseke nependî
û bersiva pîrsên avis
ez ê ji we re bihêlim û biçim

Xizan Şîlan

2018– 03– 15, Stockholm

HANYA QONYA

Yıldız Karagöz

Îro dîsa bîranînan ez birim ew rojên min yên zaroktîyê. Di dezgehên perwerdeyê yên çanda ji bo min xerîb, ew salên ku min daxwaz dikir ku tiştên li dor min dibûn, fêhm bikim û tebigêjim...

Min dîya xwe di rastîya xwe de heta mofikên xwe hîs dikir; lê bi zimanê wê baş tê negihîştibûm, ketibûm nav perwerdebûna zimanekî din, ev rojên ku ez tê de difetisîm. Di alfabêya pêşin de; *“Tirk! Xwe bipesîne, kar bike, bi xwe bawer be! Tirk, pir mezin e!”* an jî *“Çi bextewarî ye ku kesên dibêjin ez tirk im.”* *“Tirk im, rastgo me, jêhatî me”* an jî *“Tirkek bedelê dinyayê ye!”*

Lê belê dema ku ez li gundê xwe di nav gulebûkên tevî kelên gênim bûyîn da dibeziyam, min guh dida ser dengê bilûrên şivanên ku ji zozanan dihatin. Gava ku ez hemberî bê dibezîm lihevanînokên (qinik) min digotin bi zimanê dîya min bûn. Ew çolên bêserî û bêbanî de em tenê hebûn. Wekî din kesek tûne bû qey.

Dema ku me barkir Qonyayê, dûre me dît *Hanya û Qonye* çî ye!

Her tişt pir bîyanî bû. Bi rastî em xûdanê tiştikî jî nebûn. Her çiqes em xwînşirîn dîtîn û ji me hezdikirin jî ji bo kurdubûna me carcaran dilê xwe bi me dişewitîn, carcaran jî em biçûk didîtîn û rû me didan ku çawa em ê li Qonyayê bijîn.

Hingî ew qas, çawa meriv dikane serê xwe bişo, ew jî heta bi teferûat eşkerê dikirin, min digot; “na valleh em ji we baştir serîyê xwe dişon, çûnkî hûn ji laşê xwe dest bi şûştinê dikin, em ji seri de dest bi şûştinê dikin.”

Dîya min firaqên xwe yên baqirî hemû firotin û di şûnê wan de yên alîminyûm û plastîk kiribûn. Hema jî şûna gorên bi herîyê hatibûn rîsandin gorên hazir yên naylonî girtibûn. Dîsa jî min guh dida ser Eyşe Şanê, Kurd Remzî, ew çîrokên pirîka min ê orijînal, bîranînên wê, evînen wê. Bi hekatên apê xwe yên ku hêz didan min, mezin bûm.

Li dibistanê ji dîlanên me re digotin; folklorî tirkî. Gava kila-mên me bi tirkî dihatin gotinê ez tehlihev dibûm. Bi coşeka mezin

digotin; “*hey lorî, lorî*” û ez diketim dîlanê. Min panîyên xwe bi hêzeka mezin di sinifa xwe de, li erdê bêtonî dixist. Çîrokên pîrika min liber çavên min diçûn dihatin. Hişê min diçûn ser pîrika min, dema ji bo karên cîranan bi rêya palkirinê/alîkariya hev dikirinê, dura li dîlanê disekinîne, wê çawa destê dilgirtiyê/evîndarê xwe girtiyê û ketiyê govendê, min jî weng govend dikişand. Min govend di dilê xwe de hîsdikir. Çûnkî ez dilân bûm, dîlan jî ez. Mamosteyên me, ji bo hînkirina rihê tirkbûyînkirinê şanaz bûn; ez jî di dîrsa folklorê de, di govendê de dibûm kurmançekê, dibûm kurd.

Min xwe ji ew çand, jîyan û mejûyê ez dorpêç kirime û hişkbûyî bi bîhna di mejû û hundirê xwe de zindî dikir. Hîngê, min Şêx Said, Seyîd Riza, Zîlan û Dersîm hîn nedizani. Dîsa jî min kokê xwe bi kokê xwe yê esil-rast girêdida û ez pê mezin dibûm.

Bihar bû, di baxçeyên dibistanê de gede/kurik dilîstin. Ez, xwûşk û birayên min, em her tim ji xwe hay bûn. Em di jîyana xwe de qet ji wê hayjixwebûna xwe xelas nebûn! Gava ku em dilîstin jî, me gavên xwe hesap dikirin û giran giran

davêtên. Em di nav diltirsîyekê de bûn ku me nedikarî bû terîf bikira. Çimkî em ne di baxçeyê xwe de, wek ku em di baxçayê dêmarîyê xwe de dilîstin. Ji bona ku loma li me nekin û me biçûk nebînîn me xwe ji şaşitiya dûr digirt.

Rojekê, gedekî gava ku dibezî li birayê min î biçûk ket û ew li erdê xist. Gava ku min birayê xwe bi dilşevitîyekê ji erdê rakir, wî bi tirkî ji min re “*min biborînîn*” got. Ca-ra yêkemîn bû ku min ew kelîme bihîstî bû. Min texmîn kiribû ku ew geda li me ra şorên xeraw dike û ez pir hêrs ketim. Min ji vî ra got, “*tu qet fedî nakî, cê tu li me ra şoran dikî.*” Gede hîn zêde lêborîna xwe daxwaz dikir, ez jî hîn zêde bi hêrs diketim. Hîn min ji dayika xwe lêborîn bi kurmançî nebhîstîbû, çava min dikanî bi tirkî zanîbim ku...

Ya bêtir, zimanê min bi kêmasîyan fahmdikir, ancax li dawîya salê têgêhestim ku ji bo zimanê xwe yê zikmakî ne, lê ji bo zimanê kêmdizani fedî dikir. Çimkî em mecbûr bûn zimanê tirkî hîn bibin. Gava ku ez evarê vedigerîm mal, çiqes rihet û kêfxaş bûm. Lê, gava ku me li derva kurmançî dengdikir, çima me jiber xwe fedî dikir,

min qet fahm nedikir. Her ku sal derbas dibûn, bi têgihêştina min pirsên min jî kûr û mezin dibûn. Lê di serê min de hertim ev pirsên bêbersîv jî zêde dibûn.

Rojekê, kurd kî ne? Çi ne? Ji boyî ku bersîva wan pirsan bibinîm, min di nav ferhenga tirkî de lêgerînek kir. Li dawîyê, tê zanîn; çîroka *kart-kurt* bû...

Ez li Swîsrê koçber im. Roja ku ez hatim vî welatî karbidestên Swîsrê li min pirsîn, gotin; “tu çend zimana dizanî?” min gotibû, “ez bi tirkî, kurdî û biçek jî îngilîzî dizanim.” Gava ku pirsîn û gotin, “*Tu bi van hemû zimanan dikarî him binivîsînî û him bixwînî?*” min got; “Ez zimanê dayîka xwe paşê hîn bûm. Bona vê, tenê ez dika-

rim biaxifim.” Gava ku min dît di kaxizên/qayîtên resmî de “kurdî bi devkî dizane” hatiyê nivisandin, jiber şaşbûnê hêstirîkên min hatin xwarê. Di jîyana min de cara yeke-mîn bû ku zimanê min ê zikmakî hatibû qedirbilindkirin. Him jî di welatê ku ez tê de koçber bûm.

Gava ku li welatê min gotinên; “*Kurdî zimanêkî xof e, nikare bi-be zimanekî perwerdeyê.*” hebin û li ser gelê min dujmînî bê kirin û li vî welatî jî hurmeta ziman û çanda min, bêtir min birîndar dike.

15.06.2016 Biel/Bienne

Ev nivîs ji aliyê nivîskara me xanim Yildiz Karagöz û editorê me Muzaffer Özgür va jî tirkî hatiyê wergerandin. Birêz Karagöz liber xwe didê ku kurdî binivîsîne.

Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da

- 6 - 7 -



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: **Kurd û Îslama Siyasî**

Destpêka serpêhatiya

Bermekiyên

Nîşanên serpêhatiyê:

Xelîfe Harûn El Reşîd bi xuyakirina dostaniyê ji Bermekiyên ra û ji nişka va îxanetî bi wan ra, bêyî ku wan lome bike, hesab ji wan bixwaze û wan sûcdar bike, li ser şopa bapîrê xwe El Mensor çû û berdewam kir. Lê dîsa jî, li gor hin agahdariyan tê gotin ku nikarîbû xwe herdem ragire û gava Bermekî ne amade bûn hin nîşan jê derdiketin ku ew dixwaze bobelatekê bîne serê wan. Lê belê, ew kesên ku ev nîşan û îşaret didîtin, Bermekî agahdar nedikirin, ji tîrsa ku xelîfe tiştekî bîne serê wan.

Nîşana yekem: Harûn El Reşîd ji Yehya Bermekî ra rewa kiribû ku bê destûr derbas ba wî bibe. Pijîşkê (doktor) wî yê taybet, Suryanî bû, navê wî Cebrayîl Bin Bextîşû' ye, ew dibêje: "Ez li meclîsa El Reşîd

rûniştî bûm gava Yehya kurê Xalid hat. Ew herdem bê destûr derbas dibû. Dema gihîşt nêziya El Reşîd û silav lêkir, silava wî bi xemsarî vegehand. Hîngê Yehya fêhmkir ku rewşa wan hatiye guhartin. Paşê El Reşîd ji min ra got: "Ya Cebrayîl! Gelo kes derbas mala te dibe, bêyî destûra te? Min got: Na. Rabû got: Ev çi rewşa me ye ku bê destûr derbasî ba me dibin". Hîngê Yehya rabû û got: "Ey Mîrê Bawermendan, ... bi navê Xweda, min dest bi ti karî nekir bêyî ku Mîrê Bawermendan ew kar bi şahnazî nespirtibe min û li gor daxwaza wî, ez derbas dibûn heya ku di nava nivînan da bû jî. Lê min nizanî ku Mîrê Bawermendan niha pê ne xweşe tiştê ku berê pê xweş bû. Heger min bizaniya, ezê di rêza duwem da di nav destûrxwazan da rawestiyama û di rêza sêhem da heger serwerê min ew ferman bida min". Cebrayîl

dibêje: Hîngê Harûn El Reşîd ji xwe şerm kir û çavên wî li erdê temaşê dikirin û got: Min nedixwast ew tiştê tu jê heznakî bigota, lê bes xelk wisa dibêjin. Wisa Yehya derket û çû" .

Nîşana duwem: Wisa bûbû fêrew û adet, dema Yehya Bermekî digihîşt derwazeyê qesra xelîfeyê, pêwan û nighedaran bi rêz û hurmet li ber wî radiwestiyan. Rojekê ji rojan, serekê nighedaran yê bi navê Mesrûr ferman da ku nighedar li ber Yehya ranewestin. Helbet nighedaran wisa kir. Gava Yehya gihîşte wir, ti rêz û hurmet şanî wî nedan. Bê guman, Mesrûr fermanên xwe ji xelîfe werdigirtin .

Nîşana sêhem: Ismaîl Bin Yehya El Haşimî dibêje: "Rojekê ji rojan ez bi Harûn El Reşîd ra siwar bûm û em çûn raw û nêçîrê. Gava em bi rê da bûn, me dît ji dûr da karwanek ber bi me va tê. Harûn ji min ra got:

– Ya Îsmaîl! Ev karwan yê kê ye?

– Min jêra got: Ev karwanê birayê te Ce'hfer kurê Yehya ye.

El Reşîd rast û çep li karwanê xwe û kesên ku li gel wî bûn temaşê kir û dît ku تنها komeka biçûke. Di pey ra li karwanê Ce'hfer temaşê kir, lê karwanê Ce'fer nedît.

Rabû got: Ey Îsmaîl! Kanî Ce'hfer û karwanê wî?

Min jêra got: Seydayê min! Xuyaye ku birayê te di rêyeka din ra çû û cihê te nizaniye.

Wî got: Xuyaye em hêja nedîtin ku me bi karwanê xwe û leşkerê xwe bixemilîne.

Min got: Bibore Mîrê Bawermendan! Heger bi cihê te bizaniya, di ber te ra derbas nedibû û ewê bi her awayî bihata ber destê te.

Di pey ra em çûn heya ku em gihîştin gundekî têr û tijî, xwedî keriyên bez û sewalan û avahiyên xweşik. Rê hinekê li dor gund digeriya; em çûn heya em gihîştin deriyê gund. El Reşîd li beyderên gundiyan, li pîrbûna berhemên wan, li sewalan û dewlemendiya wan temaşê kir, li min vegeerî û got:
– Ey Îsmaîl! Ev gund yê kê ye?
– Min got: Yê birayê te Ce'hfer kurê Yehya ye.

Ew bédeng ma û bihneka kûr kişand. Di pey ra em çûn û em her carê di gundekî ra derbas dibûn ji yê berî wî baştir û hêjatir. Her carê jî ji min dipirsiya ev gund yê kê ye, min digot: Yê Ce'hfer kurê Yehya ye. Û em çûn heya ku em vegeerîyan bajêr. Gava min xwast xatir jê bixwazim û herim mala xwe, li yên

dora xwe temaşe kir û wan fêhmkir ku divêt belav bibin. Hîngê em herdu bi tenha serê xwe man û ji min ra got:

– Ey Îsmâil!

– Min got: Li ber destê te me, Mîrê Bawermendan!

– Got: Li Bermekiyan binêre! Me ew dewlemed kirin, me kurên xwe xizan kirin û bala xwe neda wan.

– Dîsa got: Min li wan nihêrî û evên din ji bîrkin. Li ser ti rêyan, li nêziya vî bajarî, ez gundekî wek gundên Bermekiyan ji wan ra nabînim. Ma gelo hebûnên wan li ser rêyên din û li welatên din çawane?

Min jêra got: Mîrê Bawermendan! Bermekî kole û xizmetkarên te ne. Ew hemû gund û samanên wan û hebûna wan ji te ra ye.

Bi nêrîna serdarekî mezin û serhişk li min temaşe kir û got:

– Bermekî ku kolayên Malbata Haşimî ne, di ser me ra gav kirine. Ew dewlemendin û ti xêr û bêra Malbata Ebbasî nîne, ji bilî ku Bermekî xêra xwe li wan dikan.

– Min got: Mîrê Bawermendan! Tu ji her kesî bêhtir bi rewşa xizmetkar û bindestên xwe dizanî.

– Wî got: Ey Îsmâil! Bi xweda!

Tu dizanî ku min ev peyv gotin, wek ku ez dibînim tu dixwazî van peyvên min bigihînî wan û cihê xwe li ba wan xweş bikî. Ez fermanê didim te ku tu vê mijarê li ba xwe bihêlî, dernexî û bila kesek ji bilî te pê nizanibe.

– Min got: Ey Mîrê Bawermendan! Ez bi Xweda sûnd dixwim ku ez bi ti awayî vê sira te dernaxim".

Nîşana çarem: Îsmâil Bin Yehya El Haşimî nivîsandiye: "Sibeha roja din, di dema beyanê da, ez çûm li ber destê wî rûniştim. Ew li cihekî bû ku çemê Dijle ji rojhilatê Deryê Aştiyê (Bexdad) jêva xuyadikir. Li aliyê rojava jî mala Ce'hfer dihate dîtîn ku çawa pir kes ji rêber, mîr û karkeran her roj diçin qesra wî. Li min zivîrî û got:

– Ey Îsmâil! Wek me duhî jî dît, îro jî binêre ku çi qas leşker, kole û karwan ji her rengekî diçin qesra Ce'hfer. Û li ber deriyê min kesek nîne!

– Min got: Mîrê Bawermendan! Min ji te ra got ku tu bala xwe nedî van tiştan. Ce'hfer bi xwe kolayê te ye, xizmetkarê te ye, wezîrê te ye û xwediyê leşkerên te ye. Heger leşker ne li ber deriyê wî be, divêt li ber deriyê kê be? Deriyê wî yek ji deriyên te ye.

– Got: Ey Îsmâîl! Li sewalên wan binêre! Tu nabînî ku paşîya wan ber bi qesra min da ye, bi aliyê me da ters û rêx dikin û em lê temaşê dikin?. Bi Xweda, ev heqaret bi xwe ye!. Bi Xweda ez li ser vê nema tebat û sebir dikim.

Di pey ra pir enirî û tijî hêrs bû. Min dengê xwe nekir.

Îsmâîl Bin Yehya El Haşimî têgihîşt ku xelîfe ant û neyt kiriye Bermekiyan ji holê rabike, lê belê hên newêre wan bi vê yekê agahdar bike. Û bi ser va dibêje: "Min destûra çûyînê jê xwast û vege-riyam mala xwe. Bi rê da Ce'hfer pêrgî min hat û dixwast ku biçe ba El Reşîd. Min xwe da aliyekî heya ku ji min derbas bû. Çû ba El Reşîd, silav lê kir, li aliyê xwe yî rast cih dayê, rêz û hurmeteka pir şanî wî da, di rûyê wî da kenîya û dora saetekê pêra axivî. El Reşîd xizmetkarekî xwe yê her payebilind, rû û sîmayê wî xweşik, pir bi perwa û tore, mirovekî nivîskar û mîhasib û pir aqilmend da Ce'hfer. Ce'hfer bi vê yekê şabû û dilê xwe tijî bû. Lê belê ev kes sîxurek bû li ser wî, da ku her nûçeyeka wî bigihîne El Reşîd; her bihneka wî saet bi saet û dem bi dem binivîsîne".

Îsmâîl Bin Yehya El Haşimî nivîsandiye ku rojekê çûye ba Ce'hfer. Gava meclîsa wî vala bûye û tenha ew û xizmetkarê sîxur mane, pend li Ce'hfer kiriye û gotiye ku ew gundên xwe bide zarokên xelîfe. Ce'hfer tore bûye û gotiye: "Bi navê Xweda! Pismamê te! Ew nanê ku dixwe her di saya me da ye û ev dewlet bi me pêkhat. Ma gelo ne bese ku min hiştiye ew xema tiştêkî nexwe û ez her tişt û daxwazên wî, daxwazên zarokên wî, xizmetkar û gelê wî bi cih tînim. Min gencîneyên samanên wî tijî dirav kirine û ez hên jî her karê girîng û pêwîst diqedînim. Niha jî çavên xwe berdane ew tiştên ku min ji zarok û neviyên xwe ra kom kiriye; dexsiya (hesûdiya) Malbata Haşimî ketiye dilê wî û çav berdaye hebûnên me. Bi Xweda heger tiştêkî wisa ji min bixwaze, bobelateka mezin dê bi ser wî da were".

Helbet, xizmetkarê sîxur ev tiştê ku Ce'hfer got ji xelîfe ra nivîsand. Îsmâîl dibêje: "Gava El Reşîd ew name xwend, sê rojan xwe dûrî her kesî kir û her bi wê yekê fikirî çawa dek û dubareyê bîne serê Bermekiyan".

7 – Bi vî awayî serpêhatiya Bermekiyan derbas bû

Gotûbêjên derbarê serpêhatiya Bermekiyan gelek in. Emê ji wan, ragihandina El Itlîdî bînin ziman; ew ji giştan berfirehtir:

Roj rojeka pêncşemê bû ji sala 178ê goçî, ew roja ku wek her car Ce'hferê Bermekî bi awayekî fermî siwardibû û li gel peywan û nighedaran diçû pêrgîna xelîfe. Harûn El Reşîd ji serekê nobetdarên xwe û celatê xwe Mesrûr xwast ku ji wî bi dûr nekeve û li meydana qesrê konekî turkî vegire. Helbet, Mesrûr fermana wî bicihanî.

Harûn li meclîsê rûnişt, mirov derbasbûn, silav lêkirin û her yek li gor rade û asta xwe rawestiya. Ce'hfer jî derbasbû û silav lêkir. Harûn silava Ce'hfer bi dilxweşî vegerand, pêşwaziyeka xweş şanê wî da û di rûyê wî da keinya. Ce'hfer di radeya xwe da rûnişt û radeya wî ya here nêzîk ji xelîfe bû. Harûn demekê pêra axivî û keniya. Ce'hfer rabû ew nameyên ku ji herêmen dewletê yê têvel hatibûn wergirtin, ji Harûn ra xwendin û piştî standina bawerîya wî fermanên pêwîst pêkanîn. Di pey ra dastûr ji Harûn xwast ku here Xurasanê, ji ber ku Harûn jê

xwastibû li wir rêveberiya hin tiştên pêwîst bike. Harûn got: Rêwîtiya xwe bihêle heya roja îniyê, Ce'hfer li ser wê razîbûna xwe şanî wî da û vegeriya qesra xwe, li kêleka wî gel û rêveber û leşker bi coşeka mezin navê wî bi şahnazî gazîkirin heya gihîştin qesra xwe. Li wir çî berpirsiyarî û tiştên pêwîst hebûn bicihanîn û di pey ra çû mala xwe¹.

Hên Ce'hfer nû gihîştibû mala xwe, El Reşîd fermandarê xwe Mesrûr şande pey wî û jêra got: Here û niha Ce'hfer ji min ra bîne, jêra bêje hin name ji Xurasanê hatine. Gava ew kete deriyê yekem yê qesrê, tu leşkerên wî li wir rawestîne û gava kete deriyê duwem, tu peywanên wî (nighdarên taybet) li wir rawestîne û gava kete deriyê sêhem, nehêle kesek bi wî ra derbas bibe; tenha bila ew derbas bibe. Gava kete meydana qesrê, wî bibe bin konê turkî ku min ji te ra gotibû vegire, li wir stûyê wî bibire û seriyê wî ji min ra bîne. Bila tikes nizanibe ku min ev ferman daye te û di doza wî da li min venege-re. Heger tu wisa nekî wek ku ez ji te ra dibêjim, min ferman daye ku werin stûyê te bibirin û seriyê te û

¹ El Itlîdî, Newadir El Xulefa, rûpel 177.

seriyê wî ji min ra bînin. Ev niha bese û tu êdî dizanî, zû here berî ku hinek din ji bilî te wî agahdar dikin.

Mesrûr çû, destûr xwast û ket mala Ce'hfer. Wî cil û bergên xwe ji xwe xistibûn û bihna xwe vedida.

– Mesrûr: Seydayê min! Xelîfe te dixwaze.

– Ce'hfer: Bi tirs û sawîr: Çi heye Mesrûr! Ez niha ji ba wî derketim, çi xebere?

– Mesrûr: Hin name ji Xurasanê hatine, divêt tu wan bixwînî.

Ce'hfer dilê xwe rihet kir, cil û bergên xwe anîn, li xwe kirin û şûrê xwe da ber nava xwe û li gel Mesrûr hat. Gava ketin deriyê yekem, leşkerên li gel wî hatin rawestandî û di deriyê duwem da nighdarên li gel wî hatin rawestandî. Gava Ce'hfer kete deriyê sêhem, dît ku kesek ji nighdarên wî ne li gel wî ne û heya xizmetkarê wî yê taybet jî ne li gel wî bû.

Hîngê ew li ser hatina xwe pir poşman bû û nema dikarîbû vegere. Gava gihîştin tenîştî konê turkî, Mesrûr ew bire wir, ji ser hespê wî peya kir û bire bin kon. Ce'hfer tikes li bin kon nedît, şûrek li wir dît, cihek dît ku warekî îşkencê bû û cihê serbirîne bû. Hîngê li bob-

latê hay bû û ji Mesrûr ra got:

– Ce'hfer: Birayê min Mesrûr! Çi xebere?

– Mesrûr: Ez niha birayê te me û di mala xwe da te ji min ra got: Weylek?! Mîrê Bawermendan فرمان daye min, ez stûyê te bibirim û seriyê te niha ji wî ra bibim.

– Ce'hfer (bi girî dest û pêyên Mesrûr maçdike): Birayê min! Ey Mesrûr! Min rêz û hurmet ji te ra, ji hemîyan bêhtir digirt û min hemû daxwazên te di her demê da pêkdihanîn; tu ast û radeya min li ba xelîfe dizanî, belkî hin mizêwir û fesadan hin tişt bi derew gihandibin wî, û va ye sed hezar dînar ezê niha ji te ra bînim, rê bide ku ez yekser vegerim.

– Mesrûr: Ti rê ji vegerê ra tinene.

– Ce'hfer: Min bibe ba wî û têxe nav destên wî, belkî li min were rehmê û min bibexşîne².

– Mesrûr: Ti rê ji min ra tinene û ne gengaz û mimkine ku ez li wî vegerim.

– Ce'hfer: Tenha saetek wext bide min, vegere ba wî û bêje ku te ez kuştim; lê guhdar bike ka çi dibêje. Heger tu wisa bikî û hêminiya min wergirî, bila Xweda û ferîşt govayên

² Jêdera jorîn, rûpel 178.

me bin ku ezê çî mal û hebûna min heye bi te ra parvebikim, ezê te bikim serekê leşkerê û hemû fermana cîhanê bidim dest te.

Ce'hfer di tika û ricayê da bi girî berdewam kir. Mesrûr şûrê Ce'hfer jê bir, 40 peywan dan dor wî ku wî biparêzin, çû ba Harûn û dît ku rûniştîye û ji rûyê wî enir û hêrs dibare. Gava ew dît.

– Harûn: Tu bê dayîk bimînî (mirin ji bo te)! Te mesela Ce'hfer çawa kir!?

– Mesrûr: Mîrê Bawermendan! Min ew kuşt.

– Harûn: Kanî seriyê wî?

– Mesrûr: Li bin kone.

– Harûn: Ka seriyê wî niha ji min ra bîne!

Mesrûr zû çû bin kon, Ce'hfer nimêj dikir, rik'etek kiribû, dem nedayê ku rik'eta duwem bike, dest avêt şûrê ku ji wî biribû, li stûyê wî xist, bi rîşa wî girt û seriyê wî bir danî nav destên Harûn û xwîn hên ji serî diherikiya. Harûn bihneka kûr kişand û razîbûna xwe da der. Destpêkir bi seriyê Ce'hfer ra axivî, tewr û kirinên wî gelek bi hêrs gotin³.

Piştî kuştina Ce'hfer, Harûn ferman da ku seriyê Ce'hfer li ser Pira Navîn bê venandin. Ferman da ku laşê wî bê perçekirin, perçeyek li ser Pira Jorîn û perçeyê din li ser Pira Navîn bê xaçkirin. Di pey ra ferman da ku Yehya Bermekî û kurê wî El Fedil bên girtin û di jêrzemînekê da bêne zîndankirin. Ferman da ku hemû zar û neviyên Bermekiyan, alîgir û xizmetkarên wan bên girtin; û rewakir ku her tiştê di qesir û leşkergehên wan da, çî kon û çî çek, bên talankirin. Ferman da ku tikes Bermekiyan neparêze û nehewîne. Bi sibeha roja şemiyê ra ji Bermekiyan û alîgirên wan dora hezar kesî hatin kuştin. Yên din jî li welat belav bûn, kesekî ji wan nikarîbû pariyek nan jî peyda bikira. Tenha dest li Muhemmed kurê Xalidê Bermekî (birayê Yehya) û malbata wî nedan, ji ber ku ew li gel Yehya di serdariyê da ne beşdar bûn⁴.

Bi vî awayî, di hundirê rojekê da rewşa Bermekiyan hate guhartin. Piştî ku ew wezîr bûn, kar û barê dewletê ji sînorê Çînê heyra bi Oqyanûsa Atlasê birêve dibirin, di qesrên bala da rûniştibûn, xwedî sa-

³ Jêdera jorîn, rêpel 179. Binêr Ibin Xellikan, Wefeyat El E'yan, 1/338 – 339.

⁴ El Itlidi, Newadir El Xulefa, rêpel 180. Ibin El Cewzi, El Muntezem fi Tarix El Muluk wel Umem, 9/135.

man û dewlemediyên giran bûn, her tişt winda kirin. Piştî jiyaneka bi êş û jan, Yehya di zîndanê da li bajarê Reqayê sala 190ê goçî (805ê z.) wexer kir. El Fedil jî li wir di zîndanê da sala 192ê goçî (808ê z.) wexer kir. Yê mayîn jî malbata Yehya bûn parsek û berdîwar. Harûn تنها bi wê jî nekir, ferman da ku hemû dost, carî û xizmetkarên Bermekiyan jî bên perçiqandin⁵.

Ji bo xuyakirina vê bobelat û rewşa Bermekiyan piştî vê serpêhatîyê, emê vê agahdariya jêrîn jî bînin ziman:

Muhammed Bin Xessan Bin Ebdulrehman El Haşimî, îmamê mizgefta bajarê El Kufe dibêje:

– Ez roja cejna qurbanê çûm ba dayîka xwe. Min li ba wê jineka bedew dît, bi cil û bergên kevin û riziwayî bû. dayîka min ji min ra got: Tu vê nasdikî?. Min got: Na. Got: Ev dayîka Ce'hferê Bermekî ye. Min rêz û hurmet şanî wê da û jê pirsî: Tiştê herî bi fêş (ecêb) çi bû ku te dît? Wê got: Kurê min! Cejneke wek vê di ser ra bihurî û 400 carî di xizmeta me da bûn û ev cejin bi ser me da hat û niha تنها du post li ba min hene, ez yekî dixim bin xwe û yekî digirim ser xwe. Min 500 dîrhem dan wê, ew jî şabûnê ra dîkir bifirîya; û her gav bi serdanî dihate ba me heya ku wexer kir⁶.

⁵ Ibin El Cewzi, El Muntezem fi Tarix El Muluk wel Umem, 9/130-131. El Nuweyri: Nihayet El Erebi fi Funun El Edeb 5/93.

⁶ Ibin El Cewzi, El Muntezem fi Tarix El Muluk wel Umem, 9/126.

HOLİK

Dembaş xebatkarên kovara bîrnebûnê!

Ez ji we re çîrokeke xwe dişînim. Dibe ku kêrî we were û hûn di kovarê de biweşînin. Ez jî penaber im. Di bin barana Holandayê de carinan çîrokan dinivîsinim. Lê derfeta weşandinê çênabe. Bi hêviya ku ev bûbû derfetek.

Di kar û xebatên we de serkeftinê dixwazim.

silav û rêz!

Arvîn Berçemî

Bedena xwe ya giranbûyî hêdîka berda ser somyeya kevn. Pal da balîfa pembû ya zirav û pehnûyî. Çend henaseyên kûr kişand. Heta bêhna wê vedibe guh da dengê zen-giloka xwe. Di paceya li hemberî xwe re li derve nihêrî. Kulîlkên daran ên nûvebûyî li ber çavên wê teyisîn. Lê holika li nav daran bêhna wê ya bipergalbûyî xera kir. Dengê xîzîniyê yê qirika wê hêwana biçûk dagirt. Serê xwe paşde bir û spart dîwêr. Her du destên xwe berda kêlekên xwe. Bi şev raneketibû, lê xewa wê nedihat. Heta serê sibê ji Xwedayê xwe lava kiribû û bi firmiskên xwe balîf şil kiribû. Niha çavên wê ziwa bûbûn. Hêdîka çavên xwe girt, lê ji nişka ve vekir. Bala xwe da şewata wan ku dilê xwe hinekî aş bike.

Ji derve dengê mirovan dihat û her ku diçû zêde dibû. Ji dûr ve jî dengê giriyê dihat, carinan dibû

qîrîn. Lê dengê li ber malê dengê din ditepisand. Dema firavîne nêz bûbû, ligel vê li nav û derveyî malê liv û lebatek xuya nedibû. Jixwe li hundir ji bilî Dayika Wijdan tu kes tune bû. Ma ji êvarê de bédengî û bêkesî tune bû li malê? Beriya şîvê bédengiyek çêbûbû. Rûyên zarok û neviyên wê ne rûyên xêrê bûn. Keçên wê yên mala wan nêzik bû hatibûn. Lê ji wê re û ji hev re tu tiştek negotibûn. Bi tenê bi çavên sorbûyî û bi rûyên xemdar li hev nihêrtibûn. Xwarin di qirikan re derbas nebûbû. Çay di qedehan de sar bûbû. Yên ku kela wan rabûbû çûbûn menzelekê.

Dayika Wijdan heftê salên dirêj bi êşên nehatine navandin li pey xwe hiştibûn. Êş û xemdariya di çav û rûyên zarokên wê de dîmenek anîbû ber çavên wê. Êşeke giran di dilê wê de kiribû çizîn û li bedena wê belav bûbû. Lê pirsên wê

bê bersiv mabûn. Lêvên dicirifin nekarîbûn çend peyvên rêz bikin. Dayika Wijdan pir zor nedabû wan. Bi dîmena çêbûyî û êşa hîskirî gihîştibû encamekê. Piştî malî rake-tin keça wê ya biçûk ji kincdankê du perçe kincên kurê Wijdanê yê biçûk derxistibûn. Îskeîska wê gihîştibû guhên wê. Dayika Wijdan bi vê re êdî fêr kiribû.

Bi hatina çend maşîneyan re dengê li derve bi carekê de qut bû. Piştî bédengîyeke kin ji nêrdewanê dengê potînan hat, zêde bû û li ber dêrî sekinî. Derî vebû û pê re Dayika Wijdan serê xwe rakir. Li ber derazînkê kurê wî yê mezin û du leşkerên ku cilên wan dîteyîsîn xuya bûn. Piştî ew ketin hundir, hin kesên mîna karmendên dûgelê û cîranên wê ketin hundir. Hemû li hêwana biçûk bédeng bi cih bûn. Ew du leşker li kêleka Dayika Wijdan rûniştin. Ê payebilind destê wê girt û kir ku tişteki bibêje. Lê wê nehîşt. Li holikê nihêrt. Bi dengekî kelegirî behsa zarokatiya xwe ya di deşteke germ de derbasbûyî û behsa malbata xwe kir. Ên ku di hêwanê de rûniştine bi baldarî guhdar dikirin û bi matmayî li rûyê wê dinihêrtin. Hinek ji gotinên pesindar ên ji bo kesên weke dijmin

didîtin dihatin gotin hêdî hêdî hêrs dibûn. Hinek jî bûbûn dilşewat li ber wê jiyana êşbar.

Wek çavên wê qirika wê jî ziwa bûbû. Henaseya wê bi zorê derdixet. Destê xwe ji nav destê leşkerî derxist. Yek bi yek li rûyên kesên di hêwanê de rûniştine nihêrt, herî dawî bi hêrs li çavên leşkeran nihêrt. Bi tirkiyeke şikestî got:

“Nebêjin êdî kurê min ê biçûk wê neyê. Bila kes nebêje ew şehîd bûye. Bira birayan li ser axa xwe dikujin. Ma ew çawa dibin şehîd? Ez ji Nisêbînê mîna bûkekê anîm navenda Anatoliyayê. Piştî pêncî û pênc salan kurê min mîna tirkekî çû bajarokê min ku li hemberî birayên xwe şer bike. Lê wî nizanibû yên li wir zarokên xal û xaliyên wî ne. Nihê ha hûn ê bibêjin serbilind be, kurê te şehîd bû, li hemberî terorîstan bi qehremanî şer kir û xwîna xwe ji bo welatê xwe rijand. “Na, ne wilo ye. Na, na kurê min, na...”

Du dilop firmiskên Dayika Wijdan niqutîn ser dawa wê ya gulgulî. Leşkeran nizanibû çî bibêjin. Çavên xwe kutabûn erdê, rewşa xwe anîbûn bîra xwe. Dayika Wijdan ji firnikên xwe henaseyeke ku hemû hêrs û qehra xwe vedibêje berda. Çavên wê li ser holikê bûn ku ji ser xênî

ala sor berdan. Nîvê paceyê bi alê hate girtin, êdî holik xuya nedibû. Bi hêrs bang kir: “Zû wê alê ji wir deynin. Wê ala we kurê min neyne.” Paşê bi dengê hîn aram û nizm domand:

“Ew giregir û patronên we zarokên belengaz û feqîr ji bo berjewendiyên xwe dişinin şer û wan davêjin nav êgir. Dema ew dimirin xwedêgiravî bi pîrozbûna welêt dilên dayikan sewax dikan, bi alê jî çavên dayikan boyax dikan. Ev ne pîroz in. Mirov û jiyana bi hev re pîroz in; mirov nebin jiyana jî tune ye. Ez di nava we de ji çand û jiyana xwe ya kurdewar namo bûm Lê ji jiyana û pîroziya wê namo nebûm. Ew qas salên min di nav we de derbas bûn, em bi hev re jiyana; pîrozî ev e. Kesên ku niha li wê herême şer dikan û xwe diparêzin ji bo vê pîroziyê xurt bikin hewl didin. Û ew kes mîna min in, na ji min baştir in. Lê îro kurê min ji bo hikumdariya yekî hatiye kuştin. Ma kurê min nebe ez ê çi bikim al û welêt? Bila al jî, welat jî serê we bixwe. Jixwe ji berê de ez bê al û welat mame...”

Bi tenê ji qirika Dayika Wijdan xîzînî dihat. Ala ku li ser xênî girê dabûn û berdabûn jêrê, bi lez kom kirin. Tu kesî tiştek nedigot. Dayika Wijdan bi xemgînî û kûr kûr li holikê dinihêrt. Kurê wê yê mezin bi çavên ku ji êş û hêrsê derdorê nabînin derket derve. Dûre her du leşker derketin, siwarî erebeya xwe bûn, bêdeng dûr ketin. Mêrên li hêwanê rûniştî bipirsên xwe yên bêbersiv yek bi yek çûn mala xwe.

Kurê Dayika Wijdan ê mezin çû li ber holikê rûnişt. Tiliyên xwe di axê re kir. Hemû çîrokên ku diya wî bi zimanê xwe vegotibûn hatin bîra wî. Dîmena wî bajarokî ku carekê dîtibû bi dîmenên ku wêran bûbû re tevlihev bû. Ew roja ku birayê wî li ber wê holikê jê xatir xwestibû dîsa zindî bû û êşa wî gihîşt ezmanan. Nîqrîskan nedihîşt ku henaseyê bigire. Xwezî pê anî ku tiştên ji diya xwe di wê holikê de hîn bûye ji birayê xwe re jî bigotana. Lê ew holik bê xwedî mabû; ne dayikê dikaribû bihata, ne jî wî dikaribû li xwe mikur were û sozên xwe pêk bîne.

bi Mehmed Tewfîk Demir re

Sal: 61

1979 – 85 zindanî, Anqere û Dîyarbekir
Niha li Swîsreyê li bajarê Bernê dimîne.



Birêz Mehmed Tewfîk, em dizanin tu ji gundê Hecîlera yî, bo wê jî em ê rasterast pîrsa xwe weng destpêbikin; tu ji Hecîlera ji mala kê yî û malbata we re mala kê dibên? Tu heta kengê li gund mayî? Te mekteb li gund xwend an li bajarê?

– Navê min Mehmet Tewfik Demîr, bi kurdî Mehm me. Vi min re dibên Mehmî Mahmûdî Hemî Elê. Ji Hecîlera me. Li sala 1957an hatime dunê. Mekteba siftê min li gund xelas kir. Ortemekteb, sinifa yekemîn li Încovê min xwend. Dûra birayê min î mezin, Tewfik Demir li Tekirdaxê eskerî dikir, ez birim ba xwe. Salekê li wir min or-teokul xwend. Pîştî wê de jî hatim Anqerê. Orteokul paşî û lîse, min li Anqerê xilas kir.

Heta kingê li gund mayî?

– 1969an de ez ji gund derketim. Heta 1970î li Încovê bûm, 1971an

de çûm Tekîrdaxê. Piştî salekê jî em vegeirîn Anqerê.

Têkîlîya te bi gund re hebû?

– Erê, ez havîna, wexta mektep diket tatilê, sê meha dihatim gund. Li gund min alîkariya îşê gund ê havînê dikir heta mekteb vedibûn, li gund dimam.

Te got, navî kalê te Hemî Elê ye, gelo bo çi bi navê dê bilêvkirine? Taybetiyeka dîya wî hebûye ku ne bi navî bavê lê bi navî dê têye naskirin?

– Êk ez dizanim va ye; kalê min birayekê bi tenê maye. Birayên wî yên mezin mirine. Sê bira wû ne, herdu yên mezin mirine û kalê min bi tenê maye. Ji ber bavê kalê min jî zû mirîye, derûdor û cîrana ew bi navî dîya wî, Elê bi nav kirine û jê re gotine, Hemî Elê. El bi xwe jî ji wê

malê bi tenê wî ye. Bi du keçîk û lawekî malbat bi ser wê de maye. Wê jî xwe daye pêş mala xwe û bo wê jî ji kalê min re gotine, Hemî Elê.

Hinek malbat di nav kurdan de bi navê jinê tên bi lêvîkirin, dema meriv hinekî lêdikole, pirs dike, çima weng e, em dibînin ku hertim taybetiyeka wê jinê heye, yan yeka şerrud û jihatî bûye yan jî wek tu dibê, ji wê malbatê bi tenê maye bo wê jî bi navî wê jinê tên binav kirin (ji ber normal di nav civata kurdan da piranî bi navî mêra, yanê bavê tên bi nav kirin.)

– Ew, bî maye. Lê yeka liserxwe wî ye. Kurên xwe yên din mirine, kalê min bi tenê maye loma ji kalê min re gotine; Hemî Elê. Niha malbata me li ser vî navî terîye...

El bi xwe jî ji Hecîlera bûye an li gundekî din?

– Na, ji Burunsuzê hatiye, pîreka me ya mezin, Ela Alêsen jê ra tewên. Jina Hemî Elê, pîreka me ra jî tewên Döna malê Cinê, ev jî ji Încovê hatiye. Yanê ji alîyê jina ve em jî derve ne.

Birayê kalê min î mezin navê wî Buldux bûye. Ev ji Încovê, ji malê Cinê dizewice. Jê keçîkek dibe

navê wê jî Zaxe wê re tewên. Durê Buldux dimire, pîra me ya mezin, Ela Alêsen, ji bûka xwe hez dike, ji bo ku berdêl ji bûye, naxwaze bûka xwe vê paşda here mala bavê. Bûka xwe bi kurê xwe yê duyemîn re mar dike. Navê wî jî Hecî ye. Lê ji Hecî zarok nabin, ew zû dimire. Wê demê kalê min salên xwe 15 bûne. Nizanim pîreka me wê çaxê salên xwe çi bûne? Dibe ku li derûdora 30 salî be. Ela Alêsen, pîra me ya mezin, îcar dixwaze bûka xwe bi kurê xwe yê biçûk re bizewicîne. Kalê me qe-bul nake, naxwaze jina birayê xwe bi xwe re biwe. Wê demê, Hemê Elê pir bi ber xwe dikeve, him î biçûk e, tenikî tirs jî tê ser, ji ber bi tenê ma ye û hêla din jî vê jinikê du bira pê ra zewicîbûn û her du jî miri bûn, ew jî li ser wî tirseka din peyda dike. De-meke dirêj qe-bul nake û naxwaze pê ra bimê. Lê ji daka xwe re jî nikare îtirazke. Di nav kurmanca de ev di-be, lê tişteki pir diramatîk e. Tişteki pir giran e. Him ji jina re hem jî ji mêra ra. Di esasê xwe de pîreka min jî nedixwestiye di malekê de sê bi-ra li xwe mar bike. Ez a rastî, baş nizanim, a ku mezinên me ji me ra qal dikirin, digotin; kalê me, Hemê Elê nedixwestiye bi jina birayê xwe re bizewice, heta mirina xwe tazîya

birayên xwe dewam kiriye. Heta mirinîyê rûye xwe qet kur nekirîye. Reşgirêdayî bûye. Yasa birayên xwe di-kişandiye.

Ev helbet, tirajedîyeka mezin e ku meriv mecbur dimîne jina birayê xwe re bizewice. Sebebên zewacên veng ên tirajîk yên aborî û ciwakî yên wê demê helbet hebûn. Nedixwestin bûka wan here bi yekî din re bizewice. Lê ez cara siftê ye dibîzim ku bi birayê sêyemîn re jî zewac bû ye. Ev jî bo kalê te helbet barekî pir giran bûye!

– Rast e, ev tiştêkî ne normal bûye. Dudu dibûn lê ev a birayê sisêyan tiştêkî cara nebûye, yan jî me nebistîye. Mezinên me digotin,

heta ku derguşa wan a siftê tê dunê kalê me navê pîreka me bi navê wê, Dönê hilneditanîye. Heta dema li zewîya bi hev re kar dikirine, kalê



me li hêleka terlê û pîreka me re jî digotîye; tu here hêla din. Yanê nêzikî xwe nedikirîye. Li cemata û li derûdora hertim li dûr disekinîye. Nedixwestîye nêzikî wê be.

Dergûşa siftê kurek dibe, navî wî Mistefa lêdikin. (Leqabê wî jî Qungir e. Niha jî malbata wî re dibên; Mala Qungir.) Wexta der-guşa wan digirî, cara siftê kalê min navê pîreka me hildide, dibê; Dönê, Mistefa digirîye. Vaya pir xwe-şa pîreka min tê, çend sala bi şûn da cara siftê Hemî Elê jina xwe bi navê wê bangê dike. Pîreka me tê, ji cîrana ra qal dike, dibê; Hemê îro navê min hilda, bi navî min bang kir û pê kêf dide. Çêroka malba-ta min veng e. Yanê dirametîkeka mezin heye. Îro jî ji vê dirama kalê min, 30– 40 mal heye.

Erê, te got, te lise li Anqerê xilaskir, tu her li Anqerê ma, te ci dikir li wir?

– Ez ji 1972an heta 1979an li Anqerê mam. Ez tenekî tevî sîyasetê jî bûm. Wê demê li her derê sîyaset dihat deng kirinê. Bala me jî kişand, em jî tevê bûnî. Me karê sîyasetê jî kir.

Te wê demê bi tevgeraka sîyasî ya kurd re kar dikir, gelo ev a ku bala te diki-şand ser tevgera kurdî çi bû?

– Malbata me, malbateka demokrat bû. Bavê min jî birayê min jî. Birayê min î mezin Av. Tewfîk Demîr însanekî demokrat bû. Ez di bin tesîra wî de jî mabûm. Ya din jî wê demê însanên me yên kurd, dema diçûnî bajara an cîyên tirk, hertim hev diparastin, guhên wan li hev dibû. Dema yekî bi kurdî deng di-kir em nêzî wî dibûn, em li hev germ dibûm. Dema li mektebê jî yekî bi kurdî dengkirî me hevaltî pê ra datîna. Me xwe dida hêla hev. Li mekteba min jî kurmanc hebûn. Hevalekî min ji Wanê, ji Ercîşê hebû. Niha çûye ser dilovanîya xwe. Rehmet bû. Navê rehmetî Seyîdxan Öksüz bû. Li Dersîmê hevalekî me yî din hebû. Navê wî Mehmed Kurt bû. Min bi wana ra hevaltî dikir. Hevalekê me ji Dîyarbakirê jî hewû, wî wê demê li universîtê dixwend, navê wî Kamil Sümbül bû. Kamil ne li mektebe me bû, min ev li mehlê nas kir, mala wî li mehla me bû. Berî min hevalê min Seyîdxan ew nas dikir, wî em bi hev dan nas-kirin. Bi rêya van hevalana min li der heqê kurd û Kurdistanê de ge-lek agahdarî wergirt. Ji ber van he-valana bi hereketa Rizgarî re kar di-kirin, bi rêya van têkilîya min bi hevalên Rizgarîyê re bû.



Mehmed Tewfik û Seyîdxan Öksüz

Wê demê, li mehla ku tu dima an jî li mektebê, dijatîyek li hember te hebû, an te xwe bi tenê ditît di nav tirkên de?

– Na, ez bi xwe tu rastî tiştêkî weng nebûm û min nedît. Berî ku ez bêm Anqerê jî, derûdora me gundên tirkên hebûn. Me dizanî em ji tirkên cudatir in. Zimanê me, pir tiştên me yê din ne wek wan bûn. Ji alîyê din ve jî li mektebê hertim bi zimanê tirkî dihat deng kirin, me dixwest bi zimanê xwe, bi kurdî jî deng bikin. Bo wê jî çav û guhên me her tim li kurda bû. Ez bi xwe tam nikarim îzah bikim ji bo çi meyla me her tim kurd dikişand.



Mehmed Kurt û Mehmed Tewfik

Me kurdek didît, em diçûn, me pê re hevaltî dikir. Û me Çima weng dikir, wê jî ez î rind nizanime.

Ev dema te ya xortanîyê bû, di van salan de meriv dixwaze hevalekî meriv î nêz hebe ku meriv her tiştê xwe bikaribê pê ra deng bike. Gelo, havalekî te yî weng di nav tirkên de çêbû?

– Heval û nasên min ên tirk hebûn. Li orteokulê jî hebûn, li lîsê jî. Lê wê demê wek hûn jî dizanin dema ku herkes bi grubekê re bû. Min nedixwest bi grubên tirkên re kar bikim. Ew ji min dûr bûm. Ez yek ji wan kesan bûn ku pir dereng ez

çûm ba gruba. Yek jî çavên xortên kurda her li grubên kurda digerin. Ji ber ku min ev hevalên derûdora Rizgarîyê nas kiribûn ez her bi wan ra bûm. Grubeka din a kurda bûya min ê bi wan re jî kar bikira. Ev kurd bûn. Ez bi wan re bûm. Siyaset ji wan fêrbûm. Hevaltiya min piranî bi wan re bû.

Erê, ev salên, 77-79an salên pir bi he-reket bûn, grubên çep, ên kurd û yên nijadperestên tirka, bi taybetî jî li dibistana aktîv bûn. Tiştê ku wê demê bala te bir ser kurda an li ser te pir tesir dikir çi bû. Te bahsa birayê xwe kir, gelo tesîra wî bû, li ser te?

– Min bi birayê xwe re tu li ser kurd û Kurdistanê şor nekirin. Tiştê ku ez li wî fêr bûm, mesela demokrasiyê bû. Birayê min însanekî demoqrat bû. Wî tu mesela kurd û Kurdistanê ji min re qal nedikir, wî her digot, divê meriv demoqrat be, ji pir dîtina re vekiribe. Wê demê birayê min bi CHPê re danûstendinên xwe hebûn. Meyla me jî li ser CHPê bû. Me digot; CHP demoqrat e. Mafê însana diparêze. Me wisa dizanî. Ji ber me ev cep(solci) dizanî.

Pirsa kurd û Kurdistanê, li lîsê, sinifa 2 û 3an de, li cem min çêbû.



Bîranîneka dema dibistanê

Wê demê min xwe wek soreşger û çep nîşan dida. Wê demê jî grub çêdibûn. Meyla min li ser grubên kurda bû. Di nav grubên kurdan da jî gruba Rizgarî hebû.

Du hevalên min ên kurd hebûn. Hevalekî min î kurd hebû wî xwe li gruba çepê tirka girt. Hevalekî min î din î kurd hebû ew ji gruba Rizgarîyê bû. Min got, ez ê berve kurda herim. Li ba wan kovarên kurdî hebûn. Me ev dixwandin. Yanê kesî ez mecburî tu gruba nekirim. Tabî wê demê soreşgerî û çepitî jî bibû modeyek. Bo wê jî, me got, eger em ê karekî soreşgerî bikin em dîvê ji bo kurda û bi kurdan re bikin. Yê ku rastê min hatin jî ev hevalên Rizgarîyê bûn û li ser wê weng cû...

Sala 1979an saleka pir tevlihev bû. Li bajarên Kurdistanê "urfî Îdare/ sikiyênetîm" hebû. Dûre di 1980î de jî



Bîranîneka dema dibistanê

darbeya eskerî çêbû. Çunta hat û jiyan ji bo ev soresger û çepên tirk û kurdan pir dijwar bû. Tu jî yek ji kurbanîyên wê demê ye. Tu dikarî hinekî qala wê demê biki?

– Wê demê ez li ”Bayındırlık Bakanlığı”yê dişuxilîm û teksîyeka me jî hebû. Min bi êvaran jî teksî dajot. Têkiliya min jî bi komela ASK–DERê re hebû. Komeleyeka resmî bû. Ez jî diçum wir û dihatim. Me karê siyasetê jî dikir. Îlona 1979an ez li Anqerê hatim girtin. Şeş meha li Anqerê, li Mamaqê hapisê de mam.

Wê demê partiya Suleyman Demirel wan li îkdîdarê bû. Wana qanuneka nû derxistin. Wek bi tirkî dibên ”*toplu yargılama*”, yasayeka wisa derxistin. Ji ber ez li ser navê ASK–DERê hatibûm girtin, û edresa ASK–DERê ya merkezê jî li Dîyarbekirê bû. Tam wê dema ez hatim girtinê jî hereke-

ta Rizgarî jî bibû du grub. Gruba Rizgarî û Alarizgarî. Ji ber ev lihevveqetandina hîn salek tijê nekiribû dawa herdu gruba kirin yek. Loma em adara 1980î birin hepisxana Dîyarbekirê. Hîn dawa me jî hev newibû jî darbe bû. Dema darbe bû em ê di hundur de bûnî. Piştî darbê, 1982an de dawa me destpê kir. Zêdeyî du sala dawa jî hev nebû. Dawa me nêzikî deh meha ajut. Piştî wê jî cezayê me dana me. Cezayê min jî ji bo ”Örgüt üyeliği” bo wê heşt sal ceza li min birîn.

Ji ber ku tu emdamê ASK–DERê bû, tu bi dawa Rizgarî/Alarizgarî ve hat mehkeme kirin?

– Min tu çalakîyek jî, nekiribû, tu kesî jî nexistibû û tu kes jî nekuştibû. Li ser min çenteyek hat girtin. Di çentê de jî defter û pirtûkên komelê hebûn. Li ser wê ez girtim. Gotin vana qedexa ne, lê ne qedexebûn. Wê demê li ser van hereketana operasyon hebûn. Ti bi taybetî li min nedigerîn, tesaduf bû, girtina min jî di wê demê de bû.

Ew dema ku tu li Dîyarbekirê di hepsê de bû, demeka pir dijwar bû. Rewşa hepisxana Dîyarbekirê, bexwedana li wîr bi navûdeng bû. Berxwedaneka qehremanî

bû. Tu jî yek ji wan kesan bû. Tu dikarî hinekî qala hepisxanê bikî?

— Piştî darbê li hapisxanê îşkence destpê kir. Tabî îşkence û zilma li wir, meriv nikare bi gotînan îzah bike. Eger meriv ev îşkence bi xwe nedîtibe, fêhmkirina wê pir zahmet e. Bi her awayî îşkence li me dikirin. Tabî ev îşkence ne tenê bo şaxsîyet an hereketa me bû. Wan dixwastin di şexsîyeta me da kurd û Kurdîstanê bikujin. Di wir de mehkum bikin. Dixwastin me teslîm bigrên. Me bitirsînin daku ma millet dev jê berde. Ji bo wê jî zilmeka pir giran li me dikirin

Îşkencên giran ên bê hempa li me hatin kirin. Ne tenê fizîkîwûn. Îşkencên pîsikolojîk jî dikirin. Ji bo ku şexsîyetên însana çing dêxin, çing bişkênînin, çing xerav bikin, bi her awayî heqeretiyên mezin li me dikirin. Bi taybetî jî navên kurdî heqeret kirin! Bo min îşkence herî xerav ev bû. Rast e, dijmin e, tu bi dijmin re şer dikî tê kuştin, ev tiştêkî din e. Dema bêje, tu kurd e te dikujim tiştêk e, dema bêje, tu ne kurd î tu tirk e! Tu nebêjî ez tirk im te dikujîm, tiştêkî cuda ye! Û tiştêkî giran e jî. Yanê wan nasnama me, navî gelê me qebl nedikirin. Ji bo wê jî heqeretiyên mezin li me dikirin.

Heta niha pir hevalan bîranînên xwe nivisandin û hinek hejmarên girtiyên ku di hepisxanê de hatine kuştin dane, min piranîya wan jî xwendin. Lê ez bawer im ev reqemana ne rast in. Bi bawerîya min ji wan reqemana zêdetir kuştî hene. Ji ber ku di navbera koxûşan da kon-tax tunebûn. Te nidikarî xeber bigrê li axzê din çi bûye çi nebûye! Nêzikî 40 koxuş hebûn. Pir kesên ku wek dibên „*faîlî meçhul*“ hatin çom kirin jî hebûn. Hinek kes ji koxuşa dibirin û ev kes careka din paşde nedihatin. Digotin; „*tahlîye*“ bûne, lê ne tahlîye bûn. Ev dibirin, di îşkencan da dikuştin û çom dikirin. Hinek hevalan nivîsîne ku hejmara ev kesên hatine kuştin 30–40 in, lê ez dibêim ev kesên hatine kuştin ji van hejmaran pir pir zêdetir in.

Nêzikî 15–20 kesî jî serî „şil“ kirin. Ev ên ku ez dizanim. Du koxuş werem bûn. Ev jî tiştêkî din î cuda ye! 150– 200 însan carekê de werem dibin. Ev cuta dibe? Çi însanetî ye? Bi zilma wisa pir însanên hatî xerabkirî jî hene. Bi du-sê sala dawa jihev nedibûn, ev merivana tu sucekî xwe jî tunebun û pirê cara însanên ku cezayê xwe xilas bibûn nedihatin berdandin. Ez bi xwe jî yek ji wan im ku 10 meh zêde di

hepisê de mam. Mehkema min qediya. Cezayê min qediya, lê wana ez bernedam.

Yanê tiştên ku meriv nikare bifikire û dûrî însanetîyê ye li wir hatiye kirin. Carna em di filmên dokumenterî de jîyana hinek hepisxaneyên bi navûdeng li cihanê hene dibînin, yên dema Hitler li Almanayê û Pol Pot li Kampocayê hvd... lê dema min hinek ji wan bîranînên hevalên di hepisxana Diyarbekirê de mane, xwendin û meriv wan bi dokumenterên heta niha hatinê belav kirin ve dide ber hev, ev îşkençên li hepisxana Diyarbekirê ji wan kêmtir nînin!...

– Pir pir zêdetir e. Film, dikare hinek tişt tê de bin jî lê tu nikare di filmekî de hemû tiştî bîne ziman. Bi gotin jî tu nikarî her tiştî bîne ziman! Yanê ev jîyana min a ku 5 salên li wir derbasbûnê ez li wira nikarim di hundurê nîvsaet satekê de her tiştî bînim ziman. Her tişt nê bîra min jî! Lê tiştêk ez dizanim wan zulumekî gelek gelek mezin li me kirin! Di wir de tu însanetî nabînî. Yanê tu difikirî, tu dibê va-ya ne însanetî ye!

Tu wek kurdekî ji Anatoliyê ji ber dawa kurdîtîyê li bajarekê Kurdistanê, li Dîyarbekirê bi salan mayî û tu hati

îşkence kirin û te heqeretîyên giran dîtîn. Qasî ku ez pê dizanim, wê demê ji nav kurdên Antoliyê yên ku di hepsa Diyarbekirê de bûnî pir kêr bûn. Me navê rehmetîyê Yilmaz Demir dizanî, jiber li wir hat kuştin. piştî jî me navê te bihîst! Yanê di wê wexta herê dijwar de tenê hûn du kes bûn? Gelo we hev didît, xeberê we ji hev hebû?

– Na, em sê kes bûn, yek Ali Cetinkaya, yek Yilmaz Demir ji gruba Riya Azadî û ji Ala Rizgarî jî ez hebûm. Xeberê min ji Elî jî hewû ji Yilmaz jî hewû. Ez nizanim xeberê Yilmaz ji min hewû an tunebû! Ez wê nizanim.

We tu hev nedît?

– Na, me hev nedît. Koxuşên me ji hev cuda bûn. Wextekê birayê min hat zîyareta min, wî pirs kir got; te Yilmaz dîye, xeberê te ji Yilmaz heye? Li pêşîyê min nizanî bahsa kijan Yilmazî dike. Yilmazekî me yî din î nas jî heye. Min got; erê, ez dizanim.

Lê dûre, dema ez çûm koxuşa xwe, min bi xwe-xwe got, birayê min vî Yilmazî nasnake, ev kijan Yilmaz e? Di koxuşa me de, ji Rîya Azadî heval hebûn, min ji wan pirs kir ka tu Yilmazên din hene? Wana gotin; erê, Yilmaz Demir ji

Înçovê ye, hevalê me ye, ew jî li wira ye. Min wê demê fahm kir, ku çima birayê min pirs kirîye. Ji ber birayê min bi Yilmaz ve pîsxaltiyên hev in. Dîya min a duyemîn, xaltiya Yilmaz bû. Me di destpêkê de qala kalê xwe kir, ev tirajediya kalê min hatibu serê bavê min jî. Birayê bavê min mir, zarokên xwe hebûn, Nexwestin ma here mala bavê xwe û zaroka cîbê, ev mecbûr dimê jina birayê xwe li xwe mar dike. Ji wê dîya min a duyem birayekî min heye, navê wî Hem e. Hem û Yilmaz pîsxaltiyên hev in. Ji bo wê birayê min pirs kiriye.

Yanê, te berî wê nedizani ku Yilmaz di hepisê de ye?

– Na, heta wê çaxê min nedizani.

Ev jî tirajedîyek e! Însanekî hewqes nêzî te, merivê te, gundên we hema bi hev re ne, di eynê hepisxanê de dimêne û xeberê we jî hev tune!

– Erê, niha hertiştî meriv nikara baş îzah bike, wê demê ku tu ji derî koxuşê xwe derdiketî divê berî te li ber te bûya, derûdorê xwe mêz nekira, qedexê bû. Tu kesî nabînî û nikare mêzkî! Eger nasekê we yî hevpeş di eynê koxuşê de hebe meriv nikare xeber jî hev bigrê. Min durê ji hel-

avên wî xeber heyna. Çar hevalên wan hebûn, dure min di îddana-meye wan de navê wî dît û bi rêya hevalên wî min zanibû Yilmaz di wir de ye.

Gora Rehmetî behîşt be! Yilmaz qasê ku hat gotin ji ber îşkenca protesto bike biryareka xwe ya dîrokî dabû, dawî li jîyana xwe anîbû!

– Erê, li dijî îşkenca eylemeka pîr giran kir! Jiyana xwe ji bo ku îşkenca protesto bike, fedayî kir! Ev "eylemeka" gelek girîng e li cem min! Hurmeta min li ber eylema wî pîr e. Ji bo kurdên Anatoliyê jî tiştêkî bi rumet e! Yanê bo kurdên Anatoliyê jî tiştêkî bi qîmet çêkir! Ew rumeta me ye! Ev jî nîşanek e ku kurdên Anatoliyayê bi ruh û dil bi kurdîtîya xwe re girêdayîne. Wî karî ne ji bo xwe dîkin, ji bo kurd û Kurdîstanê dîkin. Bawerî bi kurdî heye. Ji bo vê ket vî şerî û jîyana xwe jî bo wê da!

Helbet, ev ne ji bo şexsîyeta xwe bû! Kurd îro li ser axa xwe ne tu mafê nasnameya wan tune. Mafê însana yê herî bîngehîn nasname ye. Ev hatiye bînpêkirin. Wî ji bo mafê insanetîyê kar kir. Fedekarîyeka mezin e, helbet. Ew û gelek kesên din ên piştî wî jî jîyanên xwe wek bedel dan hemû rûmetên me ne.

– Bi rastî, îro ev zulmê ku li Kurdistanê tewe li ser însanên me yên Anatoliyê nabe. Zulmeka heye ya sîyasî ye. Lê îro ne be jî sîbê dikare ew zulma li ba me jî bê kirin. Yanê ne ji bo wê ye, tu dibê ez kurd im, divê mafên me yên kurdî hebin, çima tunin û ji bo wê jî tu dixwazî karekî bikî. Yilmaz jî karekê gelek baş jî kir û di dawîyê de jîyana xwe jî wek bedel da!

A ku wî bikaribe ev bûye, wî weng karibû wê demên dijuwar yê hepsî de deng bide û pir kesan berxwedanên kahramanî jî kirin. Wê demê em li wir bûn. Berxwedana girtîyên sîyasî yên hepisxana Dîyarbekirê heta wira dihat. Li dunê belav bû! Tu jî yek ji wan bû ku we qehremanîyeka mezin da! Di wan şertan de meriv dikare teslîm jî bibe, ev tişteki însanîye!

– Helbet, ev tê serî her kesekî. Meriv nizane çî tê serî merîya! Evro, bi kurmancî dibê; *enîyê me ji hev e!* Ji bo kurdîtîyê çî gerek bûye min li wir kiriye. Yilmaz hîn zêde kiriye. Av. Ali Çetinkaya jî ha kezan, heta dawîyê dewam kir. Ez wê jî bêjim, Ali Centinkaya jî çû rehma Xwadê! Wî jî nexweşîyeka giran derbas kir. Li ber mirinîya wî jî min çend cara pê ra bi telefon xeber da. Ew jî însa-

nekî gelek baş bû! Dixwest ji bo gelê xwe karekî bike.

Rast e, wê demê ji kurdên Anatoliyê ku tev tevgerên kurda pir tunebûn. Hindik bûn. Belkî bo wê jî li hepisxana Dîyarbekirê ji kurdên Anatoliya Navîn em sê kurd hebûn. Ciwanên kurd pir wûn lê bêşansiziya me, em her sê hatin girtinî. Li wira jî me rûye însanî xwe reş nekir. Ev jî ji bo min tişteki girîng e!

Pîştî ku tu ji hepisê derket, tu vegeirî

Anqerê an tu rasterast hat gundê xwe?

– Na, ez berê wê tişteki din bêjim. Dema mehkeme vebû tabî, zulmekî pir giran li ser me heye. Bi kurdî deng kirin qedexa ye, komûn qedexa ye, siyaset xebardan qedexa ye. Em teme dikirin, digotin; eger hûn di mehkemê de navê kurd û Kurdistanê helnin, em we dikujin. Herkesî jî dizanî ku zulumekî mezin jî dewam dike. Ji bo wê jî pir însana di mehkemê de *”savunme”* nekirin. Bi min ve, me şeş hevalan *”savunme”* kir. Ji wana çar cuda kirin, ew berpirsîyarê komelê (ASK–DER) bûn. Wana bi navê xwe bi hev re savunma xwe kirin. Hevalekî me yî dîn ji Çermîkê hebû, navê wî Kamil Sümbül bû. Wî jî bi navê xwe *savunma* xwe kir. Yek jî ez

bûm. Min bi ser navê xwe kir. Birê min, Av. Tewfîk Demir, avukatîya min dîkir, berê ji min re got; xeber nede, min bi savcî re deng kiriye, tu deng meke yê te berdin. Min got; welleh ji min pirsî, ez ê xeber bidim, ez nikarim bêjim, ez ne kurd im! Min heta roya îro va zulma dîye, ez nikarim bêjim min kar nekiriye û ez ne kurd im!

Wexta îfada min girtin, hêkîm ji min pirsî; got, tu kurd î? Min got; ez kurd im. Got tu çi difikirî, fikra te çî ye? Min got; ez kurd im, ez demoqrata im, ez sosyalista im. Got, tu “*örgüt üyesi*” ye? Min got; na, ez kurd im, demoqrata im, lêkolîna dîkim, ji bo wê jî min bi van hevalan re têkilî dayna, ez bi wan ra munaqêşe dîkim, bo pirs û lêkolînê xwe. Got; pekî tu dixwazî ma Kurdistanê çêbe? Min got; erê, eger gelê Kurdistanê dixwaze Kurdistanê çêbe, ez li hember wê dernekevim. Ez ê piştbazîyê bidimê. Dema min wa bersiva da, min nêrî hêkîm qelema xwe dayna û piştî xwe da koltuxê. Wê caxê min fêhm kir ku min ceza xwar. Lê birayê min ê rehmetî, îtiraz kir, got hûn çimanî pirsêka weng dîkî, va pirsêka taybetî ye. Hûn çima dixwazin dunya wî ya di hûndur de

derve derxin? Ji bo ku wî ceza bikin! “*Tartışmeyeka*” birayê min a sert jî bi hêkim re çêbû, di vê navberê de. Mehkeme bi vî şeklî me derbas kir. Ez îro bi wê jî kêfxwaş im.

Yanê te “savunmeya xwe ya siyasî kir.

– Erê, bo wê jî ez îro ne pîşman im. Me zilm û zordariyeka pirs giran dît, lê îro dilê min jî rihet e!

Te pirs kiriwû, hepsê bişûn da min çir kiriwû? Hepsê bişûn da ez çûm eskerîyê. Wana li Dîyarbekirê muayana me kirin û em ji wir şandin eskerîyê. Lê ya min ji ber ku qeyda min li Cîhanbeylîyê bû, birayê min bi şubeya eskerîyê ya Cîhanbeylîyê re deng kiribû ku ew bikaribin min bixwazin daku ji şubeya eskerîyê ya Cîhanbeylîyê bi xwe min bişînin eskerîyê. Wana jî qebul kiriwûn. Li ser vê jî ez berdî, ji bo 20 rojan, ez hatim mal. Lê hevalên din gîştik rasterast ji wir şandin eskerîyê. Hevalên ji Dîyarbekirê nikaribûn herin malbatên xwe bibînin. Ez hatime gund, neh deh rojan li gund û Anqerê tenkî gerîyam. Berî ku ez herim eskerîyê, tabî me bi Albay re xeberda ku bila cîyê min biguharin, Cîyê ku ez biçûma, Qers bû. Me got bila cîyê me biguharin,

Qers pir sar e, zivistan e, ez jî nû ji hepsê derketime, pir zaîf im. Siftê got; ez nikarim, lê rokak ez herim jî bang min kir got; min fikirkirîye, ez cîye te diguharim. Ciyê min guhart, ez şandim Balikkêsîrê.

Tu însanekî ku dihat naskirin, nû ji hepsê hatibû berdan, însanekî kurd î siyasî bû.

Gelo li eskerîyê tu zehmetî bi te kirin?

– Na, wî Albayî li Cihanbeylîyê rindîyeka din jî ji min re kiribû. Dosya min neşandibû Balikkêsîrê.

Ji bo wê jî heta du

mehên min ma-

bûn ku ez teskerê

bigrîm jî tu kesî

nedizanî ku ez

hepîs razame.

Kesî nedizanî, ez

kî me. Dema ku

min dikira ehlîy-

etê bistînim, min muracata xwe ki-

ribû. Ji bo ehlîyetî li ser navê min

lêkolîn tê kirin, wê caxê pêhesiyan

ku ez hepis razame. Tabî wexta ceza

li min birîbûn, sê sal jî cezayê min ê

surgunê hebû. Ez çûm polis ku

ehlîyetê bigrêm, wan dît ku cezayê

min î surgunê heye. Ji wana berê ku

ez î ”kaçax im”. Ez girtim birim.

Dûre mêze kirin ku tiştek tune ez

berdam. Ez hatim, min zanibû dê

înzîbat ê qala min bikin, min got, baş e, ez bi xwe qat kim. Ez çûm cem yuzbaşî min hal û mesela xwe jê re got. Wî jî got, tişt nabe, here karê xwe. Însanekî baş bû. Du-sê mehan bi şûnda jî eskerîya min xilas bû. Bo wê min li eskerîyê tu zulm nedît! Lê dûre hevalên me yên din ku rasterast ji hepisxanê cûbûn eskerîyê, qal dikirin ku wan li eskerîyê jî pir zulm dîtibûn. Min nedît, sebeba wê jî şubeya Cihanbeylîyê dosya min neşandibû.

“... eger gelê Kurdistanê dixwaze Kurdistan çêbe, ez li hember wê dernekevim. Ez ê piştbazîyê bidimê...”

Tu piştî eskerî derket derveyê welêt an li welêt demekê ma yî?

– Ez salûnîvekê li Anqerê mam. Min xwest kar bikim, lê min kar nedît. Ya rastî nekû min nedît, min kar dîdît, roja pašîn digotin; çardîn mê! Îmtîhan dewûn, min îmtihan qezanc dikirin dîsan kar nedidan min. Yanê hemû derî li min hatin girtin ji ber ez hepis raketibûm. Polis li dû min di-

gerî, em di bin taqîbê da bûn. Ku ez li cîyekî kar digêrêm polîs pişt re xerber dide wan û bo wê jî min nikaribûm kar bikim. Dûre bavê min got; bê gund, li gund kar bike, xermana heyne, bêstîyê bike. Çend kuruşên xwe berhevke, here li bajêr ji xwe re dukanekê veke.

Tabî, ez jî tim dixwazim derkevîm derve, ji ber ez î dizanime ku jîyan bi wî şeklî nameşe, ê tu rihetîyê nadin min. Însan li min direvîn, hevalên min yên li Anqerê, ez didîtîm berê xwe çerx dikirin, li min dûr disekinîn. Li gundê min jî, derûdor, cîran û nasên min nedixwestin ez herim mala wan an xortên wan bi min re bigerin. Bi wana berê, polîs her li pey min e, eger bi min re deng kirin ê werine wan jî bigrên!

Yanê tirsek hebû. Ji tirsaxwe, li te bidûr diketin?

– Yanê! Min mêz kir rewşeka weng ez nikarim berdewam bikim. Ez tim li rêyekê jî digêrîm ku derkevin derveyî welêt. Heta 91a dewam kir. 1991an me rêyek dît û ser wê ez hatim. Ji wê demê pêva jî li wira me.

Navca Anatoliyê helbet taybetîyeka xwe heye. Çerçewa wan xuya ye. Lê dîsan jî di nav ciwanan de û ev kesên kurdperwer

de helbet sempatiyeka wan li hember te divê hebûya! Lê dîsan jî ciwat ji ber tirsaxwe li te dûr disekinî?

– Pir hebûn. Lê di alîyê din de jî ji ber tirsax ne tenê xelk, merivên min jî nedixwestin ez herim, malên wan. Digotin; wa were zarokên me bixapîne pewe. Yan jî polîs bizanibe ew tîyê malê me yê bîn, me jî bigrên. Yanê mîlet ji min direvîya. Gundîyên me giştikan dizanî ku ez hepisê de mame. Gundên derûdorê jî dizanîn, ji ber bavê min merivekî ku dihat naskirin. Gundên derûdora xwe jî nasdikirin. Giştika jî bîstiwûn ku ez di hepisxanê de razame jî. Ji ber wê jî pir însanan nedixwestin bi min re xeber bidin, ên ku dikirin jî bi zorê dikirin. Zehmetî dewû. Min vana gî hîs dikirin, didît. Ji bo wê jî tim di serê min da ku rêkê bibînim û derkevim derve. Pasaport jî nedidane min. Wê demê min digot; 15 milyona bidim bo pasekê derxim. Kesî nikaribû! Pir kesî ev kara dikirin, lê ji min re digotin; ê te em şenakin! Ez paşê bê pasaport derketim û hatim.

Helbet, ciwata me di wî warê de hem ji ber tirsê hem jî bê toleransiyê, mafê demokrasîyê çî ye nizanin. Ya herî balkêş jî ciwatê mafekî weng neditîye jî. Ji ber

berjewendiyên xwe û nezanîyê li ba xwe tirsekê peyda dikin.

– Rast e, yanê ez niha tu kesî tewanbar nakim û dilê min jî tu ji kesî neşikeştîye. Meriv nezanî, meriv ditirse. Wan dixwastin zarokên xwe bila zerarê nebînin, ew diparastin. Ez wê jî fêhm dikim.

Lê ji me ra jî zehmetiyek e. Wê çaxê jî digotin; di gunda da jî îhbarcî pir in. Di her gundekî de jî hene. Carê ez hatim mal, seçim dewû, sala 1987an beledîye nû têye gundê me. Hilbijartina yekemîn e. Yê alîyê hilekê di nav gunde belav kiriye ji bo ku mîlet bitirse, ku ew ê bi jenderma re xeber bide, di mala kê de kitêp hene. Li gunda şorên weng zû belav dibûn. Rojekê ez hatim mal, ku dîya min kitêbên min, du walîz bûn, dayê ber tandirê, yê kitêbên min dişewitinîye. Min got; va çî ye? Got; ê va ye, falanê gotîye dê navê wan malên ku tê de kitêp hene bide jenderma, bo wê wa ye ez jî dişewitînim. Wê demê weng bû. Kitêbên min hemû bi wî awayî hatin şewitandin....

Tu dure hat Ewropayê, li Ewropa çawa bû, li wir însan azad in û serbestî heye, tiştê ku te ji însanên vir dipa, te dît an na?

– Ez hatim vira, tabî tu dixwazî siftê xwe bi cih û war biki û naxwazî bi şûnda herî, nabe jî. Piştî wê tu li heval û nasa digerrî, dixwazî wan bibînî, carcaran dibînî, carcaran nabînî! Tabî dunyayeka cuda ye, ne dunyayeka wekî Tirkîyê ye. Tu ji wir da hatî, tu li têkilîya li welêt digerrî, ev li vir tune ye. Heta ku tu adebteyê vir dewî, pir zeman derbas dewî. Dem dema tu lê hêrs dikevî. Ew jî tiştêkî neyî baş e. Durê tu bi xwe xwe dibêjî; dibe ku deh salan bi şûn de ez jî bikevin vî halî! Ji bo ku jîyana vir û ya wir ne yek e.

Yanê ev germîya ku te dipa an dixwest, çênebû?

– Na! Ev tiştên ku min heyal dikirî nebû û nedît jî. Ev heye. Heta min demekê bi hinekan re kar jî kir, ev jî nebû, ez ji wir jî veqetîyam. Ez bo xwe bêtîm; eger tevgera ku min pê ra karkirî û hevalên min li ser xwe bûna û karî xwe berdewam bikirana min ê jî berdewam bikira. Ez li mala xwe rûnediniştim. Ez nedirevîm, min xwe şiva nedikişand. Min mêze kir ku ev tevgera me û hevalên min dest ji kar berdana, herkesî bi serê xwe ye. Belkî hûn hemû jî bizanin, her tevgerêkê li gora xwe tevgerêka

xwe heye, zimanekî xwe heye. Yanê tevgerêka din re xûna wan hevdû nagrê, zimanê meriv hevdi nagrê. Tu nikarî piştî 20– 30 salî bi şûn da herî bi tevgerêka din re kar bikî, nabe!

Yanê tu dibê piştî demekê ji derweyî te grubek çêdibe, herçiqas armanc ji bo eynê dawê be jî û dilê te bi wan re be jî tu xwe di nav wan de nabînî, rabûn û rûniştinên we hev nagrên!

– Na, hev nagrên. Ez nizamî tiştêkî rind e an xera we jî! Ez wîya bi nav nakim. Lê ez wîya bêjîm; xûn hev nagrê. Min pir xwest ez bişuxulîm, kar bikim, lê nebû!

Tu wek însanekî kurdperwer î ku ji bo dawa kurd û Kurdîstanê bi salan hepis raketî, îşkençe dîtî, zilmên giran derbas kirî, tiştên ku te ji kurdên derve û ji tevgerên kurdan dipa hene?

– Ya rastî, wek bi tirkî dibên ”hayal kırıklığı” yeka mezin çêbû. Yanê heyalên min têkçûn! Ev karê ku ji bo kurd û Kurdîstanê tewûyî, li holê tiştekan nemabû. Herkesek cûbû cîyê xwe, li mala xwe û bi karê xwe re dimeşîn. Rûmeta wan jî nemaye. Tu bi xwe xwe dibêjî; min ji bo kurd û Kurdîstanê kar kir, min ji bo Kurdîstanê zulûm dît, îşkençên giran dît, karê min mekteba min

hemû ji dest min çûn. Ê tu dixwazî tenekî rûmetiye wan ji te ra hebin. Wa tiştên ez dibê belkî tiştên *hîsî* bin jî. Dibe ku tiştên ne baş bin jî. Lê tiştên weng meriv recû jî dike. Me tiştên weng nedît! Wê demê min fahm kir ku ew derbe însan pir xelandiye. Şexsiyeta însanan têxistiye. Wî zilmî însan pir tirsandine. Ev tirs tiştêkî gelek gelek girîng e di jîyana insanan de. Eger tirs kete jîyana te, tu nabî însan! Tu yê bi tiştêkî cuda bî! Wê caxê ew çî bidin ber te, tu dê wî şêklê kevî. Tirs tiştêkî weng e! Ji bo wê jî 12ê îlonê tiştêkî gelek mezin da dilê însên. Li Turkîyê piranî bi vê şêklê bû. Tu li îro mêz dikî, ew tevgerên ku berê kar dikirin gî kolektîv bûn, ên ku berê digotin; em marksîst û sosyalîst in îro yekî ku vê şorê dike tune. Darbeyeka gelek giran xwarin!

Niha yên ku bi navî „68 kuşaxî” tên xwendinî, hene û yên „78 kuşaxî” jî heye. Ez dikarim bêjîm ku kuşaxa darbeya herî mezin xwarî kuşaxa 78an ne. Ama ji bo wê jî tu kar tine, tişt tune. Ev însanên ku dîtîna wan a salên 77– 78an îro li cem kesî tune. Ew însanê ku bi xwe ev karan dikirinî, îro ketiye şêkleke din. Têvgera wê demê çom bû! Xwe bela kir. Wek min berê jî got,

her tevgerêk li gora xwe terbîyeka xwe heye. Tu bi yeka din re nikarî herî. Ev tiştêkî bi zahmet e jî. Dibe ku tiştêkî pisîkolojîk e jî. Ancak psikolog dikarin bersiva vê bidin. Ji bo çi weng diwe. Ez îro pir hevalên wê demê nasdikim ku wê demê pir şer dikirinî, mîlîtan bûn. Ê îro dunyayeka wan î tew cuda heye. Ev pirin jî. Yanê te pirs kir, te got; te dît an ne? Min nedît!

Tabî piranîya tevgeran li ser ciwana pêk tîn, bi ciwana xort dibin û pêşdikevin. Dema meriv ciwan e, li hember bêheqîtîye, ji bo wekhevîyê xûna meriv dikele û berpirsîyarîyên ciwanan jî di wî temenî de pir tunene. Piştî demekê, 40-50 salîyê de berpirsîyarîyên din yên jîyanê dikevin stûyê meriv. Ev tiştê tu dibê rast in. Lê dema dizewicin, dibin xwedî zarok berpirsîyarîyên din hildigrên ser piştê xwe, dema te xwe bi malbatê ve girêda wek berê tu nikarî tevbigêrî. Ev pir dûrî hev in.

– Yanê, jîyana te ya şexsî çêdibe. Berpirsîyarîyên te yên din çê tewin. Bo wê jî min got; ez naxwazim bêheqîtîye li kesî bikim. Ji ber piranîya wan ji hîlekê de ji însanan derbe xwarin, ji hila sîyasî de derbe xwarin, di alîyê aborî de derbe xwarin. Hatine vir, jîyaneka din saz kirin. Dibe ku girêdana vê ji kultura

me de jî hebe. Yanê însanê ku li gund girbûyî û însanê ku li bajêr girbûyî, însanê ku rewşa malbata xwe baş bû û yên ku ne baş bûn. Wana gîştik tesîr dikin. 12ê îlonê, ne tenê li ser kurda, li ser tirkê jî tesîreka gelek mezin kir. Yanê ev nesla xirab kirin.

Divê ez vê jî bêm; li Anqerê sê hevalên me yên keçik hebûn. Hevalên me yên berê bûn. Ji hevalên min yên berê qet tunebin min 50-100 meriv nas dikir. Ji wan 100 meriya tenê ev sê keçik li me xwadî derketin. Tevgera me jî belav bûye, kez tune ye. Tevger hebe, dikare alîkarî bike û li me xwadî derkeve. Ew jî tune. Ev nasên me li ber me direvîyan. Tenê ev sê keçikan, li Anqerê li me tewûn xudan. Dişuxulîn, xerçlîxa me jî didan me. Bi me ra diaxivîn, hevaltî dikirin. Ji bo wê ez ji wana re dibên “Üçlü silahşörler”

Welleh wan em dibirin cîyê karên xwe li wir xwarina me didane me, hevalên din silav nedidan me, ji me direvîn, wana em dibirîn yemexanên xwe, xwarin didane me. Yanê fedekariyeka mezin dikirin. Ev bû 20-30 sal in, ez hertim qala wan dikim. Çima ji bo ku ez bi alikariya wan li ser xwe mam. Hevalê Kamil jî wan nas dike. Pir hevalan, wexta

em li çarşîyê didîtin ruyên xwe diguharîn, digotin ecaba wana werin me ra deng bikin, polîs li duv van e, yê me jî bigrên. Ditirsîn, ji me direvîn. A wa keçikana nedirevîn û her alîkariya me dikirin û em tenê nehiştên, bi me ra hevaltî dikirin.

Te gava dinî behsa tişteki girîng kir. Te got, dema hun ji hepsê derketin, hereket a we, tevgera ku hûn pê ra bûn belav bibû, li hortê nemabû. Xelkê te jî ji aliyê dewletê ve çavtirsî bû. Xelkê te jî xwedî li te dernakewîye. Tiştê ku dewletê dixwest jî ew bû. Dewlet di wan karan de hertim bi serkeftî ye. Lê em ji aliyê din tişteki din jî dibînin, ku ev tevgerên ku xwe parastin bi organîze bûn an xwe nû kirin, dema însanên wan ji hepsî derdikevin, dikarin xwe ji wan bigrên bi awakî tîn parastin heta cih û hurmeteka baş nîşan didin û piranîya wan karên xwe yên sîyasî jî bi awayekî berdewam dikin. Niha, piranîya wan dibeku ev qehremanî û berxwedana ku wê demê hat kirin wan nekiribe jî, lê dema derdikevin, ji ber xwedî hêz û tevgerê ne, tu dibînî piştî demekê wan derdixin dervayî welet û wan mezin dikin. Pisîkolojîya wan jî bi awayekî bi kuvet dibe. Lê ew yên ku tevgerên wan têkçûne bi tenê dimên û pirê caran pirs a wan jî rast nayê kirin.

– Rast e, tu xwe sêwî dibînî, kes te pîrs nake, kez ji te xwedî dernakeve. Kesekî te ra alîkar be, tune ye. Hatina min a wira jî weng bû tu kes an komeleyeka bi min re alîkar be tunebû. Ev bêxwadîtî meriva hin pir xeraw dike. Ji bo wê jî van sê keçikana em li ber girtin. Kamil jî wan baş nasdike. Tu jî yekê ji wan nas dikî, Yusuf Ziya nas dikî, yek pîreka wî bû. Ew jineka pir xurt e ha! Em dibirin ciyê karê xwe carna xwarin li wir didan me, carna jî dianîn mal, li mal didan me. Xerçlixa me jî didan me. Ev dibeku tişteki biçûk be lê ji bo me, wê demê tişteki pir mezin tewû. Ji ber kes nebû, tenê ew li me xwedî derdiketin. Ev jî bo me tişteki mezin bû.

Tu dikanî hinekî têbînîyên xwe li rewşa kurdên Anatoliyê bê. Wek tu jî dizanî salên 60î, 70î heta 80î jî, herçiqas tevgerên kurdî pêşneketibûn jî bi kurdî dengkirin û erf û edetên kurdî di nav kurdên me yên Anatoliyê de li gorî îro hîn zêdetir bûn. Tu çing dibînî?

– Pêşteçûn û şûvaçûyîn heye. Berê edet, kultur û jîyana kurda baş bû. Zimanê wana jî baş bû. Hetanî 1965-70î. Piştî 65 û 70î kurdên Anatoliyê bi zêdeyî zarok şandin mektebê, xwendindan. Heta wê

demê jî li her gundekî kesên xwenda sê - çarek bûn. Wê demê piranîya malbatan bi zaroyên xwe re dixwastin bi tirkî deng bikin sewa ku ba zarok li mektebê serkeftî bin, zimanê tirkî rind bizanibin. Wê, ket li pêşdaçûyîna zimanê kurdî xist. Her li wê demê însanên me destpêkirin berve Ewropayê hatin. Pere kete destên wan. Hem zarok şandin mektebê hem jî malên xwe barkirin bajaran. Di wir da di nav pir malbat û zarokan de tenekî trawma çêbû. **Ji kurdî devjêbê, bikeve nav tirkî!**

Piştî salên 80î, şerê kurda, destpêkir, kurd sîyasî dur dawestî jî dilê wana wêra bû. Heta wê demê piranîya malbatan navên kurdî li zarokên xwe nedidan. Îro ji sedî 70î 80î, nizam, kêr zêde hemû malbat navên kurdî li zarokên xwe dikin. Ez vê tiştekî pir baş dibînim.

Di hêla din de jî hinek erf û edetên xwe jî winda kirin. Wa guhartina mezin jî ji aliyê aborî û civakî de ye. Berê jîyana wan girtî wû. Di nav hev de berdewam dikirin û bo wê jê kultura xwe diparastin. Dura ku rewşa wan baş bû, xwe berdan! Zarokan xwendin, barkirin bajaran, pir tiştên nû elimîn. Di hêlekê de kurdîtîya xwe zêde pêşda birin lê di hêla din de jî edetên xwe jî jibîr kirin.

Tu yê bizanî, berê mêvanek dihat jê ra pez serjêdikirin. Bavî min, ke dewû payîzî nêzikî 100-120 pezî xwe çêdewû. Ke dewû biharê jê 70-80 diman. Dimirin, na. Hemû ji mêvana re serjêdikirin. Niha em li salên 80î dinêrin kesî nidikarî ji mêvanekî xwe re pezekî serjêke. Ev tenekî jî girêdayê sosyo-ekonomîyê ye. Dema mêvanek dihat, digotin ka çûçikekê(mirîşkê) bîne. Dem hat ev jî giran hat pê ra! Çima berê dikaribûn pezekê serjêkin û îro çûçikekî serjêdikin! Tabî pez ji mêvanî bi qîmet re dihat serjêkirin. Ez wana çima dibêim, ji ber wana bi rewşa aborîyê ve jî girêdayîne. Min got ya, di aliyê edet, çand û ekonomîyê de pêşdaçûyîn û paştacûyîn heye.

Spas ji bo ev sohbeta te! Bi rastî te pir tiştên girîng ji me ra got. Mala te ava!

Tu kovara Bîrnebûnê çîng dibînî?

– Bîrnebûn di dîroka kurdên Anatoliyê da weşaneka yekemîn e, bi kurdî derdikeve. Di wê demê da tiştekî pir grîng û rumetî ye ji me kurdên Anatoliyê ra. Ji bo wê sebebê gerek insanê me li kovara Bîrnebûnê bi xudan bin. Çimakî Bîrnebûn mîsyonaka girîng da ser milê xwe û ji bo kurdên Anatoliyê karekî herî mezin dimeşîne.

Du kitêbên nû ji weşanxaneya APECê

Êzdîxan û 97 ferman

Ev pirtûk ji du beşan pêk te:


Di **beşa yekem** de gund û bajarên êzdiyên Şengalê, Bakur, Rojava, Serhed, Sovyeta Kevn û Ewropê, eşîr û bavikên êzdiyan cî digirin. Jiyan û hatina Şêx Adî ya Lalişê, damezrandina terîqeta Adawî, felsefe û ola wî, Melekê Tawîs, xelîfe, Mishefa Reş, Cilwe, kast û çîn, dua, qewl, qedexe, perestgeh, rîtuêl û pîrozbahiyên ola êzdî yek bi yek hatine destnîşankirin. Hevkokî û hevbeşiyên êzdayetî û yezdanîti, zerdeştî, yaresantî, nûsayirtî, elewîtî, durzîtî, mîtrayetî û îslamtiyê hatine peytandin. Ji sala 637a heta êrişa DAÎŞê ya sala 2014, 97 fermanên ku li serê êzdiyan hatine rakirin bi awayekî kronolojîk hatine nivîsandin.

Di **beşa duyem** de komkujî û barbariya DAÎŞê ya li ser Şengalê, kuştina êzdiyan a komî, îşkence, lêdan û kavilkirina gund û bajaran, rev û koça wan a mezin, bi sedan jin û keçên êzdî yên ku dil ketibûn destê DAÎŞiyan û biribûn li bazarên jinfirotinê firotibûn, ew serpêhatiyên xwe vedibêjin. Li ser vê karesat û wahşeta DAÎŞiyan bi 30 malbatên êzdiyên ku ji ber êrişa DAÎŞiyan revîne û li wargehên Başûr û Bakurê Kurdistanê diman re hevpeyvîn hatine kirin. Di nav wan de jinên ku dîlketibûn destê DAÎŞiyan û hatinbûn firotin ji hene.


Qewl, beyt, qesîde, sehda, dua û dirozgehên êzdiyan

Di vê xebatê de ji 160 qewl, qesîde, beyt, dirozge û duayên êzdiyan hene. Heta niha cara pêşî ye ku qewl û duayên êzdiyan di berhemeke weha de hatine tomarkirin.

Mîrov dikare bêje ku ev xebata han ansîklopediyeka kurdên êzdî ye.



QEWL, BEYT, QESÎDE, ,SEHDA,
DUA û DIROZGEHÊN ÊZDÎYAN



Berhevkar:
Amed Tigrîs
Rojîn Zarg

www.apecpublishing.com

Weşanên APECê



Beşa kitêbên kurdî li kitêbxaneyê Wood Green Library li Londonê

Navnîşana kitêbxanê:

Wood Green Library
187-197A High Rd, Wood Green, London,
N22 6XD, Storbritannien

<http://birnebun.eu>